



K.T

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

WELİYÊN KURD DI NEFAHATU'L-UNSÊ DE

Mehmet Emin CIRIK

16711001

Şêwirmend

Dr. Shahab Vali

Mêrdîn 2019



T.C

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

NEFAHATU'L-ÜNS'TE KÜRT VELİLERİ

Mehmet Emin CIRIK

16711001

Danışman

Dr. Shahab VALİ

Mardin 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “*Nefahatu'l-Üns*’te Kürt Velileri” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

...../...../.....

Öğrencinin Adı Soyadı


Mehmet Emin CIRIK

KABUL VE ONAY

Mehmet Emin Cırık Tarafından Hazırlanan **Nefahatu'l Uns**, Adandaki Çalışma, 08.09.2019 Tarihinde Savunma Sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Doç. Dr. Abdurrahim Alkış] (Başkan)




[İ m z a]

[Doç. Dr. Hayrullah Acar] (Üye)

[İ m z a]

[Dr. Öğr. Üyesi Şahab Vali] (Üye)



NAVEROK

NAVEROK	I
PÊŞGOTIN	V
KURTE	VII
ÖZET	VIII
ABSTRACT	IX
KURTEBÊJE	X
DESTPÊK	1
1. Mijar.....	2
2. Armanç	2
3. Rêbaz	2
4. Girîngî	3
5. Çavkanî.....	3
BEŞA YEKEM.....	5
TESEWWUF, WELÎTÎ Û MENQEBE.....	5
1.1. Wateya Têgehên "Tesewwuf" û "Sofi"yê	5
1.2. Klasîkên Tesewwufê	9
1.3. Têgeha Welîtiyê	15
1.4. Çêbûna Têgeha Welîtiyê Di Pêvajoya Dîroka Tesewwufê De	16
1.5. Jêderkên Welîyan.....	17
1.6. Avabûna Welîtiyê.....	18
1.7. Têgeha Keramet û Menqebeyê di Tesewwufê de.....	19
1.8. Nerîta Nivîsandina Menqebeyan Li Ser Welîyan	21
1.9. Cûreyên Menqebeyan.....	22
BEŞA DUYEM.....	25
Weliyên Kurd û Menqebeyên Wan Di <i>Nefahatu'l-Unsê</i> De.....	25

2.1.	Nûreddîn Ebdurehmanê Camî (1414-1492)	25
2.2.	Kurdbûna Camî	27
2.3.	Berhemên Camî	29
2.4.	Berhemên Din	31
2.5.	Nefahatu'l-Uns û Girîngiya Wê	32
2.6.	Nefahatu'l-Uns û Tebeqatu's-Sofiyye	34
2.7.	Rola Weliyên Kurd di Tesewwufê de	35
2.8.	Weliyên ji Daranê	38
2.8.1.	Ebû Suleymanê Daranî	39
2.8.2.	Dawid b. Ehmedê Daranî	40
2.9.	Weliyên ji Dînewerê	41
2.9.1.	Mîmşadê Dînewerî	42
2.9.2.	Ebû Ebbasê Dînewerî	44
2.9.3.	Ebû Hesên Sayixê Dînewerî	45
2.9.4.	Ebû Bekir Qisayê Dînewerî	47
2.9.5.	Ebû Bekir b. Dawûdê Dînewerî	47
2.9.6.	Ebû Ebdulahê Dînewerî	48
2.10.	Weliyên ji Hemedanê	49
2.10.1.	Zeyad Kebîr Hemedanî	50
2.10.2.	Kehmesê b. Huseynê Hemedanî	50
2.10.3.	Ebû Bekir Hemedanî	51
2.10.4.	Ehnef el-Hemedanî	52
2.10.5.	Xace Yûsifê Hemedanî	52
2.10.6.	Şêx Berekeyê Hemedanî	56
2.10.7.	Şêx Fethayê Hemedanî	57
2.10.8.	'Eynu'l-Qudatê Hemedanî	58

2.10.9. Ebû Huseyn b. Cehzem Hemedanî.....	61
2.10.10. Emîr Seyyid Elî b. Şehab b. Mihemed Hemedanî.....	62
2.11. Weliyên ji Herranê.....	63
2.11.1. Hayat b. Qeys el-Herranî.....	64
2.11.2. Şêx Ehmedê Herranî.....	65
2.12. Weliyên ji Kirmanşahê	66
2.12.1. Îbrahîm b. Şeybanê Kirmanşahî.....	67
2.12.2. Muzeferê Kirmanşahî.....	68
2.13. Weliyên ji Mukriyanê.....	68
2.13.1. Ebû Ebdulahê Mukrî.....	69
2.13.2. Ebu'l-Qasimê Mukrî.....	70
2.14. Weliyên ji Mûsilê.....	70
2.14.1. Feth b. Eliyê Mûsilî.....	71
2.14.2. Qezîb el-Ban el-Mûsilî.....	73
2.15. Weliyên ji Nîhavendê.....	74
2.15.1. Ebû Ebbasê Nîhavendî.....	74
2.15.2. Cuneydê Bexdadî.....	76
2.16. Weliyên ji Qesrê Şîrînê	81
2.16.1. Şêx Îsmailê Qesrî.....	82
2.16.2. Ebu'l-Qasimê Qesrî	83
2.16.3. Ebû Bekirê Qesrî	85
2.17. Weliyên ji Suhrewerdê	85
2.17.1. Şêx Şehabeddîn Suhrewerdî	87
2.18. Weliyên ji Êrmiyeyê	89
2.18.1. Ebû Hesenê Urmevî	91
2.18.2. Ebû Bekir Yezdanyarê Urmevî.....	92

2.18.3. Şêx Husameddînê Çelebî	94
2.19. Weliyên ji Xorasanê.....	96
2.19.1. Dawûd el-Belxî	97
2.19.2. Ebû Zeydê Merxeziyê Xorasanî	98
2.19.3. Şêx Ehmed Neccar Esterabadî	98
2.20. Weliyên Din	99
2.20.1. Ebû Ebdulahê el-Muştehîr Babunî	99
2.20.2. Şêx Mihyedînê Ebdulqadirê Cîlî (Şêx Ebdulqadirê Geylanî)	100
2.20.3. Şêx Eliyê Kurdî	103
2.20.4. Şêx Ebû Tahirê Kurd	104
2.20.5. Şêx Emmar Yasir el-Bidlîsî	105
2.20.6. Edî b. Musafirê Şamî Hekkarî (Şêx Adî)	107
2.20.7. Şêx Caker	110
2.20.8. Şêx Cemaleddînê Lor	110
2.20.9. Ebû Eliyê Sindî.....	112
2.20.10. Ebû Abdulahê Cavpare Sofiyê Hemedanî	112
2.20.11. Ebû Yaqûbê Meydanî.....	113
2.20.12. Kurdiye	114
ENCAM	115
ÇAVKANÎ Û JÊDERK	118

PÊŞGOTIN

Di kevneşopiya îrfana îslamê de li ser ewliya û menqebeyên wan gelek berhem hatine nivîsandin. Kevneşopiya nivîsandina menqebe û tezkîreyên li ser weliyan di nava ehlê terîqetan de nerîteke kevn e. Ciyawaziya bingehîn di nava menqebe û tezkîreyan de ev e ku menqebe behsa jiyan, kesayet, meqama rûhanî û kerametên weliyekî tenê dikin. Lê tezkîre jî li ser jiyan, kesayet, meqama rûhanî û gelek weliyan têne nivîsandin.

Bi qasî ku tê zanîn, berhemên herî kevn ku li ser weliyan hatine nivîsandin, pirtûkên *el-Ewliya* ya Îbnu Ebî'd-Dunya û *Sîretu'l-Ewliya* (k.d., s.s, 3) ya Hekîm et-Tirmîzî (k.d., s.s, 4) ye. Ev her du berhem di nava janrên menqebenameyan de yê herî kevn û girîng in. Piştî, pirtûka *Hilyetu'l-Ewliya* ya Hafîz Ebû Neîm Îsbehanî (k.d., s.s, 4-5) ye ku ev berhem di heman demê de çavkaniyeke sereke ya *Tezkîretu'l-Ewliya* ya 'Ettarê Neyşabûrî (k.d., s.s, 5) ye.

Kevneşopiya menqebe û tezkîreyan di nava berhemên tesewwufî de weke janrekê di serdemên cuda cuda yê îslamê de dom kiriye. Weke mînak, pirtûka *Menqibetu's-Sofiyye* a Qutbeddîn Sinc Îbadî (k.d., s.s, 6), *Nefahatu'l-Uns min Hezarati'l-Quds* a Nûreddîn Ebdurehmanê Camî (k.d., s.s, 9), *Mecalisu'l-'Uşşaq* a Kemaleddîn Huseynê Gazergahî (k.d., s.s, 9), *Semeratu'l-Quds min Şeceratu'l-Uns* a Mîrza Le'l-Bêygî Le'liyê Bedexşanî (k.d., s.s, 10-11), *Mecalisu'l-Mu'minîn* a Qazî Nûrullahê Şûşterî (k.d., s.s, 11), *Tezkîretu Riyadî'l-'Arifîn* a Rizaqulîxanê Hîdayet (k.d., s.s, 13) û *Sefînetu'l-Ewliya* ya Osman Huseyin Wessaf (k.d., s.s, 14) a herî dawîn û ya herî berfireh e.

Ev nîşan didin ku kevneşopiya nivîsandina menqebeyan di dîroka îslamê de her berdewam bûye. Girîngiya *Nefahatu'l-Unsê* ev e ku tê de qala gelek ewliyayên navdar û bibandor ji Misir heya Hindistanê bigire behsa menqebeyên wan hatiye kirin. Her wisa di piraniya pirtûkên li ser tesewwufê hatine nivîsandin behsa ewliyayên kurd jî tê kirin. Her wiha piraniya pirtûkên derbarê tesewwufê de hatine nivîsandin, weke çavkanî hatine nîşandan.

Di vê xebatê de armanca me ya sereke tespîtkirina weliyên kurd û menqebeyên wan di berhema Nûreddîn Ebdurehmanê Camî ya bi navê *Nefahatu'l-Unsê* de ye. Herwiha em ê li ser rola van weliyên kurd û Nûreddîn Ebdurehmanê Camî ya di tesewwufê de rawestin. Xebata me ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de em cih didin “tesewwuf”, “welîtî”, “menqebe”yê. Û dûre jî em di beşa duyem de cih didin jiyan, berhem û kurdbûna Camî, girîngiya *Nefahatu'l-Unsê*, *Nefahatu'l-Uns* û *Tebeqatu's-Sofiyye*, rola weliyên kurd di tesewwufê de û herî dawî em digel menqebeyan cih didin weliyên kurd.

Ez spasdarê şewiramendê xwe Shahab Vali me ku ev xebata hanê pêşniyazî min kir û di amadekirina vê xebatê de arîkariya min kir. Ji bo peydakirina çavkaniyên farisî û wergerên farisî spasdarê rêzdar Tahir Agûr û Perwîz Cîhanî me. Ji bo xwendina dawîn a tezê spasdarê Mehdî Jaferzade û Tahirhan Aydın im ku gelekî li ber min dan. Herwiha ez spasdarê Abdurrahman Adak, Abdurrahim Alkış, Sibel Cırık, İbrahim Dalar, Mehmet Emin Erdem, Erol Şaybak û Aynur Ilı me. Herî dawîn ez spasdarê Xezala Redkanî me ku ji aliye manewî ve bû hevkarê min.

Mêrdîn – 2019

Mehmet Emin CIRIK

KURTE

Tesewwuf û mijarên têkildarî wê di dirêjahiya dîrokê de bala gelek vekoleran, bi taybet rojhilatnas û vekolerên ku li ser dîn û baweriyên rojhilatê dixebitin kişandiye ser xwe. Yek ji wan hêlan mijara tesewwufa di nava kurdan de û weliyên kurd e. Hin xebat di vî warî de hatine kirin, lê dîsan jî têr nakin. Ji bo vê yekê mirov dikare serî li klasîkên tesewwufê bide. Gelek klasîkên erebî û farisî li ser tesewwuf û ewliyayan û menqebeyan hene. Yek ji wan klasîkan berhema bi navê *Nefahatu'l-Uns min Hezerati'l-Quds* a Nûreddîn Ebdurehmanê Camî (k. d. 898/1492) ye ku di sedsala 15an de bi zimanê farisî hatiye nivîsansin û tê de qala 618 weliyan û menqebeyên li ser wan hatiye kirin ku 34 jê jin in. Di nava vê berhemê de navên gelek weliyên kurd jî tên dîtin ku xebata me ya sereke li ser wan e. Eger ev berhem û weliyên kurd ên ku navên wan tê de hatine, baş bînin vekolîn, bersivên gelek pirsên li ser hêla qalkirî dikarin bînin dîtin û heta bigire gelek mijarên têkildarî dîrok, edebiyat, çand û bîr û baweriyên kurdan jî rohnî bibin.

Armanca vê xebatê, diyarkirin û tespîtkirina weliyên kurd û menqebeyên wan di *Nefahatu'l-Uns* a Nûreddîn Ebdurahmanê Camî de ye ku dikare di gelek warên cuda de bi kêrî kurdologan bibe.

Peyvên Sereke: Tesewwuf, menqebe, ewliya, kurd, Nûreddîn Ebdurahmanê Camî, *Nefahatu'l-Uns*.

ÖZET

Tasavvuf ve onunla yakından ilgili konular, tarih boyunca din ve inançlar üzerine çalışmalar yapan pek çok araştırmacının dikkatini çekmiştir. Söz konusu alanlardan biri de Kürtler arasında tasavvuf ve Kürt evliyalarıdır. Bu alanda bazı çalışmalar bulunmakla birlikte yeterli sayıda araştırmanın yapıldığı söylenemez. Bu tür çalışmalar için, klasikleşmiş tasavvuf kaynaklarına başvurmak gerekir. Tasavvuf, evliyalar ve onların menkıbeleri ile ilgili Arapça ve Farsça yazılmış çok sayıda klasik eser mevcuttur. Bu eserlerden biri de Abdurrahman Camî olarak bilinen alim ve şair Nureddin Abdurrahman Camî'nin (ö. 898/1492) 15. yy'da Farsça yazdığı ve 34'ü kadın olmak üzere 618 evliyanın menkıbelerinden oluşan *Nefahatü'l-Üns min Hazarati'l-Kuds* adlı eseridir. Bu eserde yer alan Kürt evliyalar üzerine bir araştırma yapıldığı takdirde, söz konusu alandaki pek çok soruya cevap bulunabileceği gibi Kürtler'in tarihi, edebiyatı, kültürü ve inancıyla ilgili karanlıkta kalmış pek çok nokta da aydınlatılmış olacaktır.

Bu çalışmanın amacı, Abdurrahman Câmî'nin *Nefahatü'l-Üns* adlı eserinde yer alan Kürt evliyaları ve menkıbelerini tespit etmek ve ortaya çıkarmaktır. Eserde yer alan evliyaların hayatı ve eserleri Kürdoloji alanında çalışmalar yapan araştırmacılar için faydalı olabilmesi bu çalışmanın hedeflerindedir.

Anahtar Kelimeler: Tasavvuf, menkıbe, evliya, Kürt, Nûreddîn Ebdurahmanê Camî, Nefahatu'l-Üns.

ABSTRACT

Sufism and the subjects related to it have attracted the attention of many researchers who have been studying religion and beliefs throughout history. One of that kind of field is Sufism and Kurdish saints among the Kurds. Although there are some valuable studies in this field, it cannot be said that there is sufficient deep researches. For such studies, it is necessary to refer to classical sources of Sufism. There are many classical works written in Arabic and Persian about Sufism, saints and their legends (menkebe). One of these works was written by the scholar and poet Abdurrahman Cami (d. 898/1492), known as Nureddin Abdurrahman Cami and his work named *Nefahatu'l-Uns min Hazarati'l-Kuds*, written in the 15th century, composed of 618 saints' legends, 34 of whom were women. If a research is conducted on the Kurdish saints in this book, many questions in the field will be answered, as well as many points in the darkness about the history, literature, culture and belief of the Kurds.

The aim of this study is to identify and reveal the Kurdish saints and their legends in Molla Câmî's work called *Nefahatu'l-Uns*. The life and works of the saints included in the work can be a useful reference for researchers working in the field of Kurdology.

Key Words: Sufism, legend, saint, Kurd, Nureddin Abdurrahman Cami, *Nefahatu'l-Uns*.

KURTEBÊJE

h.b.: heman berhem

h.g.: heman gotar

r. : rûpel

b.n.r.: binihêre

h.ç.: heman çavkanî

c.: cild

k.d.: koça dawîn

wer.: werger



DESTPÊK

Kesên ku li ser tesewwufê berhem nivîsîne hemû hevfiqr in ku tesewwuf piştî îslamê derketiye.¹ Lê tesewwuf ji kiryarên dînî yê merasimî nayê. Bi gotineke din, tesewwuf jiyana mîstîk a îslamê ye. Têgeha tesewwufê di nava vekolerên rojavayî de gelekî binavûdeng û cihêreng bûye. Lê di nava misilmanan de weke têgeheke hevpar hatiye bikaranîn.² Îbnî Xeldûn (k.d., 808/1406) dibêje pêdivî bi têgeheke nû çê bûye ku bi kêrî kesên dîndar û bijarte bê da ku termînolojiyeke nû ji xwe re çêkin. Ev têgeha hanê “tesewwuf” bûye.³

L. Massignon (1883-1962) di Ansîklopediya Îslamê de li ser tesewwufê bi kurtî fikrên xwe wilo beyan dike: “Bikaranîna bêjeya sofitiyê weke bêjeyeke taybet encaq li gorî salnameya hîcrî sedsala duyem e. Ev nav li Cabirê Kûfeyî b. Heyan (k.d., 253/815) ku nivîskarê berhema *el-Kîmyayê* ye, û Ebû Haşim (ss. 2.) ku ew jî bi eslê xwe ji Kûfeyê ye, hatiye kirin. Pirjimara wê *sûfiyye* (asfiya) li gorî salnameya hîcrî di sala 199an de derketiye holê. Ev bêje wê demê li Kûfeyê ji nava boçûna Şi’îtiyê derketiye holê. Lewra ji peyrewên vê boçûnê re hatiye gotin.”⁴ Mirov ji vê yekê jî fêhm dike ku wê demê tenê li Kûfeyê hatiye bikaranîn. Lewra ji bo hemû peyrewên tesewwufê nehatiye bikaranîn. Weke mînak di dawîya sedsala sêyem de li Nîşabûrê boçûneke weke Melamiye derketiye ku wan navê *soffiye*’yê bi kar anîne.⁵ Lê her çî qas cara yekem kesên weke Cabir b. Heyan Ebû Haşim bêjeya sofitiyê bi kar anîbin jî berî her tiştî ev nav li Kûfeyê hatiye bikaranîn. Çunkî di warê tesewwufê de boçûna yekem ji bajarên Besra û Kûfeyê derketiye. Her wiha bajarê Besrayê nêzîkî çanda Hindistanê bûye û ji aliyê pratîkê ve bandor li ser tesewwufa Besrayê hatiye kirin, li Kûfeyê çanda Aramiyan bibandor bûye û li wira di meseleya eşqa îlahî de tesîra Manîheîzmê jî gelekî bibandor bûye. Di pêdeçûna Îslamê de piştî

¹ Martin Lings, *Tasavvuf Nedir?*, Akabe Yayınları, İstanbul, 1986. rr. 119-20.

² Man John A. Sub, B.D. B.A., *Sufizm It's Saints And Shrines (An Introduction to the Study of Suftism with Special Reference to India)*, Universal Library, London, 2011. r. 6.

³ Ebu'l-Alâ Afîfî, *Tasavvuf İslâm'da Manevî Devrim*, Wergêr: H. İbrahim Kaçar, Murat Sülün, Risale Yayınları, İstanbul, 1996. r. 34.

⁴ Reşat Öngören, “*Tasavvuf*” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 40, rr. 119-126, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/tasavvuf>), (11.10.2019)

⁵ Afîfî, *Tasavvuf İslâm'da Manevî Devrim*, r. 36.

têgehên “tesewwuf” û “sofi”yê têgehên “menqebe” û “welî”yê peyda bûne.⁶ Em ê di beşên xwarê de bi berfirehî li ser wan rawestin.

1. Mijar

Mijara me ya sereke weliyên kurd û menqebeyên wan di berhema Nûreddîn Ebdurehmanê Camî ya bi navê Nefahatu'l-Unsê de ye. Em di destpêkê de cih didin têgehên “tesewwuf”, “welîtî”, “menqebe” û jîyana “Nûreddîn Ebdurehmanê Camî” û dûre jî em cih didin mijara xwe. Dema em behsa weliyên kurd dikin, em pêşî jî berhema sereke Nefahatu'l-Unsê sûdê werdigirin. Dûre me serî li berhemên din ên di vî warî de daye kanî bê em ê bikaribin çiqasî ji wan sûdê wergirin. Di Nefahatu'l-Unsê de li ser hin weliyan agahî pir kêr hene û Camî li ser weliyan zêde nesekiniye û hema yekser cih dide menqebeyên weliyan. Lewre me ji ber vê yekê ji çavkaniyên din, bi taybetî ên farisî sûd wergirt û heya ji destên me hat, me çavkanîyên sereke bi kar anîn.

2. Armanç

Armanca vê xebatê diyarkirin û tespîtkirina weliyên kurd û menqebeyên wan di berhema Nûreddîn Ebdurehmanê Camî ya bi navê *Nefahatu'l-Unsê* de ye. Camî di vê berhemê de qala gelek weliyan dike û ku ev xebat beşek ji wan weliyan kurd in û heta bigre weliyeke kurd a jin jî heye ku pir kêr tê naskirin. Her wiha di vê xebatê de gelek çavkaniyên din jî hatine bikaranîn da ku ew welî û menqebeyên wan baştir û zelaltir bêne naskirin.

3. Rêbaz

Xebata me xebateke berhevkarî ye, lewra armanca me ya sereke tespîtkirina weliyên kurd û menqebeyên wan di berhema Nureddîn Ebdurehmanê Camî ya bi navê *Nefahatu'l-Unsê* de ye. Herwiha xebata me xebateke berawirdkirina agahiyên li ser weliyan e ku piştî xwe dide çendîn çavkaniyên tesewwufî, lewre li têgehiştin, temamkirin û senifandina daneyên derbareyê weliyan digere û niyeta mijarên spesîfîk nagire nav xwe.

⁶ Ebu'l-Alâ Afîfî, *h.b.*, r. 36.

Xebata me ji du qismên sereke pêk tê. Qismê yekem ji her du binbeşên yekem pêk tê ku bi dorê li ser “tesewwuf” û “sofi”, “weli” û “menqebeyan radiweste. Lewra vira amadekariya bingeha beşa duyem dike. Qismê duyem jî cih dide jiyan, berhemên Camî û kurdbûna wî, girîngiya *Nefahatu'l-Unsê*, *Nefahatu'l-Uns* û *Tebeqatu's-Sofiyye*, rola weliyên kurd di tesewwufê de û herî dawîn em digel menqebeyan cih didin weliyên kurd. Di tezê de ji bo her du qisman çavkaniyên bingehîn hene.

4. Girîngî

Di vê xebatê de weliyên kurd û menqebeyên wan li gorî rê û rêbazên tesewwufî, keramet, meqamê rûhanî û bandora weliyan ya li ser tesewwufê hatiye rawestîn. Di nava vana de gelek mutesewwufên kurd hene ku me rola wan a sahaya tesewwufê li nava pêvajoya nerîta tesewwufê destnîşan kiriye. Ev arif û mutesewwufên kurd bi menqebe û saîqên xwe yên dînî bandor hem li serboriya tesewwufê kiriye hem jî ji bo ehlên mutesewwufê yên pişt xwe re bûne pêşeng. Girîngiya *Nefahatu'l-Unsê* ya Nûreddîn Ebdurehmanê Camî ev e ku ev berhema hanê tezkîreya weliyan e ku ji hemû berhemên li ser weliyan ji yên beriya xwe sûd wergirtiye û li gorî demên cuda gelek lê hatiye zêdekirin. Me jî bi vê xebata xwe aliye weliyên kurd û menqebeyên wan li nerîta tesewwufwariya kurdî girîngtir kir.

Wekî din, me hewl da ku girîngiya vê mijarê piçekî be jî zelal bikin. Bi qasî ku me di berhemên din de jî vekolîn kiriye, heya niha bo van weliyên kurd xebateke wilo nehate kirin. Mirov dikare bi hewldaneke wilo di vî warî de valahiyeke mezin tije bike. Ji ber van tîkiliyan pêdiviya xebateke wilo hate dîtin. Ji ber vî çendî ev xebata me ya kurt dikare di paşerojê de weke çavkanî yan bîbloyafiyekê ji bo vekoler û xebatkaran bê bikaranîn û bibe sedema vekolînên nû. Lewra, di vî warî de li ser weliyên kurd û menqebeyên wan xebatên wilo zanistî û birêkûpêk hema hema zêde nehatine kirin. Ev yek jî kêmasiyeke mezin di xwe de dihevine.

5. Çavkanî

Di vê tezê de bêhtir ji çavkaniyên asta yekem sûd hatiye wergirtin. Lê belê dema ji ber gelek sedeman, me nikarîbû xwe bigihandana çavkaniyên yekem, em

mecbûr man ku çavkaniyên asta duyem jî bi kar bînin. Di xebata xwe de me bi taybet çavkaniyên çapkirî bi kar înan, lê me ji çavkaniyên li ser înternetê barkirî jî sûd wergirtiye.

Di bin banê van agahiyan de teza me bi piranî pala xwe dide van çavkaniyan:

Çavkaniya me ya sereke *Nefahatu'l Uns* a Nûreddîn Ebdurehmanê Camî ye ku di heman demê de jî bingeha xebata me ye. Ji bilî vê, çavkaniyên Abu'l-Ala Afifi yê bi navê *Muhyiddîn Ibnu'l-Erebî'nin Tasavvuf Felsefesi, Tasavvuf İslam'da Manevî Devrim* û gotara “*Negahi Be Motoone Mazhabiye Alaviyan – Baktashiyane Anatoli*” ya Shahab Vali, *Sufizm It's Saints And Shrines* yê John A. Sub. Man, B.A., B.D., *Sufism The Formative Period* ya Karamustafa, Ahmet T., *Tasavvuf Nedir?* a Martin Lings, *Kültür Tarihi Kaynağı Olarak Evliya Menakıbnameleri* ya Ahmet Yaşar Ocak, *Ana Hatlariyle İslam Tasavvufu Tarihi* ya Cavit Sunar çavkaniyên bingehîn in ji bo qismê teorîk ê vê tezê.

Ji bo qismê analîz û berawirdkirina derheqê weliyan daneyên agahîderan jî ev çavkaniyên bingehîn hatine bikaranîn:

Çavkaniya me ya sereke di vira de jî *Nefahatu'l Uns* a Nûreddîn Ebdurehmanê Camî ye. Ji bilî vê bi taybet çavkaniya mîna cildên *Ansîklopediya İslamê* ya Diyanetê, *Sefîne-i Evliya* ya Osmanzade Hüseyin Vassaf, gotara bi navê “*Mesnevî'nin İnşasında ve Mevleviliğin Müesseseseleşmesi Sürecinde Çelebi Hüsameddin'in Yeri*” ya Abdurrahim Alkış, *Tezkiretü'l-Evliya* ya Ferîduddîn Attar, *Tarikhe Tasavof Dar Kordestan* ya Mohammad Raof Tavakoli, *Barakeye Hamadani Ostade Omiye Eynolghozat* ya Nasrollah Poorjavadi çavkaniyên herî girîng ên beşa duyem in.

BEŞA YEKEM

TESEWWUF, WELÎTÎ Û MENQEBE

Dîroka destpêka tesewwufê di nava misilmanan de tam eşkere nîne û mirov nikare demeke taybet ji bo peydabûna tesewwufê diyar bike, ji ber ku li gorî gelek kesan guherînên fikrî û bîr û baweriyên bi yekcarî pêk nayê. Lê ji sedsala duyem a piştî îslamê ve bizaveke taybet di nava misilmanan de derketiye holê ku şopînerên wê ji ber kincên xwe yê taybet, rêçik û rêbarzên xwe yên fikrî û gelek tiştên din ên taybet ji misilmanên din cuda bûne û lewre zêdetir derketine ber çavan. Tesewwuf di sedsala çarem a piştî îslamê de weke mektebeke girîng hat naskirin. Kesên wek Ebû Ebdullahê Tirmizî dest bi nivîsandina rîsale û berheman kirin. Lê gelek bingeh û mijarên wê di sedsalên şeşem û heftem de cihê xwe girtin. Helbet hê jî li ser hin mijarên wê nakokî hebûn. Di vê merheleyê de tesewwuf gihîşt asta xwe ya herî bilind û xurt û li hemû deverên misilman belav bû. Gelek mutesewwufên mezin derketin qadê û berhemên navdar nivîsandin. Li gorî gelek kesan piştî sedsala dehem a piştî îslamê, tesewwuf her ku çû bi derbasbûna demê re lawaz bû. Êdî rengê wê weke berê di nava civaka îslamî de nema. Helbet hîn jî tesewwuf bi hêzeke xurt dewam dike, lê weke sedsalên berê ber bi pêş ve naçe û hêz nagire.

1.1. Wateya Têgehên "Tesewwuf" û "Sofî"yê

Li ser etîmolojiya peyva tesewwufê nêrînên cuda hene, lê bi piranî di navbera vekoleran de li ser vê yekê hevdengî heye ku dibêjin peyva "tesewwuf"ê koka xwe ji "sof"ê digire ku tê wateya "hirî"yê û li ser vê baweriyê ne ku sofîyan ji ber ku kincên hirî lixwe kiribûne, lewma ev nav li wan hatiye kirin. Seyid Ziyaedînê Secadî ku li ser vê yekê vekolîn kiriye, dibêje "sofî" peyveke arî ye ku piştî derbasî nava erebiyê bûye.

Xaleke girîng ku pêwîst e amaje pê bê kirin ev e ku piraniya kesên ku li ser tesewwuf û îrfanê vekolînan dikin, di destpêkê de her duyan wek diyardeyekê dizanin, lê wateya wan ji hev cuda ye û her yek ji tiştêkî cuda re tê gotin. Bi kurt û kurmancî mirov dikare bibêje tesewwuf ji hêlên piratîkî û zahîrî re û îrfan ji aliyê

teorîk û fikrî re tê gotin. Wekî din li gorî hin kesan tesewwuf beşek ji îrfanê ye û li gorî kesine din jî, îrfan beşek ji tesewwufê ye, aliyek jî wan ji hev cuda dike.⁷ Di xebatên tesewwufî de bêjeya sofî mîna ya welîtiyê girîng e. Em niha li xwarê hinekî din ligel bêjeya tesewwufê li ser bêjeya sofîtiyê rawestin.

Li ser rayeka bêjeya sofîtiyê gelek gengeşî û boçûnên kevn û nû hene. Bêje ji kokên *s-w-f* (ص و ف), *s-f-w* (و ص ف) û *s-f-f* (ص ف ف) yê hatiye dariştin. *Sûf, safa, saff*; navê sûffeya Mescîd-î Nebevî yên weke *sûffe, sifat, sûfeyê*... *Sûfetu'l-Kafa'* (mûyê piştstû), navê riweka sûfane û di yewnaniya kevn de jî bêjeya "*sophia*" bi ya sofîtiyê ve tê pêwendîdarkirin.⁸

Binavkirina sofîyan ji cilûbergên wan yanê ji têngîna cilên wan ên bi hirî ve tê. Sofî, ne ilmê wan ê tefsîr, hedîs, fiqih heye, ne jî dikevin halê hizn, qebz⁹ û bestê. Çunkî ew ne xwe dispêrin tu kesî û tu ilmî, ne jî xwediyê xwe yê taybet in. Beravajî endîşeyeke wan a pêşketinê tuneye. Girîngiya cilûbergên wan ji çendîn gotegotan pêk tê. Yek jê ew e ku zahid û pêxemberan hertim kincên mîna wan cilûbergan li xwe kirine. Weke mînak li gorî vê nêrînê Îsa Pêxember jî kincên mîna sofîyan li xwe kiriye. Hz. Muhemmed jî cilên bihirî li xwe kiriye. Wekî din, bi vî awayî hemû pêxemberên din û ewliya û enbiyayan ev nerîta hanê şopandine.¹⁰

Heger bi bêjeya *safa* re bê pêwendîdarkirin jî, nabe *sofî*, belkî divê bibe sefaî yan jî sefawî. Ji ber vê, hin sofî dibêjin her çiqasî ku "nefs"ê ji laş û bedenê terbiye û "tesfîye" dike jî, pêwendîya *safa* û *sofî* derketiye holê. Pêwendîkirina *saffa* lewra li gorî Xwedê "*saffaya yekem*" ne *sofî* ye, belkî *saffî* ye. Ji ber vê Kelabazî dibêje *sofî* ji *sûfê* hatiye dariştin. Her çiqas sofî bi sifetên zahirî û batinî ve bêne pêwendîdarkirin jî bingeha wê ya ferhengê tuneye.¹¹

⁷ Ebu'l-Alâ Afîfî, *h.b.*, r. 36.

⁸ *h.b.*, r. 36.

⁹ "Qebz" û "best" du ruhên payebilind in ku aydê arifan in. Dema Xwedê wan dixwe tengasiyê xwe ji xwarin, vexwarin û şahiyê bi dûr dixînin. Ji bo agahiyên berfirehtir serî li nivîsên Ebdulkerîm Sirûş îslamnase îranî bidin. Di *luxetnameya Dihxudayê* de jî wateya wê heye.

¹⁰ Reşat Öngören, "*Tasawuf*" *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 40, rr. 119-126, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/tasavvuf>), 11.10.2019

¹¹ Ebu'l-Alâ Afîfî, *h.b.*, r. 40.

Nivîskarê ereb Birûnî (k.d., 440) bêjeya *sofî* bi bêjeya yewnanî “*sophia*” re pêwendîdar kiriye lê zêde li ser nesekiniye. Li gorî Joseph Von Hammerî (1774-1856) wateya bêjeya sofî “Zanyarê Rût” e ku bingeha wê ji bêjaya *gymnosophist* tê. Di yewnaniya kevn de ev bêje bi wateya “Zanyarên Hindî” hatiye bikaranîn. Lê Joseph von Hammerî dibêje ji xeynî bilêvkirina wan a bêjeyî tu wekhevîyek di navbera wan de tune. ¹²

Tesewwuf bizaveke fikrî ye ku bi edet û resmine taybet re tevlihev bûye û bi şeklekî taybet di nava misilmanan de derketiye holê û gelek kes li dora wê kom bûne û bûye beşek ji jiyana civaka îslamî ku mirov nikare bi hêsanî di ser re derbas bibe. Şopîner û bawermendên tesewwufê bi xwe li ser vê baweriyê ne ku tesewwuf di xizmeta îslamê de ye. Dibêjin ku misilman û bawermend bi vê riyê bi awayekî hêsantir dikarin xwe bigihînin heqîqetê. Ji aliyê din ve jî gelek oryantalist tesewwufê weke bawerî û ayîneke derveyî îslamê dizanin ku misilmanan ji riya rastîn a îslamê dûr dike. Dîsa jî hinek alî bi çavekî kûrtir lê dinêrin û dibêjin tesewwuf taybetî îslamê nîne û ji ber diyardeyên weke dûrçûna ji lezetên dunyayî, keşf û şuhûd, wehdetu’l-wucûd û hwd. ku bingehên tesewwuf û îrfanê ne. Lewre dîroka wê digihîje bi hezaran salan berî niha û îslamê jî derbas dike û tesewwufên Hindî, Çînî û Yewnanî weke bizavên tesewwufê yên berî îslamê dizanin. Bi giştî em dikarin bibêjin ku her kesek bi nêrîneke xwe ya taybet li tesewwufê dinêre û tiştên cuda li bara wê dibêjin. ¹³

Tesewwuf û qaîdeyên wê yên bingehîn di dîroka îslamê de têgehên girîft û kompleks in. Di dawiya serdema Xulefa-î Raşidîn (632-661) de îslam dikeve nava kêşeyên siyasî. Piştî nijadperestî û kêşeyên desthilatdariyê yên Emewîyan (661-750) û her wiha piştî wan, di nava Ebbasiyan de jî rûdanên bi vî awayî, teşeyên têkel dide dîne îslamê. Di serboriya dîroka îslamê de, ji ber van qeyranên aloz; tesewwufê, weke bizaveke mîstîk serî hilda. Ev serîhildana hanê di sedsala navîn a îslamê de hatiye meydanê û mirovên bawermend ji her tebeqeyên girîft ên civakî, tesewwuf weke stargeheke aramiyê dîtin. Dûre pevçûnên tund ên civakî derdikevin holê ku

¹² Ebu’l-Alâ Afîfî, *h.b.*, r. 41.

¹³ Reşat Öngören, “Sûfî” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 37, rr., 113-115, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/sufi>), (12.10.2019)

bandora wan li ser îslamê gelek e. Em ê li jêrê jî behs bikin, di encama van bizavan de derketina mezheb, terîqet û hwd. hazîrîya alîkariya vejîna tesewwufê dike.¹⁴

Li gorî salnameya hîcrî di sedsala sêyem de di nava mutesewwufan de têgehên mîna “mihebet”, “fena”, “beqa” û “îtihad” belav bûne.¹⁵ Di dawîya sedsala sêyem a hîcrî de xwendekarên Serîye Seqetî mezhebên mutesewwufên Dibistana Bexdayê birin bajarên mîna Xorasan, Misir, Girava Erebiştanê û Nîşabûrê.¹⁶

Di sedsala çarem a hîcrî de bi taybet li Bexdayê mutesewwufên binavûdeng hebûne ku xwediyê ilmekî tesewwufî bûne. Di serî de kesên weke Ebû Bekir Şiblî (k.d., 334) ku hevdem û rêhevalê Cuneydê Bexdadî ye, xizmeteke mezin ji bo tesewwufê kiriye. Cara yekem Cafer b. Mihemed b. Nasir el-Xuldî li ser hîkayet û dîroka mutesewwufan nivîsiye. Lewra Xuldî di vê serdemê de cihekî girîng girtiye. Di dawîya sedsala çarem de bizavên tesewwufî bi taybetî li bajarê Şîrazê geş bûne. Ebu'l-‘Ebas Ehmed b. ‘Umran b. Serîc (k.d., 305) li Şîrazê haletên rûhanî yên sofîyan û mirêsa mutesewwufên Şîrazê daye naskirin.¹⁷

Di sedsalên sêyem û çarem ên hîcrî de tenê tesewwuf bi pêş ve neçû yan jî mezheb ava nebûn, digel vana terîqet jî vejiyan. Ji sedsala sêyam a hîcrî û pê ve terîqetên tesewwufî derketin meydanê. Ew terîqet bi navê damezrînerên xwe hatin binavkirin. Haris Mûhasibî bi terîqeta Mûhasibiyeyê, Humdûn Qesar bi Qesarê, Ebû Yezîd Tayfûr Bestamî bi Tayfûriyeyê, Cuneydê Bexdadî bi Cuneydiyeyê, Ebu'l-Hesen en-Nûrî bi Nûriyeyê û hwd. hatin binavkirin.

Piştî bizavên jorê êdî tesewwuf di nava erdnîgariya îslamê de bi tevahî belav bû. Di encamê de vejîna terîqetan bû sedama pirsgirêkên ligel şerîetê. Piştî dawîya sedsala sêyem a hîcrî di navbera peyrewên ilmên zahirî yên şerîetê ango yên ku bi hikmên zahirî yên Quranê re dimeşîyan û şopîner û peyrewên ilmên batinî yên şerîetê de pevçûnên tund derketin. Li Bexdayê kesên weke Zu'n-Nûnê Misrî û Ebû Hemze hatin dadgehkirin. Ji bilî vê, ji ber gotina Mensûrê Helac ku gotibû: “Enel Heq” (Ez

¹⁴ Ebu'l-Alâ Afîfî, *h.b.*, r. 34.

¹⁵ Cavit Sunar, *Ana Hatlariyle İslâm Tasavvufu Tarihi*, Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, Ankara, 1978. r. 45.

¹⁶ Ebu'l-Alâ Afîfî, *h.b.*, r. 46.

¹⁷ Cavit Sunar, *Ana Hatlariyle İslâm Tasavvufu Tarihi*, r. 46.

Heq im/ Ez Xwedê me) pevçûn zêdetir bû ku kesê weke Mensûrê Helac bi awayekî hovane hate kuştin. Ji bilî vê Şehabedînê Suhrewerdî bi fermana Selahedînê Eyûbî li Helebê ji birçîna hate kuştin. Li Helebê, Nesîmî hate selixandin û Bedredîn Semawî li Serezê hate darvekirin.¹⁸

Ji ber bûyerên ku vê dawiyê di warê tesewwufê de rûdane, tesewwufê manewiyeta xwe ya berê wenda kiriye. Her çiqas girîngiya tesewwufê kêr nebûbe jî meyla li ser wê kêr bûye. Her wiha ji kêmbûnê wêdetir arîşe lê zêdetir bûne.¹⁹

1.2. Klasîkên Tesewwufê

Sofî yekemîn kes bûn ku jiyana dunyewî û tecemulperestî li dijî heqîqeta dîndarî û xwedaperestiyê dizanîn û ya girîng ji wan re rizgariya di axiretê de û bidestxistina nimeta wê dunyayê û bi taybet gihîştina bi Xwedê di biheştê de bû. Lê ji nêveka sedsala sêyem ve, sofîyan hêdî hêdî rêxistinên xwe yên civakî ava kirin û pergala murîd û muradiyê di navbera wan de çêbû. Hinek şêxan jî dest bi nivîsandina rîsale û pirtûkan kirin û bi vî awayî hêlên teorîk ên terîqetên xwe belav kirin û aliyên teorîk û her wiha mutesewwuf hînî murîdên xwe dikirin.

Sofî bi giştî ehlê gerê û seferê bûn û bi piranî li cihekî taybet nediman, lê navenda wan a destpêkê Bexda bû û gelek mutesewwufên navdar lê diman. Kesên mîna Cuneydê Bexdadî, Ebu'l-Hesenê Nûrî, Ebû Seîdê Xezaz, Îbnê Eta el-Edmî, Ebû Bekirê Şiblî û hwd. li wira dijiyan. Sofiyê herî navdar Cuneydê Bexdadî bûye ku gelek mutesewwufên piştî wî, terîqeta xwe bi wî ve girêdane. Helbet li herêmên din ên mîna Şam, Misir, Faris, Azerbeycan û Xorasanê jî gelek şêxên din hebûn. Ebû Bekirê Kelabazî dîroka Sofîyan nivîsiye û sofî li gorî herêmên ku tê de jiyane dabeş kirine. Dema di berhema xwe de gihîştîye ser herêmên mîna Xorasan û Cibal û Iraqa Ecem, dibêje ku Bayezîdê Bestamî ji Bestamê, Ebû Hefsê Hedad ji Nîşabûrê, Ehmed b. Xizrewîye ji Belxê, Sehl b. Ebdullahê Testerî ji Şûsterê, Yûsif b. Huseynê Razî ji Reyê, Ebû Bekir b. Tahir ji Ebherê, Elî b. Sehl b. Ezher ji Îsfehanê, Kehmes b. Elî ji Hemedanê û Elî b. Huseyn b. Yezdanyar ji Êrmiyê ye.

¹⁸ Cavit Sunar, *h.b.*, r. 46.

¹⁹ Martin Lings, *h.b.*, rr. 140-50.

Di navbera mutesewwufan de li ser hin bawerî û rêbazên tesewwufê nakokî û dubendî hebûn. Bi giştî di destpêkê de ji ber hebûna fikrên cuda û nakokiyên di navbera sofiyan de û her wiha dûrbûna mesafeyan û ji bo mayindebûna fikrên wan, mutesewwufan dest bi nivîsandinê kiriye.

Hebûna nakokiyên dibû sedem ku şêx bi hev re "niqar"²⁰ bikin û hin nivîskar jî ji bo van nakokiyên asayî bidin nîşandan, mijareke bi navê "munazereya sofiyan" vedikirin û li bara wan dinivîsîn.

Yek ji guherînên ku di sedsala çarem de bi awayekî xurt derket holê, ev bû ku sofî ji berê zêdetir ber bi aliyê nivîsandina rîsale û pirtûkan ve çûn. Di nîveka sedsala sêyem de hin şêxên Bexdayê yê wek Cuneyd û Xeraz û Nûrî fikr û boçûnên xwe wek rîsaleyên kurt dinivîsîn, lê ji sedsala çarem û vir ve nivîsandin wek cureyeke edebî derket holê û gelek pirtûk û destîne ji hêla sofiyan ve hatin nivîsandin. Di wê sedsalê de herî kêr 4 pirtûkên girîng hatine nivîsandin:

- **Qûtu'l-Qulûb;** Ji hêla Ebû Talibê Mekkî ve hatiye nivîsandin.
- **Kitabu'l-Lume' fî't-Tesewwuf;** Ji hêla Ebû Nesr Serracê Tûsî ve hatiye nivîsandin.
- **Kitabu't-Te'erruf li Mezhebî Ehlî't-Tesewwuf;** Berhema Ebû Bekirê Kelabazî ye.
- **Tehzîbu'l-Esrar;** Ebû Se'îdê Xergûşiyê Nîşabûrî nivîsiye.

Ev berhem hemû bi erebî ne û di sedsala pêncem de hejmeta pirtûkan zêdetir bû.

Ebu'l-Qasimê Quşeyrî jî rîsaleya xwe bi erebî nivîsî û lewma li herêmen din gelekî belav bû. Lê Ebû Îbrahîmê Îsmayîlê Mustemliyê Buxarî pirtûka *et-Te'erufa* Kelabazî bi farisî şirove kir û bi vî awayê yekemîn dairetu'l-mearifa (ansîklopedî) tesewwufê bi farisî hat nivîsandin. *Keşfu'l-Mehcûba* Elî b. Osmanê Hucewîrî jî pirtûkeke din a bi farisî bû ku di nava sofiyên farisan de berbelav bû. Ebû Hamidê Xezalî piştî ku berhema xwe ya bi navê *Îhyau Ulûmî'd-Dîn* bi erebî nivîsî, kurteya wê bi farisî jî bi navê *Kîmyayê Seadet* derxist. Nerîta nivîsandina berhemên

²⁰ Munazere, munaqese, şer

tesewwufê di sedsalên piştî wê jî berdewam kir. Berhama herî navdar a erebî *Ewarifu'l-Mearifa Şehabedînê Umerê Suhrewerdî* ye ku gelek werger jê hatine kirin û wergerên wê herî navdar jî *Misbahu'l-Hidayet* û *Miftahu'l-Kîfayet* ên Îzeddîn Mehmûdê Kaşanî (ss., 8.) ne.

Ev berhem ji nêrînên şêxan ên ku dixwestin şagird û murîdên wan pê bizanin pêk dihatin. Tê de hem mijarên têkildarî bîr û baweriyên û hem jî mijarên zanistî yê tesewwufê dihatin qalkirin. Ravekirina tesewwufê û nasandina sofîyên mezin, mijara merîfet û tewhîdê, mijara ehwal û meqamatan, şirovekirina rêbazên ibadet û reftarên civakî û şexsî yê wek lixwekirina kincan û xwarinê, mijara sema û helbet û amûrên mûzîkê û beşdarbûna di merasimên semayê de û her wiha şirovekirina biwêj û termên taybet ên sofîtiyê wek mijarên wan berheman ên sereke dihatin zanîn.

Tevî ku ev pirtûk ji gelek hêlan ve dişibiyên hevdu, lê her yek xwedî taybetiyên mektebên sofîyan bûn û her wiha herêmên ku nivîskar lê dijîyabûn.

Li ser cureyên klasîkên tesewwufê û hejmar û mijarên wan di çavkaniyên cuda de gelek agahî hene, lê mirov dikare tezkereyên klasîk ên herî navdar ên tesewwufê wiha rêz bike:

1. El-Lume' fi't-Tesewwuf; Ebû Nesrê Sirac nivîsiye; Ebû Nesir bi xwe di sala 378an a hicrî de çûye ser dilovaniya xwe. Ev berhem wek berhema herî navdar û kevnar a dîroka tesewwufê tê naskirin û di nîveka sedsala çarem de hatiye nivîsandin.

2. Tebeqatus-Sofîyê; Sulemî: Sulemî di sala 412an de çûye ser dilovaniya xwe. Bi vî awayî ev berhem wek duyemîn berhema kevnar tê naskirin û bi ihtimaleke mezin di dawiya sedsala çarem de hatiye nivîsandin.

3. Hilyetu'l-Ewliya we Tebeqatu'l-Esfiya; Ebû Neîmê Îsfehanî nivîsiye: Zimanê berhemê bi erebî ye. Ebû Neîm di 430yan de wefat kiriye. Lewre ev berhem bi ihtimaleke zêde ya destpêka sedsala pêncem e.

4. El-Beyaz we's-Sewad min Xesaisî Hikemî'l-'Ibad fi Ni'metî'l-Murîd we'l-Murad; Xace Eliyê Siyerganî nivîsiye. Xace Elî di nîveka sedsala pêncem de wefat kiriye. Lewre ev berhem divê ya nîveka yekem a sedsala pêncem be.

5. **Er-Rîsaletu'l-Quşeyriyye**; Ebdulkerîm b. Hewazîn Quşeyrî: Di sala 464 a hicrî de çûye ber rehma Xwedê û hatiye gotin ku er-Rîsaletu'l-Quşeyriyye di navbera salên 437 û 438an de hatiye nivîsandin.

6. **Keşfu'l-Mehcûb**; Elî b. Osmanê Hucewîrî: Di sala 465an de wefat kiriye. Lewre divê ev berhem jî di nêveka yekem a sedsala pêncem de hatibe nivîsandin.

7. **Tebeqatu's-Sofiyye**; Xace Ebdullahê Ensarî: Ensarî di sala 481ê de çûye ser dilovaniya xwe. Lê wî *Tebeqatu's-Sofiyye* di serdema jiyana xwe de gotiye û murîdên wî nivîsîne. Bi vî awayî tê gotin ku pirtûka wî di navbera salên 481ê heya 520an de hatiye komkirin.

8. **Menaqibu's-Sofiyye**; Qutbedîn b. Ebu'l-Muzeferê Ibadîyê Mirozî: Tê gotin ku Ibadî di sala 547an de miriye. Lewma ev pirtûk di nêveka yekem a sedsala şeşem de hatiye nivîsandin.

9. **Adabu'l-Murîdîn**; Ebdulqahir b. Ebdullahê Suhrewerdî: Wefata Suhrewerdî di sala 563an de çêbûye. Mirov dikare bibêje ku ev berhem jî ya nêveka yekem a sedsala şeşem e.

10. **Şerhu's-Şaetehiyyat**; Rûzbihanê Beqlî; Rûzbihan di sala 606an de wefat kiriye. Bi ihtimaleke mezin Şerhu's-Şaetehiyyat di nêveka duyem a sedsala şeşem de hatiye nivîsandin.

11. **Selcûqîyan Ve Xuz Der Kirman**; Efeluddînê Kirmanî nivîsiye: Efeluddînê Kirmanî di sala 615an de ji vê dunyayê koç kiriye. Bi ihtimaleke zêde ev pirtûk di destpêka sedsala heftem de hatiye nivîsandin.

12. **Tezkîretu'l-Ewliya**; Feriduddin 'Ettarê Nîşabûrî nivîsiye. 'Ettar bi xwe di sala 618 a hicriya qemerî de wefat kiriye û tê gotin ku nivîsandina pirtûkê di destpêka sedsala heftem de pêk hatiye.

13. **Misbahu'l-Hidayet we Miftahu'l-Kifayet**; Izedînê Kaşanî nivîsiye: Kaşanî disala 735an de ji vê dinê çûye. Lewra divê ev pirtûk berhema nêveka yekem a sedsala heştam be.

14. **Firdewsu'l-Murşidiyye we Esraru's-Semediyye**; Mehmûd b. Osman nivîsiye: Mehmûd b. Osman ev pirtûk li gorî çavkaniyeke erebî ji Ebû Bekirê Mihemed b. Ebdulkerîm nivîsiye. Tê gotin ku ev berhem di sala 728an de hatiye nivîsandin.

15. Tarîxê Guzîde; Hemdullahê Mustewfî: Ev pirtûka navdar di sala 730an de hatiye nivîsandin.

16. Sefwetü's-Sefa; Derwîş b. Îsmayîlê Bezar: Ev pirtûk li ser jiyana şêx Sefiyedînê Îshaqê Erdebîlî, bapîrê Şah Îsmayîlê Sefewî yê pêncem hatiye nivîsandin û di sala 759an de bi dawîn bûye.

17. Tezkereyi Hezar Mezar; Cuneydê Şîrazî nivîsiye. Dibêjin ku ev berhem di sala 791ê de hatiye nivîsandin û lewra mirina Cuneyd jî piştî vê salê tê zanîn. Neviyê Cuneyd ê bi navê Îsa b. Cuneyd ev çavkanî ji erebî wergerandiye farisî.

18. Sîretê Ibnê Xefî; Yehya b. Cuneydê Şîrazî: Ev berhem ji pirtûkeke erebî ya bi heman navî hatiye wergerandin. Wergera Yehya b. Cuneyd a dawîya sedsala heştem an jî destpêka sedsala nehem tê zanîn.

19. Nefahatu'l-Uns min Hezeratî'l-Quds; Ebdurehmanê Camî nivîsiye: Ev berhem di sala 883an de bi dawî bûye.

20. Silsiletü'z-Zeheb; Nûreddîn Ebdurehmanê Camî nivîsiye: Dîroka nivîsandina vê mesnewiyê wek sala 887an tê zanîn. Camî ev mesnewî bi şewaza Hedîqetu'l-Heqîqet nivîsiye. Ev pirtûk wek yekane berhema helbestkî ango menzûm di vî warî de tê zanîn.

21. Tezkîretü'l-Ewliya Mihrabî Yan Mezaratê Kirman; Mihrabiyê Kirmanî nivîsiye: Di sala 939an de hatiye nivîsandin.

22. Kedew Metbexê Qelenderî; Ezletiyê Xelxalî nivîsiye: Sala mirina Qelenderî 1054 tê zanîn, lewma ev berhem jî bi ihtimaleke mezin di nîveka yekem a sedsala 11an de hatibe nivîsandin.

23. Riyauz's-Seyahet; Zeynel Abidînê Şîrwanî; Wefata Şîrwanî di sala 1253an de pêk hatiye û divê Riyaz es-Seyahet di nîveka yekem a sedsala sêzdehem de hatibe nivîsandin.

24. Camî'u'l-Keramati'l-Ewliya; Yûsif b. Îsmayîl en-Nehbanî nivîsiye. Nehbanî di 1350ê de wefat kiriye.²¹

Klasîkên din jî wilo ne:

²¹ Leyla Hashemiyani, Mohsen Qasimi, "Shive'l Novin Dar Barrasiye Ahvale Shah Shojae Kermani", *Majalleye Tarikhe Adabiyat*, Doreye 11, hej., 1, 2010. r. 183-185.

25. Haris b. Esed el-Mûhasibî (k.d., 243/857) Ev zat yekem kes e ku berhemên wî gihîştine roja me. Nêzikî sîh berhemên wî hene ku bi taybetî berhema wî ya bi navê *Er-Riaye li-Hukûkillah* berhemeke sereke ya tesewwufê ye. Mutesewwufên weke Quşeyrî û Xezalî sûd jê wergirtine.

26. Hekîmê Tirmizî (k.d., 320/932) yekem ramangerê tesewwufê tê hesibandin. Berhema wî ya bi navê *Hatmu'l-Velaye* ji Îbnu'l-'Erebî re bûye çavkanî. Ev berhem ji aliyê Osman Yehya ve di sala 1965an de li Bexdayê hatiye çapkirin.

27. Ebû Bekir el-Kelabazî (k.d., 380/990) di warên kelim, fiqih û hedîsan de alimekî mezin bûye. Bi klasîka tesewwufî ya bi navê *Et-Taarruf* di mijarên îtîqadî de tesewwuf hatiye şîrovekirin. Ji aliyê Süleyman Uludağ ve di sala 1976an de li Stenbolê hatiye wergerandin.

28. Ebû Talib el-Mekkî (k.d., 386/996) berhema wî ya bi navê *Kûtu'l-kulûb* mijarên mîna zuhd, îbadet, taet û tesewwufa 'emelî dihundirîne. Xezalî ji vê berhemê sûd wergirtiye. Gelek caran hatiye çapkirin. Herî dawî ji aliyê Seîd Nesîb Mekarîm ve di sala 1995an de li Beyrûdê li du bergan hatiye çapkirin. Ji aliyê Muharrem Tan, Yakup Çiçek û Dilaver Selvî ve di salên 1999-2003an de hatiye çapkirin. Mixabin wergerên wan ên kurdî nînin.

29. Muhammed el-Xezalî (k.d., 505/1111) binavûdengiya Xezalî li aliyê dinyayê berbelav e. Pisporekî kelim, felsefe û tesewwufê ye. Berhema wî ya bi navê *Îhyau Ulûmi'd-Dîn* di warê tesewwufî de abîdeyeke bêhempa ye. Ev berhem jî bi dehan caran hatiye şerhkirin û wergerandin. Ji aliyê Ahmed Serdaroğlu û Ali Arslan ve bo tirkî hatiye wergerandin.

30. Ebû Hafs Omer es-Suhrewerdî (k.d., 632/1234) li Bexdadê weke “Şêxê Şêxan” binavûdeng bûye. Berhema wî ya bi navê *Avarîfu'l-Maarif* çavkaniya terîqeta Suhrewerdîyê bûye. Ji beriya xwe hinekî cudatir li ser mijarên mîna jiyana tekkeyê û adaba xelwetê rawestiyaye. Ji aliyê Hesen Kamil Yilmaz û Îrfan Gündüz ve bo tirkî hatiye wergerandin.

31. Muhyîddîn b. Arabî (k.d., 638/1240) nûnerê girîng ê teffekura tesewwufê ye. Wehdetu'l-wicûdê sistematîze kiriye. *Fusûsu'l-Hikem* û *el-Futûhatu'l-Mekkiye* berhemên wî yên herî navdar in. Gelek wergerên wan hîn jî tene kirin.

32. Mawlana Celaleddînê Rûmî (k.d., 672/1273) helbestkarê wecd û eşqê ye. Cîhanbîriya xwe ya hestan bi helbestê vekiriye, bi Mesnewiyê pêşkêş kiriye. Berhema wî ya bi navê Mesnewî û navdariya helbestkar li her aliyê dinyayê berbelav bûye. Ev berhem bo dehan zimanan hatiye wergerandin. Ev berhema giranbuha ji aliyê Tahir Akyürek ve bo kurdî jî hatiye wergerandin.²²

1.3. Têgeha Welîtiyê

Bêjeya “welîti”yê ji erebî ji lêkera nêzîkbûnê hatiye dariştin. Ji bilî vê, tê wateyên nêzîkbûna tişteki yan arîkariya bi yekî/ê re. Wekî din, bi van wateyan jî tê zanîn: dost, heval, arîkar, cîran û hwd.²³ Bêjeya “ewliya” jî pirjimariya wê ye. Di nava kurd û tirkan de bi piranî bi wateya xwe ya yekjimar hatiye bikaranîn. Em ê jî bêhtir bi awayê wê ye “welî” bi kar bînin. Di Quranê de jî bêjeya welî hem weke yekjimar û hem jî weke pirjimar hatiye bikaranîn. Û di Quranê de tê wateya kesê ku ji Xwedê hez dike û ye ku ji aliyê wî ve dibe dost û heval.²⁴ Lê dûre wateya xwe guhertiye û bûye mirovê mezin.²⁵ Li gorî Ibnu'l-'Erebî û sofîyan welîti nayê wateyên dîndarî û pîroziyê. Li gorî têgihîştina Erebî taybetiya welîtiyê ya girîng “Şarezayî/me'rîfet” e ku ji wehdetu'l-wicûdê sûdê werdigire. Li gorî boçûna Erebî divê welî xuyabûna xwe li gel pêwendîya Xwedê xurt bike û bi heqîqetekê re yekîtiya xwe ya hinavîn saz bike da ku bigihîje pileya welîtiyê. Bi gotineke din, li gorî boçûna Erebî kesên ku bigihîjin têgehên mîna “mîrovên gihîştî” û “melamî”²⁶yê dê bibine welî.²⁷

²² Hasan Kâmil Yılmaz, *Anahatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatlar*, Ensar Neşriyat, İstanbul, rr. 54-56.

²³ Bekir Topaloğlu, “Velî” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 43, 2004. rr. 24-25, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/veli--esma-i-husna>), 12.10.2019

²⁴ Ji bo van ayetan bnr. Sûreya Yûnis, ayeta 62an: “Agahdar bin, bê guman dostên Xwedê ne tirs ji bo wan heye ne jî ew xemgîn dibin.”; Sûreya A'raf li ayeta 196an: “Bê guman piştevan û arîkarê min Xwedê ye, ew Xwedayê ku pirtûk şandiye û ye ku arîkarî û xwedîtiya qencikaran dike her ew e.”

²⁵ Ahmet Yaşar Ocak, *Kültür Tarihi Olarak Menâkıbnâmeler (Metodolojik Bir Yaklaşım)*, Atatürk Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Tarih Kurumu Yayınları, 2016. r. 1.

²⁶ Vê bêjeya ku Ibnu'l-Arabî weke têgehekê li tesewwufê zede kiriye, fêhmbariya wî ya derheqê welîtiyê nîşanî meriv dide. Bi piranî tê wateya înzîwa/xelwetê. Lê di esasê xwe de wateya sofîyê herî berz, bilind dide. Melamî ji pesindayîne hez nakin. Tenê bîra Xwedê dikin. Bi Xwedê re dibînin û pê re dibihîsin. Nefsa xwe ya dunyawî davêjin ber robarekê. Kesê ku di destpêka beşdarbûna terîqetê de beşeke terîqetê derbas dike jê re “melam” tê gotin.

²⁷ Ebû'l-Ala Afîfî, *Muhyiddîn İbnu'l-Arabî'de Tasavvuf Felsefesi*, Wergêr: Mehmet Dağ, Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, Ankara, 1975. r. 91.

1.4. Çêbûna Têgeha Welîtiyê Di Pêvajoya Dîroka Tesewwufê De

Ji Hîcretê pê ve bizava tesewwufê bi awayên zuhd û teqwayê dest pê kiriye. Ji sedsala 9an û vir ve jî pergaleke ramanî wergirtiye. Ji sedsala 11an û pê ve bi belavbûna terîqetan û di sedsala 12an de jî bi berfirehbûna îslamê re, tesewwufê pêngava xwe ya qewîn avêtiye. Lê di esasê xwe de heger mirov li pêşveçûna tesewwufê ya giştî binihêre, tiştê ku reh dayê yan jî mijara wê ya eslî tenê bi tenê daxwaza xwegihandina ber bi Xwedê ve ye. Ango, vê pêvajoya manewî reh daye têgeha welîtiyê. Di vê pêvajoyê de yê ku xwe digihîne meqseda xwe welî ye ku ew dostê Xwedê ye.²⁸

Têgeha pileya welîtiyê di sedsala 9an de sistematîze bûye. Ji ber vê sistematîzebûnê di navbera weliyan de teşeyeke weke pîramîdê çêbûye. Her wiha ev pergal bi dorê wilo ye: Recebiyûn, Muferedûn, Esaib, Nuqeba, Ebdal, Efrad, Ectad, Îmaman cih digirin û serê vê pîramîdê ku serkêşê gişan e, lewma serê vê pergalê Qutb werdigire. Ji ber vê yekê Qutb li ser rûyê erdê nûnertiya hemû weliyan dike. Rêveberiya vê pergalê jî ji hêla weliyan ve tê kirin.²⁹ Lê li gorî baweriya sofîyan weliyên îslamê nûnerên manewî yên pêxemberê îslamê Hz. Mihemed in. Lewra li gorî Îbnu'l-'Erebî nûnerê herî dawî yê silsileyê weliyan Hz. Mihemed e. Bi gotineke eşkeretir welî nûra xwe ya manewî ji pêxemberê îslamê Hz. Mihemed wergirtiye. Heya vira Îbnu'l-'Erebî bi sofîyan re hevfiqr e. Lê ji vir û pê ve êdî bi sofîyan re nîne. Mirov dikare vê yekê bi çend xalan wiha amaje bike:

1. Awayê wî yê pevxistina welîtiyê bi dersirûştîyê re ye.
2. Pêwendîya di navbera pêxember, nûner û welîtiyê de.
3. Berfirehkirina wateya bêjeya welîtiyê.
4. Mafên ku ji bo weliyan aniye.
5. Boçûna ku wî mohr kiriye û li ser xwe deman kiriye.³⁰

²⁸ Afîfî, *Muhyiddîn Ibnu'l-Arabî'nin Tasavvuf Felsefesi*, rr. 1-2.

²⁹ *h.b.*, rr. 3-4.

³⁰ *h.b.*, r. 91.

Heya sedsala 13an welîtî di nava hewldana pêşveçûnê de bûye. Lê ev bi tenê ji hêla îslamê ve çênebûye. Weke mînak bandora Gnostîsîzm û Eflatûnparêzan jî çêbûye.³¹ Di esasê xwe de bîrdoziya suniyan avakariya welîtiyê jî kiriye. Lê di demên despêkê de aliman ev yek nepejirandine. Ji ber nepejerendina aliman, gelê derdorê jî bertekên neyînî nîşan dane. Werhasil, her çî qas suniyan xwestibin welîtiyê bigihînin asteke bilind jî, lê bi ser neketine. Bi heman awayî mezheba Mutezîleyan jî li dijî vî tiştî derketiye. Di vê meseleyê de hewildanên mûtesewwufan jî girîng in. Lewra mûtesewwufan bertekên li dijî berzkirina welîtiyê bi awayekî stratejîk nixandine û berê wê dane deriyê xêrê. Ji ber vê yekê bertekên li dijî welîtiyê temisîne û suniyan bêhtir xwe li welîtiyê girtiye.³²

1.5. Jêderkên Welîyan

Bi kurtahî welî ew kes e ku bi hêz û şiyana xwe nêzîkî Xwedê ye. Yan jî di her meseleyê de çî zindî, çî mirî, ji welî tê bawerkirin ku wê bi hin kerametên xwe yê derasayî arîkariya mirovan bike. Welî bi saya van taybetmendîyan weke kesekî pîroz tê dîtin. Gelek civaknasên mîna Richard Hartman û Gustav Menchhing dibêjin ku ev tiştê hanê li derdora misilmantiya gel ango ya adetî çêbûye. Rola welîtiyê di dînen mîna Bûdîzm, Xirîstiyaniyê û Îslamê de, li cihên ku ev dîn lê dijîn, pêwendîyeke xwe ya rasterast heye. Lê ji ber van awayan ji nava van dînan ê herî kevn, Bûdîzm e. Çî Xirîstiyaniyê be û çî Îslam be têgehên ezîz an welî ji berê ve li cihên ku ev dîn lê jiyane, hene. Belê, beriya Xirîstiyaniyê û Îslamê jî kerametên ezîz û welîtiyê hebûne. Gelên van dînan bawerî bi van têgehên dianîn. Bi taybetî di Xirîstiyaniyê de ezîzan ji demên berê ve ji mîtolojiyê û xwezayê sûd wergirtine. Îslam jî wekî Xirîstiyaniyê wisa ye. Lewra çawa ku ezîziya Xirîstiyaniyê sûdê ji dîrok, mîtolojiyê û xwezaya xwe wergirtibe, Îslam jî ji mêjûya xwe û ji pûtperestiyê wergirtiye.³³

Îbnu'l-'Erebî di ragihênera xwe ya kalamê de xwe weke peyrewê Hz. Mihemed û heqîqetê dibîne. Xelîfeyên Xwedê yê rastîn pêxember û welî ne. Di

³¹ Heman tevger di Xirîstiyaniyê de jî çê bûye. Lewra telaqiya/têgihîna Saintan (ezîzan) wekî têgihîna welîyan a tesewwufê ku her çî qas ferq û ciyawazî hebin jî, hin wekandin di navbera wan de hebûne. Weke mînak, ezîz dostên Xwedê ne, ew jî xwedî keramet in, xwe ji hemû zewqên dinyewî diparêzin da ku xwe bêhtir nêzîkî Xwedê bikin.

³² Ocak, *Menâkıbnâmeler*, rr. 4-5.

³³ *h.b.*, r. 6.

esasê xwe de mirov dikare ji van giştan re bibêje welî. Li gorî Îbnu'l-'Ereb jî hemû pêxember û hemû resûl welî ne. Çunkî hemû ruhê Hz. Mihemed di xwe de dihewînin. Dema ku pêxember û resûl di asta welîtiyê de bin bêhtir kamil in. Kelam ruhê Mihemed e. Îbnu'l-'Ereb bi awayekî din lê dinihêre û dibêje ku ji Hz. Adem heya niha, hemû dîn û pêxember bi xêra Îslam û Mihemed in.³⁴

1.6. Avabûna Welîtiyê

Di erdnîgariya Îslamê de her welî ne xwedî keramet û rûmetê ne. Gelek ji wan piştî ku çûne rehma Xwedê hatine jibîrkirin. Lê hin ji wan hene ku bi qasî hezar salan di bîra gel de her û her mane. Dema ku li ser xalên girîng ên pêvajoyê û serboriya welîtiyê vekolîn û şîrove tene kirin, divê li ser civakên ku welî tê de jiyane bi her aliyê ve vekolîn bêne çêkirin. Çunkî ew civak bi nîrxên xwe û bi welîtiyê ve hatine pejirandin. Her wiha encaq ê ku erka welîtiyê dabe ser milê xwe dikare angaştê xwe piştrast bike. Welîtiyê ku erka xwe bi van awayan anîbe cih êdî ew kes ne însanekî asayî ye, ew kes êdî piştê xwe daye civakê û weke çiyayekî bimirê e.³⁵ Ji vana pê ve welî dibe xwedî keramet. Loma dema ku welî hîn li vê cîhanê ye, cîhanbîriya wî bi rûdanên derasayî ve tê pejirandin. Heger here rehma Xwedê jî ji aliyê însanan ve tê bawerkirin ku keramet û rêza welî li ser rûyê erdê her dem wê bidome. Heta piştê ev qudret û kerametên hanê bihêztir dibin. Piştî van merhaleyan silsileyê menqebeyan derdikeve holê.³⁶

Piştî merhaleyên jorê şolkerên derûnnasiyê welîtiyê di nava van xalên jêrîn de dirixînin:

1. Welî, êdî ji ber ku qudreteke rûhanî di xwe de dihewîne, civak hem jê ditirse hem jî rêzê lê digire. Heger yek bêhurmetiyekê li ber weliyekê bike wê ji nişkê ve bimire ku wê mirina wî bi matmayîn be.
2. Sûdwegirtina qudreta rûhanî û qewirandina xerabiyên.

³⁴ Affî, *Muhyiddîn İbn'l-Arabî'nin Tasavvuf Felsefesi*, r. 93.

³⁵ Weysel Qeranî ji vî aliyê ve mînaka herî baş e. Misilman gelekî jê hez dikin. Li gelek cihan ziyaretgeh û gor jê re çê kirine. Ji bo agahiyên dîtir bnr. Ahmet Yaşar Ocak, *Veysel Karanî ve Uveysîlik*, Dergah Yayınları, İstanbul. 2009.

³⁶ Ocak, *Menâkıbnâmeler*, rr. 7-8.

3. Li vê cîhanê mirovê ku derheqê weliyan de bi başî bifikire û kar bike hem ji aliyê derûnî ve hem jî ji bo axiretê wê bê mizgînkirin.

Ev xalên ku li jorê hatin gotin di çêbûna welîtiyê de zêde zêde girîng in. Lê di çêbûna van xalan de têgeha herî girîng ji bo welîtiyê, “keramet” e. Ango serborî, çêbûn û belavbûna kerametên welî ne. Lewra ya dawîn û ya qewîn keramet e û di esasê xwe de tiştê ku wê welîtiyê bigihîne pileya herî bilind keramet bi xwe ye.³⁷

1.7. Têgeha Keramet û Menqebeyê di Tesewwufê de

Yek ji riyên veguhestina têgehên îrfanî di riwayetên pexşankî yên sofiyan de, hêmana menqebeyan e. Mijara menqebeyan heya sedsala duyem zêde nedihate berçav, lê ji sedsala sêyem heya nehem a hicrî hêdî hêdî her ku çû xurttir bû û sofiyan, bi taybet şêxan bala xwe dane ser wê. Êdî menqebe gihîşte astekê ku bû mijareke girîng a pirtûkan. "Berbelavbûna menqebeyan ji xwediyê menqebeyan zêdetir, vedigere ser menqebexwezan û kesên ku li pey menqebeyan digerin.

Bêjeya menqebe rayeka xwe ji bêjeya erebî ya "neqebe"yê (نقبة) werdigire. Pirjimara wê dibe “menaqîb” (مناقب). Wateya wê jî qalkirin, karê baş, pesn, xeberdan û pêkanîn e. Cara yekem di sedsala sêyem de di pirtûkên hedîsan de ji bo kiryarên eshabeyên Hz. Mihemed bi navê “Kîtabu'l-Menaqîb” hatiye bikaranîn. Piştî geşbûna Îslamê di sedsala çarem de menqebe ji bo kiryar, tevger û gotinên sofiyên navdar ve hatiye bikaranîn. Weke nimûne: Pirtûka Sulemî ya bi navê *Tabakatu's-Sûfiye*, pirtûka Hucvîrî ya bi navê *Keşfu'l-Mahcûb*, pirtûka Kuşeyrî ya bi navê *er-Rîsale* di vî warî de çend nimûne ne. Piştî sedsala pêncem bi vejîna terîqetên yekem ên weke Qadîrî û Rifa'î ve têgeha “keramet”ê jî tevî vê bûye. Weke nimûne: Piştî wefata pîrên van terîqetan Ebdilqadirê Geylanî û Ehmed er-Rifaî kerametên van weliyan hatine nivîsîn. Lewra êdî keramet bi menqebeyê re hemwate hatiye bikaranîn. Piştî vê di warê tesewwufê de nerîta nivîsandina menqebeyê dest pê kiriye. Bêjeya menqebeyê piştî sedsala şeşem di warê tesewwufî de ji bo pîrên terîqetan û sofiyan weke pirtûk hatiye nivîsandin. Ji bilî vê, navê menqebe weke “tezkîre” (‘Ettar, *Tezkîretu'l-Ewliya*), “reşahat” (Safi, *Reşahatu Ayni'l-Hayat*), “meqamat” (*Meqamatê Yûsiv Hemedanî*), “nefaxat” (Abdurehmanê Camî, *Nefaxatu'l-Uns*) bi awayên cuda

³⁷ Ocak, *Menâkıbnâmeler*, r. 8.

weke menqebeyan hatiye nivîsandin û heya roja me ya niha ev nerît berdewam kiriye.³⁸

Hebûna menqebeyan li nava kurdan bi tesewwufa ku bi Îslamê re çêbûye pêwendîdar e. Lewra rola kevneşopiya Îslamê gelekî li ser heye. Helbet, weke ku me di serî de jî gotibû, wexta me behsa tabûya welîtiyê kiribû me behsa beriya Îslamê, yanê serdema kevnare jî kiribû. Taybetmendiyên menqebeyên weliyan, weke cûreyeke wêjeyî, mijara bûyerên mîna mesel, efsane û destanan e. Ango di nava vê rêzê de menqebe, ya dawî ye. Ji ber vê ye ku di navbera menqebe û cûreyên din de hin taybetmendiyên hevpar û ciyawaz hene. Ango ev ciyawazî û wekhevî taybetmendiyên menqebeyan diyar dikin.

Wekî cûreyên din menqebe jî ji bûyeran pêk tên, lê mîna cûreyên din, ev cûre jî ji aliyê kesan ve tên nivîsîn û tomarkirin. Lê piştî bûye vegotin û bîra gelêrî. Jiyana rasteqîn a kesan mijara menqebeyan e û ji ber vê taybetiya xwe hinekî ji mesel û efsaneyan vediqete. Cih û maweya kesan diyar e. Lê ciyawaziyeke din jî ew e ku li gorî efsane û meselan, nîvepîroz e. Ji ber vê ferqa wê ya esasî ji mesel û efsaneyan vediqete.³⁹

Ji aliyê teşeyî ve menqebe ji mesel û efsaneyan kurttir e. Bi gelemperî qala kerametekê tê kirin. Ji xeynî vê, endîşeya wê ya wêjeyî tune ye.⁴⁰ Mirov dikare taybetmendiyên menqebeyan wilo rêz bike:

1. Lehengên menqebeyan rasteqîn û pîroz in.
2. Cih û zeman diyar e.
3. Ne çîroksazî yan jî bûyereke xwezayî ye, bawerî ew e ku rasteqîn e.
4. Nîvepîroz in û weke tabûyekê xwe didin qanehkirin.

³⁸ Haşim Şahin, “Menâkibnâme” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 29, rr., 112-114, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/menakibname>), (13.10.2019)

³⁹ Ocak, *Menâkibnâmeler*, rr. 32-33.

⁴⁰ Piraniya menqebeyan qala bûyereke tenê dikin. Ev bûyer di çarçoveya dînî û mîstîk de tê vegotin. Ji ber ku pirê caran naveroka wan dîdaktîk in, meriv pêrgî vegotineke ciwankariyê nayê.

5. Welî çî zindî bin, çî jî mirî bin menqebe têne nivîsîn.

6. Ji aliyê teşeyî ve vegotineke wan a kurt û xwerû heye.

Dema mirov bala xwe dide taybetmendiyên rêza menqebeyan, mirov tê digihîje ku aliyê wan ê civakî jî heye. Lewra hebûna menqebeyan bi xêra bawermendên xwe ye. Ji ber wê, tê wê wateyê ku ev civak an jî bawermendên civakê bi dezgehên xwe yên heyî wan diafirînin. Her wiha ji ber ku menqebeyên weliyan derûniya mirovan li nava atmosfereke mîstîk û veşartî dixemilîne gelek alîgiran ji xwe re çê dike.⁴¹

1.8. Nerîta Nivîsandina Menqebeyan Li Ser Weliyan

Nerîta menqebenivîsîn û tezkerenivîsîna li ser weliyan yek ji nerîta herî kevnar ên ehlên terîqetan e. Cudahiya di navbera menqebe û tezkereyan de ev e ku menqebenamê balê dikişîne ser jiyana kesayetî, meqama rûhanî û kerametên weliyekê/î taybet, lê tezkîre jiyana kesayetî, meqama rûhanî û kerametên weliyên cuda cuda vedibêje. Wer xuya ye ku berhema herî kevnar a di vî warî de ku niha li ber dest e pirtûka bi navê *Ewliya* ya Ibnê Ebî Dunya ye, piştî *Siyretu'l-Ewliya* ya Hekîmê Tirmizî heye ku di sedsala sêyem a hicrî de hatiye nivîsandin û weke berhema herî kevnar a li ser welîtiyê tê naskirin. Ji hemûyan kevnartir jî pirtûka *Hilyetu'l-Ewliya* ya Hafîz Ebû Neîmê Îsfahanî ye ku wek çavkaniya *Tezkiretu'l-Ewliya* ya 'Ettarê Nîşabûrî jî hatiye bikaranîn. Ev nerît di serdemên din de jî ji hêla mezinên terîqetan ve hatiye domandin. Wekî din, di vî warî de mirov dikare berhemên wek *Menaqibu's-Sofiyye* a Qutbedînê Ebû Muzeferê Mensûr b. Erdeşîrê Sinciyê Îbadiyê Mirozî (ss., 6.), *Nefahatu'l-Uns min Hezeratil-Quds* a Nuredîn Ebdurehmanê Camî (ss., 9.), *Mecalisu'l-Uşaq* a Emîr Kemaleddînê Huseynê Gazergahî (ss., 9.), *Semeratu'l-Quds min Şeceratu'l-Uns* a Mîrza Le'lbeygiyê Le'liyê Bedexşanî (ss., 10 û 11.), *Mecalisu'l-Muminîn* a Qazî Nûrullahê Şûsterî (ss., 11.), *Tezkiretu'l-Muheqiqîn* ango *Tezkerey Riyz el-Arifîn* a Riza Qulîxanê Hidayet (ss. 13.), *Sefînetu'l-Ewliya* ya Osmanzade Huseyîn Vassaf (ss., 14.) bi nav bike. Hebûna berhemên hanê

⁴¹ Ocak, *Menâkıbnâmeler*, rr. 33-34.

û nivîsandina wan di sedsalên cuda de nîşan dide ku nerîta menqebenivîsînê di nava sofiyên terîqetan de hertim berdewam bûye.⁴²

1.9. Cûreyên Menqebeyan

Menqebeyên heyî li ser du beşan tên dabeşkirin: Menqebeyên biyografîk û menqebenameyên berhevkirî.

Menqebeyên biyografîk: Berhemên menqebekî ne ku ji hêla kesên hevçaxên weliyên ku di manqebeyan de qala wan hatiye kirin, yan jî demeke kurt piştî wefata weliyan li heman deverê jiyane. Di van menqebeyan de "weli" bi xwe dikare di dema jiyana xwe de, jînenigariya xwe bi awayê kronolojîk binivîse, yan jî murîd û şopînerên wan, piştî mirina wan jiyân, keramet û meqamên wan ên rohanî binivîsin. Ev menqebe li gorî rastiyên dîrokî ne.⁴³

Menqebeyên berhevkirî: Ev celeb menqebename piştî ku demeke dirêj di ser wefata weliyan re derbas bûye, hatine nivîsandin. Murîd û şopînerên wan weliyan van menqebenameyan dinivîsin. Di van berheman de li gorî derfet û agahiyên heyî hewl tê dayîn ku bi çêkirina pêwendiyên kronolojîk di navbera agahiyan, nivîs yekdest bibe. Bi qasî hezkirina ji weliyan, nivîskar hin tiştan lê zêde dikin. Lewre menqebenameyên berhevkirî, li gorî ên biyografîk ji hêla dîrokî ve lawaz in. Tevî ku dîsa jî dikarin ji hêla dîrokî ve bêne bikaranîn.⁴⁴

Her wiha Yaşar Ocak bi awayekî din menqebenameyan ji hev cuda dike. Ocak menqebeyan li ser du hêlan, dabeş dike. Hêla yekem ew cure menqebename ne ku li gorî rastiyên dîrokî hatine nivîsandin: Beşeke mezin ji menqebenameyên weliyan li gorî bûyerên rastîna ên dîrokî ne.

Bûyerên amajepêkirî di van menqebeyan de ji hêla dem û cihên bûyeran ve zelal û eşkere ne. Îca ji ber ku yek ji armancên menqebeyan mezinkirina meqamê weliyan e, lewma rastiyên dîrokî yên hatine nivîsandin, bi awayekî hatine guherandin

⁴² Shahab Vali, "Negahi Be Motoone Mazhabiye Alaviyan – Baktashiyane Anatoli," *Neshriyeye Javidan Khrad*, Doreye Jadid, hej. 4, 2009. rr. 54-55.

⁴³ Ocak, *Menâkibnâmeler*, r. 39.

⁴⁴ *h.b.*, r. 39.

û weke menqebeyên biyografîk lê hatine zêdekirin. Dîsa jî jihevderxistina agahiyên dîrokî yên di nava van menqebeyan de karekî zêde dijwar nîne.

Hêla duyem: Menqebeyên xeyalî: Ev menqebe zêde ji hêla dîrokî ve cihê wan ê pêbaweriyê tune ye, lê ji hêla derûnnasî û civaknasiyê civakên serdema xwe ve têne nirxandin.⁴⁵ Ev hêl jî dikare li ser çend beşan bê nirxandin:

1. Menqebeyên ku koka xwe ji nirxên civakî digirin: Welî weke kesên herî nêzîk bi Xwedayê yekane, nirxên civakî yên devera ku lê dijîn temsîl dikin. Ev nirx bi şeklê herî baş di şexsê weliyan de hatine raberkirin. Bi vî awayî menqebeyên ku qala wan dikin, binemaya raberkirina van nirxan di xwe de dikemilînin û bi riya van nirxan di cîhanekê aram de li derdora kesayetiyê weliyan tê çêkirin. Ev cîhanek e ku civak arezûya wê dike. Ev menqebe ji hêla civaknasiyê ve pir bi kêrhatî ne.
2. Menqebeyên ku li ser bingegehên exlaqî hatine afirandin: Hinek menqebe ji bo vegotina hinek fezîletên weliyan ên exlaqî hatine nivîsandin. Ji ber ku welî wek kesên ku di nava civakê de ji hêla exlaqî ve gihîştine asta herî bilind, lewre tevahiya civaka xwe temsîl dike. Bi vî awayî bi vegotina fezîletên weliyan ên exlaqî, fezîletên civakê yên exlaqî tîne teswîrkirin. Ji ber ku ev menqebe xwedî hêlên hîndekariyê ne, lewma ji bo murîdên terîqetên weliyan, pir girîng in.
3. Menqebeyên propagandayî: Hin menqebe tu rastiyeke dîrokî di xwe de nahewînin û tenê xeyalên nivîskarên xwe raber dikin.⁴⁶ Armanca van

⁴⁵ Ocak, *Menâkibnâmeler*, r. 34.

⁴⁶ Li gundê ku ez lê dijîm (Mansûriyê/Mêrdîn) jî mîna vêya veguherîneke civakî ya dînî heye. Li gund mizgeftê heye ku berê dêra suryaniyan bûye, piştî salên 65an ev dêr ji aliyê gundiyan ve dibê mizgeft. Li kêleka mizgeftê ziyaretgehek heye navê wê Hemed Hekîm e. Ev nav gundiyan lê kiriye. Ji lew ra yê ku di vê ziyaretgehê de rehmet kiriye Hemed Hekîm e. Li gorî baweriya gundî û derdûorê Hemed Hekîm yekî pîroz bûye, xêr û şifa li ser mirovan belav kiriye yan jî hîn dike. Gundî û yên derûdorê li gorî vê qenaetê, qenaeta xwe pê tînin û diherin li vê ziyaretgehê radikevin û xêr û şifayê ji Hemed Hekîm dixwazin. Dema ku ez li Mêrdînê xwendekar bûm mamosteyê me yê zanîngehê xwest ku em di darsa wêjeya gelêrî de her yek ji me ji gundê xwe spartekekê gelêrî amade bike. Mamoste gotibû ku divê ev spartek li ser tiştêkî be ku bandoreke mezin li ser gundiyan kiribe. Yê min jî rasterast ev ziyaretgeh hate bîra min. Min got ez ê li ser vê bixebitim. Min bi çend kesan re li ser vê ziyaretgehê heypeyvîn kirin ku temenê wan li ser notî bû. Û min bi keşeyê Dêra Kırklarê Mor Kabriel Akyüz kir ku ew jî di warê xwe de di dîroka suryaniyan de pisporek e. Ji lew ra min çima berawirdineke wisa kir? Çunkî li gorî baweriya suryaniyên Mêrdînê Hemed Hekîm ne misilman e, yekî suryanî ye û navê wî jî Mor Osyo ye. Di zimanê suryanî de wateya bêjeya "osyo" hekîm, pizîşk e. Li gorî ku Gabriel radigihand, Mor Osyo 1600 sal berê

menqebeyan berbelavkirin û propagandaya terîqetên weliyên amajepêkirî ye. Xala ku divê bê destnîşankirin ev e ku bûyer û nivîsên ku di van menqebeyan de hene, ji ber ku pir têne xwendin û dubarekirin, lewma ji hêla murîdên wan ve wek rastî têne qebûlkin.⁴⁷



jiyaye û ji bo suryaniyan yekî pir pîroz bûye. Ji ber vî çendî, suryaniyan jê bawer dikir ku Mor Osyo şifa û xêrê belav dike.

⁴⁷ Ocak, *Menâkıbnâmeler*, r. 35.

BEŞA DUYEM

Weliyên Kurd û Menqebeyên Wan Di *Nefahatu'l-Unsê* De

2.1. Nûreddîn Ebdurehmanê Camî (1414-1492)

Navê wî yê eslî û dirêj Ebdurehman b. Nizamedîn Ehmed b. Camî ye. Leqeba wî Nûreddîn e. Bi navên Camî û Mewlana nav û deng daye. Ev nav mexlesên wî bûne.⁴⁸ Em ê navê wî weke berhema resen a pdf'yî Nûreddîn Ebdurrehmanê Camî bi kar bînin.

Li gorî salnameya hicrî ya di sala 817an û li gorî ya mîladî jî di sala 1414an de li herêma Xorasanê li bajarokê Camê ya Îranê ji dayîk bûye. Li gorî agahiyên spesîfîk di navbera bajarên Herat û Havalê de li bajarokê Xergirdê hatiye dinyayê. Lê dema mirov bala xwe dide paşnavê wî, mirov baş têdigihîje ku li bajarê Camê ji dayîk bûye.

Camî ji nifşê Mihemedê Şeybanî ye. Di nava malbateke dîndar de mezin bûye û malbata wî bi sedan alim perwerde kirine. Weke bavê wî Nîzameddîn Ehmed b. Mihemed jî di sala 1420an de li bajarokê Heratê yê Efxanistanê li medreseyên Nizamiyeyê dersdarî kiriye. Camî jî di van medreseyan de ders wergirtiye. Di van medreseyan de ji zaroktiya xwe ve bi zîrekîtiya xwe bala mamosteyên xwe kişandîye. Di destpêka perwerdehiya xwe de li ser pirtûka "*Muxteseru't-Telxîs*"ê xebitiye. Ev pirtûk jî li gorî temenê wî giran bûye. Ji ber vê çendê, pêşiya pêşîn pirtûkên medreseyê yên berê zû kuta kiriye ku bi vî awayî daye pêşiya hevalên xwe yên medreseyê. Ji ber vê jîrbûna wî mamosteyên wî pê şanaz bûne ku heya wê demê xwendekarekî wilo bi zîrek û xwedî şiyar peyda nebûye. Dûre ji alimên mîna Şîhabeddîn Cacermî û Qazîzade Rûmî dersên matematîkê wergirtiye. Di demên paş de ji ber jîrbûna xwe nav û dengê wî li Heratê belav dibe. Ilmên çaxa xwe baş xwendine

⁴⁸ Nûreddîn Ebdurehman Camî, *Nefahatu'l-Uns* (Evliya Menkıbeleri), Tercüme Şerh ve İlaveler: Mahmud L'amiî Çelebi, Medine Yayınları, İstanbul, 2007. r. 20.

û jê têr nebûye. Ango ji ilmê çaxa xwe qayil nebûye û xwestiye bêhtir tiştan fêr bibe.⁴⁹

Piştî ji alimên Neqşîbendî ji kesên mîna Mihemedê Parsa, Ubeydulahê Ehrar, Mewlana Faxredînê Turistanî, Ebû Nasirê Parsa, Şêx Behaudînê Omer, Celaledînê Puranî û Mihemed Esed perwerdehiyeke baş wergirtiye. Van kesayetan bandoreke mezin li ser fêmbariya Camî dikin û ji ber ku van kesayetan ehlên terîqeta Neqşîbendiyê ne ew jî bi xwe dûre dibe Neqşîbendî. Her çî qas li dû terîqeta Neqşîbendîtiyê çûbe jî tu carî mirîd nedane pey xwe. Di vê mijarê de bandora alimên mezin ên wek Êbnû'l-'Erebî û Êbnî Faris hebûye ku ew ne ehlê terîqetan bûne, belkî ehlê mutasewifê bûne.⁵⁰

Camî di 13ê muherema hicrî ya sala 898an de, li gorî a mîladî 4ê mijdara sala 1492yan de nexweş dikeve û piştî heft rojan di roja Înê de, di 81 saliya xwe de, dema ku azana nîvrojê tê xwendin, bi guhdarîkirina Quranê çûye ber rehma Xwedê. Di dema rehmeta wî de bi sedan alimên mîna Sultan Huseyîn Bayqera, Elîşêr Newayî û hwd. beşdarî şîna wî bûne. Piştî vê merasimê Camî li bal mamosteyê xwe Se'dudîn Kaşxerî tê veşartin. Piştî wefata Camî bi hezaran kes tîn û gora wî ziyaret dikin. Gora wî li bakurê rojavayê bajarê Heratê ji xelkê derdorê re bûye ziyaretgeh.⁵¹ Li ser gora wî sê risteyên wilo tîne nivîsîn:

Kesê mayînde encaq Xwedê Teala ye.

Her tiştê ser rûyê erdê fanî/demkî ye.

*Bi tenê kesê xwedî kerem û mayînde Xwedayê me ye.*⁵²

Camî wek "Xatemu'ş-Şu'erayê Faris" tê naskirin. Yanê tamamkerê şairên farisan bûye. Ev nasnav ji ber vê lê hatiye kirin ku li gorî gelek kesan piştî wî êdî kesekî wisa di warê edebiyata farisî de derneketiye ku asta zanist û helbest û şiyana Camî derbas bike. Camî navdarekî di asta cîhanê de bûye ku ji Stembolê heya başûrê

⁴⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 20-21.

⁵⁰ *h.b.*, rr. 23-24.

⁵¹ Ömer Okumuş, "Câmî, Abdurrahman" *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 7, rr. 94-99, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/cami-abdurrahman>), (14.10.2019)

⁵² Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 38.

Hindistanê û Mawerau'n-Nehr û Semerqendê xwedî û nav û dengekî giran bû. Ehlên ilm û medreseyan û her wiha zanyaran gelekî rêz lê digirt. Li nik dîndar û sofîyan û pisporên terîqetan xwedî gotin û destvekirî bû. Desthilatdar û hakim û wezîran rêz lê digirt. Ew li navenda desthilatdariya Xorasana wê demê, ku kozgeha edeb û pîşe û zanistî bû, lewra li Heratê dijiya. Lê pêwendiyên wî li gel desthilatdarên osmanî û Îran û Hindistanê di asta herî bilind û baş de bûye. Gelek şah û wezîr û wekîlan nameyên rêzgirtinê ji hizûra wî re dişandin û wî jî bersiva wan dida. Lê tu carî şelaqiya desthilatdaran nekiriye.

Piştî sefera Camî ya li Xorasanê ango Mawerau'n-Nehrê, sefera wî ya herî dawîn ku ji hêla vekolînên li ser jiyana û fikrên wî ve girîng e, sefera wî ya li Hicazê bû. Ev ger ku di navbera salên 851-877an de pêk hatiye, ji Medain, Kurdistanê bigire heya Kerbela û Şam û Heleb û Tebrîzê geriyaye û piştî vegeriya Xorasanê. Di Dîwana Camî de gelek amajeyên wî bi vê gerê tene dîtin ku xweşî û nexweşiyên wî di gerê de digire ber xwe.⁵³

2.2. Kurdbûna Camî

Çawa ku hemû tezkerenivîs û vekolerên ku li ser Camî nivîsîne, Ebdurehmanê Camî ji koka xwe ji derdora Îsfahanê ye û bapîrê wî Şemseddîn Mihemmed ji ber êrişa tirkên koçberî hêla Xorasanê bûye. Ji aliyê din ve em dizanin ku Îsfahan û Daran ji wan herêman bûne ku kurd lê jiyane û me jî weliyên ji Daranê li vê xebata xwe zêde kirine. Lewra niha teqez em dikarin bibêjin ku koka Ebdurehmanê Camî ji herêmekê bûye ku niştecihên wira kurd bûne.

Her wiha li gorî vekoleran, Camî di sefera xwe ya ku wek Sefera Hicazê tê naskirin, serdana Kurdistanê jî kiriye û li bajarê kurdan jî geriyaye. Em di vekolîna xwe de rastî tiştên balkêş hatin. Çawa ku tê zanîn mîrekîtiya Erdelanê yek ji mîrekîtiyên kurdan a herî navdar e ku bi taybetî ji ber dîroknivîs û edîbên xwe zêde tê naskirin û navenda wê jî vê dawiyê bajarê Sineyê bûye. Gundê bi navê Palenganê ku niha ser bi bajarê Kamyaranê li başûrê Sineyê dimîne, bi sedan salan navend û paytexta kurdên erdelanî bûye. Hin mela û vekolerên wê herêmekê ji me re gotin ku

⁵³ Ömer Okumuş, "Câmî, Abdurrahman" *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 7, rr. 94-99, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/cami-abdurrahman>), (14.10.2019)

Camî di nava wê sefera xwe de demeke dirêj li Palenganê maye, li wira mamostetî kiriye û ders daye zarokên kurd û bi qasî 70 feqî û şagirdên wî hebûne. Lê me li ser vê yekê tu belgeyeke nivîskî bi dest nexist ku wek referans nîşan bidin.

Xaleke din a balkêş jî ev e ku Camî di destpêka berhema xwe ya bi navê *Salaman û Absalê* de , ku me bi arîkariya hevalan ji çavkaniyên farişî wergirt, gelek caran peyva "kurd" di nava malikên wî yên destpêkê de derbas dibe. Di destpêka *Salaman û Absalê* de piştî hemd û medh û senaya Xwedê, hikayeta kesekî kurd dibêje ku ji deştê diçe bajêr û ji bo ku di nava qerebalixiya bajêr de wenda nebe, kundirekî bi piyê xwe ve girê dide û piştê yekî fêlbaz tê û ji bo ku wî bixapîne di xewê de kundir ji piyê wî vedike û bi piyê xwe ve dike û dema kurd ji xewê radibe şaş û matmayî dimîne û gazî Xwedê dike û dibêje ez kurdê bê sermaye me û hew. Û di dawiyê de ji Xwedê dixwaze ku wî bike Camî. Ev hikayet û mesele di malikên 20 heya 42yan de derbas dibe. Di vê helbestê de wiha dibêje:⁵⁴

Ey Xweda ew kurdê rût û jar im ez
Nav hemû kurdan nivîş û xar im ez
Tu ji fezla xwe bidey min rewneqek
Bik ji lutfa xwe vî derdî merhemek
Ta ji her jeng û qirêjê safî bim
Ez ji bo ehlê dilan wek şafî bim
Camekî xweş ger bidî kêfxweş dibim
Cer bi cer ger çênebe bi fincan dê dim
Ger ji min ev car kerem kî wek bedî'i
Mîrê her du aleman dê kim şefî'i⁵⁵

⁵⁴ Mawlana Abdu'r-Rahman Jami, *Salaman we Absal*, Sharafaddin & Sons, Bombay, rr., 3-4.

⁵⁵ ای خدا آن کرد بی سرمایه ام
از همه کردان فروتر پایه ام
ده ز فضلت رونقی این کرد را
کن ز لطفت راقی این درد را
تا زهر آلاشی صافی شوم
اهل دل را شربت شافی شوم
جامی آسا یک به یک را شادکام
خم خم ار نبود رسانم جام جام
ور به من این مکرمت باشد بدیع
خواجه کونین را آرم شفیع

Di gelek berhem û şîroveyên ku li ser *Salaman û Absala* Camî hatine nivîsandin, qet qala van malikan nayê kirin.

2.3. Berhemên Camî

Nûreddîn Ebdurehmanê Camî arifekî pir mezin bûye û gelek desthilatdaran rêz li wî girtine, weke mînak li Xorasanê Siltan Huseynê Bayqera ji nifşa Têmûr û wezîrê wî yê xwende Emîr Elîşêr gelekî hurmet ji Camî re kirine û heta bigire murîdê wî jî bûne. Li Azerbeycanê Emîr Hesên Beg û siltan Yaqûbê Aqqoyûnlû, li Asyaya Biçûk jî siltan Mihemedê Fatih û kurê wî siltan Bayezîdê rêz û hurmeteke zêde ji Camî re girtine û pêwendiya wan bi wî re hebûye û Camî gelek berhemên xwe pêşkêşî wan kirine û ji bo wan nivîsîne. Lê qet helwesta xwe ya tesewwufê xera nekiriye.

Li gorî gotinên tezkerenivîsan Camî piraniya jiyana xwe daniye ser rîya nivîs, werger û helbestan û çawa ku tê gotin, hejmara berhemên wî ji pênciyê zêdetir in. Berhema wî ya herî navdar *Nefehatu'l-Uns* e ku tê de qala jiyan û menqebeyên pênc sed û heştê û du kesayetên navdar ên ewliya û jinên sofî kiriye. Her wiha *Silsiletu'z-Zehab*, *Salaman û Absal*, *Tuhfetu'l-Ehrrar*, *Yûsif û Zulêyxa*, *Leyla û Mecnûn*, *Neqdu'n-Nusûs*, *Dîwan û Beharistan* berhemên wî yên din in ku gelekî bi nav û deng dane.⁵⁶

Camî di dîwanên xwe de weke “*Diwanu'l-Camî*” bi kar aniye. Yek ji van dîwanan di sala 1479an de, yek di 1480yê de û ya sêyem jî 1481ê de du salan beriya ku here rehmetê nivîsiye. Navê dîwana wî ya yekem ku di ciwaniya xwe de nivîsiye, *Fatihatu'ş-Şebab* (*destpêka ciwaniyê*) e. Di vê dîwanê de helbestên Camî cih digirin. Navê ya duyem ku di temenê xwe yê navsere de nivîsiye *Wasitetu'l-Îqd* (*navsereya jiyanê*) e. Navê ya sêyem jî ku di dawiya temenê xwe de nivîsiye *Xatimetu'l-Heyat* (*dawiya jiyanê*) e. Di van dîwanên wî de helbestên herikbar hene. Her wiha menzûmeyên wî yên evîndarî û mijarên wehdetu'l-wicûdê jî hene.⁵⁷

⁵⁶ Ömer Okumuş, “*Câmî, Abdurrahman*” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 7, rr. 94-99, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/cami-abdurrahman>), 14.10.2019

⁵⁷ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 33-34.

Mesnewiyên Camî ji aliyê naverokê ve dişibin dîwanên wî. Heft mesnewiyên wî di bin sernavê berhema wî ya bi navê “*Heft Ewreng*” (*heft stêrk*) de têne berhevkerin. Ev mesnewî dişibin berhema Nîzamî ya bi navê “*Penc Genc*”.

Berhema xwe ya bi navê “*Silsiletu’z-Zehab*” (Xeureka Zêrîn) di sala 1485an de nivîsiye. Ev berhem ji sê lînûsk û 7200 malikan pêk tê. Di lînûska yekem de eqîdeyên Suniyan, di lînûska duyem de evîndariya heqîqî û mecazî û di ya sêyem de jî pêkenokên bijîşk û desthilatdaran cih digirin. Camî ji ber van pêkenokan tûşî tehdîdan hatiye.

Camî dildarê *Ewladên Resûl*, yanî Ehlê Beytê bûye. Ji ber vê pesnê Hz. Elî û zarokên wî daye û dijmin ji qehran teqandiye, lê ji suniyên Xorasanê jî tirsiyaye ku zêde ceger nekiriye pesnê Elî û zarokên wî bide. Ji ber vê şîiyên Bexdayê êrîşî wî kirine.

Berhema wî ya çarem ku weke menzûm hatiye nivîsandin *Salaman û Absal* e. Ev jî bi awayê mesnewiyê hatiye nivîsîn, mijara xwe ji wêjeya hermetîkî wergirtiye. Bi vê berhemê xwe li ser alimên Îslamê yên mîna Îbni Sîna, Faxredînê Razî, Nasîredînê Tûsî dixe û heya Huneyn b. Îshaq dihere. Lewra bi ilmê xwe wan di nîviya rê de dihêle, û wan li pey xwe dihêle.

Tuhfetu’l-Ehrrar nezîreyek e ku li ser berhema bi navê *Metleu’l-Enwar* a Emîrxosrew Dihlewî hatiye nivîsandin. Ev berhem ji bîst gotaran pêk tê. Di gotara dawî de şîretan li kurê xwe Ziyaeddîn dike.

Subhetu’l-Ebrar berhemeke Camî ya din e ku tê wateya zikr, dua û şîretên arifan. Ji aliyê naverokê ve dişibe *Tuhfetu’l-Ehrrarê*. *Yûsif û Zuleyxa* mesnewiya Camî ya herî xweş e. *Leyla û Mecnûn* jî bi vî awayî nivîsiye. *Xirednameyê Îskenderî* dişibe *Îskendername* ya Nizamî. *Beharistan* dişibe *Gulistan* a Se’diyê Şîrazî. *Risaleyi Tercumeyi Kelemati Qudsiye* yan jî *Nesru’l-Elî* wergera gotinên Hz. Elî ne. *Munşeat* yan jî *Ruqeatî Kafiye* ji nameyên Camî pêk tê. *Fewaêdu’z-Ziyaiye fi Şerhi’l-Kafiye* ji bo kurê xwe Ziyaeddîn Yûsif nivîsiye ku di medreseyên Îslamê de weke pirtûkeke serwayê ya rêziman hatiye xwendin. Derbareyê muemayan de jî sê rîsale û şerha *Hîlelî Muhtaraza* nivîsiye. Vana ev in:

- a) *Risale fi'l-Erûz*
- b) *Risale der Îlmî Kafîye*
- c) *Tencîsu'l-Luxat yan jî Risaleyê Tecnîs*
- d) *Risale fi'l-Mûsîqî*

Tefsîra Quranê heya Sûreya 22yem a Beqereyê kiriye. Berhema wî ya bi navê *Şewahidu'n-Nubuwwa* di sala 1876an de hatiye çapkirin.⁵⁸

2.4. Berhemên Din

Berhemên Camî yên ku bi awayê menzûm û nivmenzûm nivîsîne, hema hema temamê wan ji mijarên tesewwufî, hîkemî û exlaqî pêk tên.

Soxenanê Xacê Mohemed Parsa ji hin berhemên Mihemedê Parsa (k.d., 1419) hatiye wergirtin, lewra şîroveya gotinên Parsa ne. *Rîsaleyî Terîqî Tevecuhi Xacêgan* yan jî *Rîsalêyî der Şerayiti Zîkr* berhemeke Camî ye ku ji rîsaleyên dînî pêk tê. *Menaqêbê Şêyxu'l-Îslam Xacê Ebdulahê Ensarî* ji menqebeyên Şêyxu'l-Îslam pêk tê. *Rîsaletu'd-Durretul Faxir* yan jî *Rîsale fi't-Tesewwuf we Ehlihî we Tehqîqî Mezhebêhim* ji mijarên tesewwufî pêk tên. *Lewayih*, ev berhem ji berhemên *Fusûs* a Îbnu'l-'Erebî û *Nusûs* a Sedreddînê Konevî sûd wergirtiye ku rîsale qala wehdetu'l-wicûdê dike. Asta fêmbariya berhemê di asta gel de ye. Yanê bi hêsanî tê fêmkirin. *Rîsale fi'l-Wicûd* an jî *Rîsaleyî Vecîze der Tehqîqî ve Êsbatê Vacêbu'l-Vicûd* qala berhema Îbnu'l-'Erebî ya bi navê "*Wehdetu'l-Wicûd*"ê dike. *Şerhu Fusûsu'l-Hikem* şerha berhema Îbnu'l-'Erebî ya bi navê *Fusûsul Hikem* e. *Neqdu'n-Nusûs fi Şerhi Neqşi'l-Fusûs*, Îbnu'l-'Erebî kurteya vê berhema hanê weke bi navê *Neqşu'l-Fusûs* şîrove kiriye. Ev berhem di sala 1910an de li Stenbolê ji aliyê Îsmâîl Rasûhî ve hatiye çapkirin. *Eşî'etu'l-Leme'at* şerha berhema Fexredînê Iraqî ya bi navê *Leme'at* e. *Şerhu'l-Qesîdeti'l-Mîmiyye el-Hamriye* şerha qesîdeyên bi nav û deng Îbnî Faris (k. d.,1235) in. Ev berhem di sala 1891ê de hatiye çapkirin. *Şerhu'l-Qesîdeti't-Taiyye* şerha berhemeke din a Îbnu'l-Farûq e. *Rîsaliyî der Şerhi Rubaiyati kî Hat Fermûdent* derheqê wehdetu'l-wicûdê de ye ku şîroveya rûbaiyan e. Ev berhem di sala 1891ê de li Stenbolê hatiye çapkirin. *Rîsaleyi Şerhî Beyteyn Mesnewiyî Mewlewî*

⁵⁸ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 34-35.

şerha du malikên yekem ên *Mesnewiya Mewlana* ye. Ji bilî vê şerha wateya tesewwufî ya amûra muzîkê ya neyê ye. *Rîsaleyi Şerhi Xosrew Dehlewî* şerha malikeke Husrew Dehlewî (k. d., 1325) ye. *Şerhî Beytî Cendî Mesnewî*, qala hin ders û haletên rûhanî yên Mewlana dike.⁵⁹

2.5. Nefahatu'l-Uns û Girîngiya Wê

Nefahatu'l-Uns berhema herî girîng a Nûreddîn Ebdurehmanê Camî û pirtûka herî navdar a sedsala nehem a hicriya qemerî ye. Tehrîreke din e ji rûyê *Tebeqatu's-Sofiyye* ya Ensarî ye ku bi sûdwergirtina ji hin berhemên din ên wek *Keşfu'l-Mehcûb* a Hocwîrî û *Esraru't-Tewhîd* a Mihemed b. Munewer, *Menaqib* a Eflakî û *Misbahu'l-Hidayet* a Ezedînê Kaşî hatiye nivîsandin.⁶⁰

Di vê berhemê de qala jiyana piraniya arifan ji Hindistanê bigire heya Iraq û Misrê hatiye kirin û yekane çavkanî ye ku ji wê demê ve heya niha bê navber rastî pêşwazî û serdana vekoler û nivîskaran hatiye.

Camî, wilo dest bi berhema xwe *Nefahatu'l-Unsê* dike: *Şêxê îmam, alimê arif, Ebû Ebdurehmanê Mihemed bin Huseynê Sulemî En-Neşabûrî qeddesullah teala rûhehû li ser beyana seyr û ehwalê meşayixên terîqetê qeddesullah teala erwahehûm, ku kuberayên dîn û uzemayên ehlê yeqîn in û cami' in di navbera ilmên zahir û ilmên batin de, pirtûkek nivîsiye û navê wê daniye Tebeqatu's-Sofiyye.*⁶¹ Sulemî di vê berhemê de welî û murîdên wan dabeşî pênc tebeqeyan kirine û di heman demê de bûye hosteyê wan, arîkariya tehsîla wan kiriye. Di her tebeqeyê de bîst şêx û alim bi cih kirine. Li gorî meqamên wan peyvên wan ên pîroz, tevgerên wan ên xweş ên ku serboriya wan a ilmî û haletî nîşan dike, şîrove dike. Sulemî, bi ilmê xwe gelek tişt li *Nefahatu'l-Unsê* zêde kirine. Wegera *Nefahatu'l-Unsê* di çar merheleyan de pêk hatiye: Merhaleya yekem berhema Sulemî ya bi navê *Tebeqat es-Sufiyye* ye. Merheleya duyem: Herewî hin tişt ji devok û zaravayê Heratê wergerandine û tevlî berhema Sulemî kirine.⁶² Merheleya sêyem: Camî dema ku

⁵⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 36.

⁶⁰ Ahmad Khatami, *Vijegihaye Zabaniye Jami Dar Nafahat-ol Ons*, Majalleye Daneshkadeye Adabiyat Va Olume Ensaniye Daneshgahe Tehran. Doreye 58, hej. 4. 2014. r. 44.

⁶¹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 42.

⁶² Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 43.

berhemên mîna Sulemî û Herewî ji nû ve analîz kirine, tevî *Nefahatu'l-Unsê* kirine. Camî, weliyên heya dema xwe di berhema xwe de bi cih kiriye, lê hin ehlê tesewwufê tevî berhema xwe nekirine. Mirov dikare berhema *Nefahatu'l-Unsê* wilo destnîşan bike:

- a) Beşa destpêkê ya berhemê ji destpêkeke berfireh pêk tê.
- b) Di tevahiya berhemê de 610 menqebe û weliyên wan û 34 sofiyên jin cih digirin. Lê di wergera wê ya tirkî de Mehmûd Lamiî Çelebî beşeke bi navê Anadolu Velileri (Weliyên Anatolyayê) bi qasî neh weliyên tirk lê zêde kirine. Di vê berhemê de tişteki balkêş ew e ku di dawiya berhemê de cih daye sîh û çar weliyên jin ku yek ji wan kurd e.
- c) Camî, dema ku ji berhema Herewî sûd wergirtiye, têgehên mîna tewhîd, merîfet, tesewwuf, heqîqet, dua û niyazan tevî berhema xwe nekirine.
- d) Di dawiya berhemê de beşa jinên welî, zahîde û sûfiye cih digire.
- e) Her çi qas ji berhema Ferîduddîn 'Ettar sûd wernegirtibe jî ji çavkaniyên cûrbecûr sûd wergirtiye.
- f) Dema ku Camî behsa weliyan kiriye li gorî kronolojiyê rêz nekirine. Bi gotineke din, şêx û ewliya li gorî boçûnên tesewwufî, terîqet û herêman dabeş kiriye. Ji ber vê *Nefahatu'l-Uns* berhemeke huwiyeta dîroka tesewwufê ye.
- g) Hucwîrî di berhema xwe ya bi navê *Keşfu'l-Mehcûbê* de behsa sofiyên dema xwe kiriye.
- h) Serboriyên jiyana sofiyên terîqeta Çiştîyan.
- i) Herewî û derdora wî, ango hoste, murîd û hemdemên wî.
- j) Ebdurehmanê Camî li ser şêxên Neqşîbendî agahiyên biqîmet dane û Camî bi xwe Neqşîbendî ye.
- k) Camî behsa terîqeta Suhrewerdî û peyrewên wê kiriye.
- l) Behsa peyrewên terîqeta Kubrewîye kiriye.
- m) Behsa Mewlana û derdora wî ango behsa Mewlewîtiyê kiriye.
- n) Behsa weliyên terîqetên Zeynuddînî û Zeyniye.
- o) Behsa şêxên Xelwetiyê kiriye.

- p) Behsa terîqetên Ebdilqadirê Geylanî û Qadiriyan û peyrewên wan kiriye.
- q) Behsa Îbnu'l-'Erebî, derdor û murîdên wî kiriye.
- r) Herî dawî behsa alim û arifên serbixwe yên mîna Rûzbêhanê Beqlî, Halebî, 'Ettar û Xezalî kiriye.⁶³

2.6. Nefahatu'l-Uns û Tebeqatu's-Sofiyye

Piraniya çavkaniyan dibêjin ku *Nefahatu'l-Uns* berhema herî girîng a Nûredîn Ebdurehmanê Camî ji rûyê *Tebeqatu's-Sofiyye* ya Ensarî hatiye nivîsandin.⁶⁴ Ji ber vê yekê pêwîst e em li vir hinekî qala berhema hanê jî bikin bê kanî çî ne.

Tebeqatu's-Sofiyye ya Xace Ebdullahê Ensarî li ser jiyan û gotinên li ser şêxên tesewwufê hatiye nivîsandin. *Tebeqatu's-Sofiyye* yek ji berhemên kevnar ên farisî ye ku di sedsala pêncem a hicrî de li Heratê hatiye nivîsandin. Ev pirtûk encam û berhema axaftinên Xace Ebdullahê Ensarî di civînan de ye ku ji hêla şagirdekî wî ve hatiye nivîsandin.⁶⁵

Berhemên wek *Tebeqatu's-Sufiyye*, *Keşfu'l-Esrar*, *Uddetu'l-Ebrar* û *Nefahatu'l-Uns* bi devoka Heratê hatine nivîsandin û di hin waran de di navbera wan û berhemên din ên farisî de cudahî heye.⁶⁶

Tebeqatu's-Sofiyye ya Ensarî, *Tezkiretu'l-Ewliya* ya 'Ettar û *Nefahatu'l-Uns* a Camî çavkaniyên herî girîng di warê tesewwufê de ne ku di warê şêwaza gotinên xwe xwedî vegotinên hevbeş in. Her wiha di bin bandora fikr, bawer û atmosfera serdema nivîskarên xwe de mane. Li ser hin beşên taybet ên meşayixan sekinîne.⁶⁷

⁶³ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 44-45.

⁶⁴ Ahmad Khatamî, *Vijegihaye Zabaniye Jami Dar Nafahat-ol Ons*, r. 44.

⁶⁵ Mahboobe Shamshirgarha, Bozorg Bigdeli Said, Mohsen Abolghasemi, "Barrasiye Taasire Zabane Arabi dar Tabaghate Sofiyeye Ansari", *Faslnameyeh Jostarhaye Zabani*, Doreye 5, hej. 1, 2014. r. 128.

⁶⁶ Mahboobe Shamshirgarha, Bozorg Bigdeli Said, Mohsen Abolghasemi, "Karborde Zemayere Shaxsi Dar Tabaghate Sofiyeye Khaje Abdollahe Ansari Ve Gooyeshe Kohane Harat", *Domahnameyeh Jostarhaye Zabani*, Doreye 5, hej. 3, 2014. r. 102.

⁶⁷ Hakimeh Daneshvar, Mohammad Taghavi, Maryam Saehiniha, *Barrasiye Tetbighiye Shaxsiyate Zon-Noon Dar Se Tezkaree (Tabaghat ol-Sofiyyeh, Tezkiret ol-Oliya Ve Nafahat ol-Ons)*, Adabiyate Erfani, 2016. r. 93.

Camî dibêje ku Ensarî di nivîsandina *Tebeqatu's-Sofiyyeyê* de wergera Ebdurehmanê Sulemî bi kar anîye û Ensarî hin nêrînên xwe û her wiha navên hin meşayixên ku di berhema Sulemî de nehatibûne, lê zêde kirine.⁶⁸

Helbet Ensarî bi xwe jî çend caran qala Sulemî û berhema wî kiriye, bi taybet gotiye ku Sulemî jî pirtûka xwe ji rûyê berhema Ebûbekirê Raziye Becelî nivîsiye û her navê hinek meşayixan di berhema xwe de neaniye.⁶⁹

2.7. Rola Weliyên Kurd di Tesewwufê de

Di dîroka tesewwufê de gelek bûyer û rûdanên cuda qewimîne û gelek terîqet û beşên cuda tê de peyda bûne û her yek li pey şopeke xwe ya taybet çûye. Du ji van terîqetan ên Qadirî û Neqşibendî bûn ku di demeke pir kurt de li gelek herêman belav bûn û gelek kes li dora wan kom bûn. Terîqeta Qadirî di sedsala duwazdehem de ji aliyê Şêx Îsmayîlê Qazanqayî (Weliyanî) li Kurdistanê belav bû. Hatina terîqeta Neqşibendî û belavbûna wê li Kurdistanê jî di destpêka sedsala sêzdehem de ji hêla mewlana Xalidê Neqşibendî ve pêk hat.⁷⁰ Piştî ku îslam bû dînê piraniya kurdan, tesewwuf jî derbasî nava wan bû. Ji firqeyên sofîyeyê du terîqetên Qadiriye û Neqşibendî di demeke pir kurt de li Kurdistanê berbelav bûn û li kêleka wan terîqeta Nimetullahiye jî li herêmên kurdan li Kirmaşanê berbelav bû.⁷¹

Li Kurdistanê du terîqetên Qadirî û Neqşibendî ji yê din zêdetir berbelav in û hema bibêje tevahiya Kurdistanê di bin bandora van her duyan de maye. Ji şopînerên terîqeta Neqşibendî re "sofî" û ji şopînerên terîqeta Qadirî re jî "derwîş" tê gotin.⁷²

Tevekulî di pirtûka xwe ya bi navê *Dîroka Tesewwufê di Kurdistanê de* firqe û mutesewwufên kurd ên bibandor û navdar ên sofî wiha rêz dike:

⁶⁸ Zabihollah Safa, *Tarikhe Adabiyat Dar Iran*, c. 2, weş. Neda, Tehran, rr. 912-913.

⁶⁹ Khaje Abdollah Ben Mohammad Ansari, *Tabaghat ol-Sofiye*, Kabol, rr. 472-473.

⁷⁰ Javanmardi Aliyeh, Nasrollah Poormohammadi Amlashi, "Naghsh Va Jaygahe Mashayekhe Tarighat Dar Tehevolate Ejtemaiye Tarikhe Moasere Kordestan. Pajooreshnameye Ejtemai Va Eghtesadi", *Pajooreshgahe Olume Ensani Va Motaleate Farhangi*, hej. 2, 2015. rr. 42-43.

⁷¹ Mohammad Raof Tavakoli, *Tarikhe Tasavof Dar Kordestan*, Tavakoli, Tehran, 2016. r. b.

⁷² Kamal Rohani, *Tarikhe Jamee Tasavofe Kordestan*. Samrand, Tehran, 2006. r. 120.

1. **Muhasibiye:** Ev firçe şopînerên Ebû Ebdullahê Haris b. Esedê Muhasibî ne. Muhasibî di sala 243 ya hicrî de wefat kiriye.
2. **Qusariye:** Şopînerên Ebû Salihê Hemdûn b. Ehmed b. Emareyê Qusar in ku rêça wî propagandaya melametê bûye û lewre wek Melametiye jî têne naskirin.
3. **Teyfûriye:** Hogirên Bayezîd Teyfûrê Bestamî ne. Bayezîdî dibêje min mala Xwedê tewaf dikir, dema gihîştim heq, min dît mal li dora min tewafê dike.
4. **Cuneydiye:** Peyrewên Ebu'l-Qasimê Cuneyd b. Mihemed in. Ew ji koka ji Nîhavendê ye û li Bexdayê nîştecih bûye. Xwarziyê arifê navdar Siriyê Seqetî bûye.
5. **Nûriye:** Dûajoyên Ebu'l-Hesen Ehmed b. Mihemed en-Nûrî ne. Ji tenêti û goşegiriyê dûr diçin û xelkê ber bi axaftin, danûstandin, bezl û bexşişê ve vedixwînin.
6. **Sehliye:** Li ser şopa Sehl b. Ebdullahê Testerî dimeşin û têkoşîna li dijî nefsa îsyankar, erka xwe dizanin.
7. **Hekîmiye:** Ji şopdarên Ebû Ebdullahê Mihemed b. Elî Hekîmê Tirmizî ku yek ji sofiyên navdar ên sedsala sêyem e.
8. **Xeraziye:** Li ser rêça Ebû Seîdê Xeraz ku arifê navdar ê sedsala sêyem bûye.
9. **Xefîfiye:** Şopînerên Ebû Ebdullahê Mihemed b. Xefif in.
10. **Seyariye:** Girêdayî Ebu'l-Ebbasê Seyarî ne.
11. **Rifaiye:** Li ser rêça Seyid Ehmedê Rifaî ne.
12. **Suhrewerdiye:** Damezirînerê vê terîqetê Şehabedînê Ebû Ehfz Emr b. Ebdullah e ku di meha receba 539ê qemerî beramberî 1145ê zayînî li herêma kurdnişîn a Suhrewerdê⁷³ ser bi bajarê Zencanê ji dayîk bûye.⁷⁴

Firçe û mutesewwufên kurd ên navdar ên ser bi Neqşîbendiyê:

1. **Binemaleya Nehriyeyê:** Nehrî ser bi Şemzînanê ye. Niha mezinê vê malbatê li Dizeya Tirgeverê ye. Mezinê wan hecî seyid Ebdullah

⁷³ Li gor Tevekulî navekî kurdî ye û tê wayeta kevirê sor.

⁷⁴ Mohammad Raof Tavakoli, *Tarikhe Tasavof Dar Kordestan*, rr. 77-82.

Efendiyê Geylanîzade bû ku di sala 136an a hicriya şemsî de li Êrmiyeyê çû ser dilovaniya Xwedê. Ew li Mekkeyê ji dayîk bûbû. Seyid Ebdullah Efendî kurdperwerekî navdar bû.

2. Binemaleya Şêx Burhan: Navenda wan di salên dawîn de ji bo gundê Xanqahê ya ser bi Bokanê hatibû veguhestin. Mezinê wê malbatê şêx Mihemed bû ku ew jî çûye ser dilovaniya xwe. Tê gotin ku wesiyet kiriye ku kesek neyê dewsa wî.

3. Binemaleya Tawîle: Navenda vê malbatê Tawîle ye ku li ser sînore Rojhilat û Başûr li herêma Hewramanê dimîne. Mezinê vê malbatê yê dawîn şêx Bihadîn bû.

4. Binemaleya Şêx Ubeydullah: Navenda vê malbatê Zeynûyê Şêxî ya Mihabadê bûye. Mezinê vê malbatê şêx Mihemed Sidîq bû.

5. Li Akre û Zirêbarê li Başûr du binemaleyên şêxên Neqşîbendî hene ku yek ji wan binemaleya **Şêx Ebduslamê Barzanî** ye ku di Şerê Cîhanê yê Yekem de kurên wî ji hêla tirkên osmanî ve hatin kuştin û ya din malbata di gundê Bocliyê de ye ku Şêx Bedî'ê kurê şêx Mihemed mezinê wan bû.

6. Binemaleya Şêx Mela Qadirê Çemparaw: Çemparaw gundekî li rojavayê Baneyê ye. Mezinê vê malbatê yê dawîn Şêx Ezedîn bû.

7. Binemaleya Dozxdereyê: Dozxdere gundekî li bakurê rojhilatê bajarê Seqizê ye. Mezinê vê malbatê şêx Ebdulqadir bû û piştî wî Hecî Şêx Bihaddîn hate dewsa wî.

8. Binemaleya Siyerî: Siyerî gundekî Başûr e. Mezinê vê malbatê Şêx Osman e.⁷⁵

Yek ji muese-wifên kurd ku roleke pir mezin di tesewwufê de listiye û gelekî navdar bûye, Suhrewerdî bûye. Ebdulhisên Zerînkûb di berhema xwe ya bi navê *Tesewufa Îranî di Riwangeha Wê ya Dîrokî de* wiha dibêje:

"Ji nava terîqetên ku piştî êrişa moxolan ji hêla îraniyan ve hatin hezkirin, Suhrewerdiye û Qelenderiye bûn. Damezirînerê terîqeta yekem (Suhrewerdiye) Umerê Suhrewerdî bû ku yek ji hevalên herî nêzîk ê Nasir xelîfeyê Ebasî bû. Wî

⁷⁵ *h.b.*, rr. 219-225.

hêza xwe ya li Îranê piştî ketina Bexdayê ji dest da. Hevaltiya di navbera Nasirê xelîfe û Suhrewerdî hew qasî xurt bû ku xelîfe ew wek serokê tevahiya xanqahan hîlbijart û wek sefirê xwe şande seraya siltanê moxolan.⁷⁶

Herwiha li Kurdistanê gelek kes jî dijî tesewwufê derdiketin, piraniya van kesan alim û zanyarên dînî bûn û dijberiyê tund nîşanî sofîyan didan. Ji her kesî zêdetir Mele Mihemedê Koyî alim û helbestvanê kurd ê navdar ê di sedsala 20an de bû ku bi her awayî dijîtiya xwe nîşan dide. Em ê wek mînak helbesteke wî ya ku li hember tesewwufê gotiye li vir bînin:

Heta şêxêk le Kurdistan bimênê

Umêdî zendeganî pê nemênê

Be keşkûl û suwal û feqr û zilet

Mehal e kakî xom teşkîlî dewlet

Lewra heta ku li Kurdistanê şêxek bimîne, tu hêviyê mirov ji bo jiyane namîne, kekê min bi keşkûl û parsê û feqr û ziletê dewlet çênabe.⁷⁷

2.8. Weliyên ji Daranê

Bajarê Daranê li ser welayeta Îsfahana Îranê ye. Ev bajarok li ser riyên Hemedan û Kirmanşahê ye. Li wira jî weke bajarên Hemedan û Kirmanşahê serjimara kurdan gelek e.

Daran navenda bajarê Fereydûnê ye. Ferîdûn jî navê padişahê Îranê yê kevnar e û hin kes dibêjin Kawayê Hesinkar ji wê herêmê ye. Li gundekî Daranê yê bi navê "Meşhed Kawe" gorek heye ku hin dîroknas dibêjin Kawa û zarokên wî di wira de hatin definkirin. Ev gund niha li ser bi navçeya Çadiganê ye.

Di serdema Sasaniyan de gelek gund û bajarên Daranê hebûne û Şapûrabad bajarê wê herêmê yê herî navdar bûye. Tê gotin ku Şapûrê Duyem ê Sasanî ev bajar ava kiriye. Di serdema Sefewîyan de herêma Daranê pir pêş ketiye.

⁷⁶ Abdolhosein Zarinkoob, *Tasavofe Irani Az Manzare Tarikhiye An*, Wer: Majdaddin Keyvani, 2004. r. 25.

⁷⁷ Tavakoli, *Tarikhe Tasavof Dar Kordestan*, rr. 40-41.

2.8.1. Ebû Suleymanê Daranî

Ji tebeqeya yekem a tesewwufê ye.⁷⁸ Mutesewwufekî kurd, niştecihê Daranê ye. Navê wî Ebdurehman b. Etiye b. Ensî bûye.⁷⁹

Li gundê Daran an jî Diriyê yê Dimaşkê Xwedê wî daye. Sofiyekî dereva Sûriyeyê ye. Bi eslê xwe ji Vasiyê ye. Di temenê xwe yê ciwan de tesewwuf nas kiriye û daye pey rêça tesewwufê. Bi taybetî pirê caran xwe birçî hiştiye da ku jiyaneke zuhdane ya tesewwufî bijî. Ji ber vê tevgera wî leqeba “bundaru’l-caiîn” (serkêşê birçiyar) lê hate kirin. Li Mekke û Bexdayê geriyaye û hevdîtin digel sofîyan pêk aniye. Di esasê xwe de gotinên wî yên derbareyê zuhdê sofîyê herî binavûdeng Ehmed b. Ebu’l-Hawarî neqil kiriye.

Pir li ser haletên “xewf-reca”⁸⁰ rawestiye ku li gorî fikr û ramanên wî yên tesewwufî pêwîstî bi vê heye ku însên pê re bijî û li gorî wî ev yek merhaleya yekem ya zuhdê ye. Li gorî Ebû Suleyman ê ku dev ji hiznê berde weke awayê ku dev ji arîkariya Xwedê berde tê hesibandin. Lewma divê meriv dilê xwe hînî ramînê, çavên xwe jî hînî hêşiran bike. Yê ku ji adetê derxe nikare vuslatê (pevgihan) pêk bîne.⁸¹ Li gorî Camî ku di pirtûka xwe de ji hinekan neqil kiriye, ew jî gundê Daranê ya li ser bajarê Şamê ye û şêxekî xwedî tecrûbe bûye. Di sala 830yê de li vî gundî çûye ber rehma Xwedê. Mamosteyê Ehmed b. Ebu’l-Hewarî bûye.⁸²

Menqebeyên li ser Ebû Suleyman Daranî:

Dema ku ji Ebû Suleymanê Daranî re gotine: “*Heqîqeta merîfetê çi ye?*” Daranî wilo bersiv daye: “Nebûna du miradan li herdu cîhanan e.” Daranî dîsa dibêje: “*Min*

⁷⁸ “Tebeqe” wek têgeheke zanistî ji aliyê alimên Îslamê ve hatiye çêkirin. “Tebeqe” bêjeyeke erebî ye. Tê watenyên qalika tiştêkî, tiştên ku li hev dikin, hevşengên hev, rewş, kom û hwd. Di çaxa yekem û duyem a Îslamê de alimên Îslamê li gorî erka mirovan ev têgeh ava kirine. Cara yekem têgehên mîna “sahabe”, “tabiîn” û “etbauttabiîn” hatiye bikaranîn. Bi gotineke din, di kevneşopiya Îslamê de cûreyeke payebilindiya sahabe, tabiîn, alim, edîb, helbestkar, sinetkar, sofî û ramangeran nîşan dide.

⁷⁹ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 70.

⁸⁰ Mirov hêviya xwe ji rehma xwedê nebire ev “reca” ye, di xwe de “çavenêrî”yê dihevine. Tiştê ku tirsê û hurmetê bi hev re îfade dike jî “xewf” e. Mirov xwe ji bûyerên heram ku ji aliye nefsê ve tê kirin biparêze, ev jî “xewf” e. Reca û xewf encam in.

⁸¹ Mustafa Kara, “*Ebû Süleyman ed-Daranî*” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 8, r. 485, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/darani>), (14.10.2019)

⁸² Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 170.

*di pirtûkekê de tiştêkî wilo xwendibû. Xwedayê dilovîn û dilovan wilo ferman daye; 'Kesê/a ku îdia dike û dibêje ez ji Xwedê hez dikim lê dema tarî dikeve erdê radikeve ew kes derewan dike.'*⁸³

Daranî pileya xwe ya pêveçûna tesewwufê wilo neqil dike: “Ez li Iraqê abid⁸⁴ bûm, li Şamê arif bûm.” “Gelek zeman çê dibin ku razên heqîqetê çil rojan li ser deriyê dilê min didin, lê heya ku du kesên adil ku ji kitêb û sunnetan pêk tên nebin şahidê rastiyê ez nahêlim ku ji derî derbas bibin.” “Çi te ji riya Xwedê bigire ew ê bêhizûriyê bide te, lewra ev hemû dijminahiya te dikin. Hilma ku tu belasebeb didî lewra tu Xwedê bi bîr nayînî û li bal Xwedê xeflet e. Dema ku dil tiştêkî winda dike yan jî digirî ruh dikene yanî dema dil dinyayê winda dike digirî. Ji ber vê, ji ber ku ruh Xwedê dibîne dikene.

Ehmed b. Ebu'l-Hewrarî ku xwendekarê wî bûye, li ser Daranî wilo dibêje: “Min ji Daranî re got, min li cihekî vala nimêj kir lê min zewq jê negirt. Wî got: “Tu dizanî gelo ji ber çi ye?” Min jê re got: “Ji ber ku kesek li wira tunebû.” Wî got: “Ji ber ku di dilê te de mexlûqatek derbas bûye vîna te lawaz e.”

Ebû Suleymanê Daranî bi xwe wilo qala xwe dike: “Zingara her tiştî heye, zingara ruhî ya dil têrbûn e. Di navbera Xwedê û ‘evdê wî de ya herî girîng muhasebeya nefîsê ye. Lewra ya diyarde ev e ku divê ‘evd zanibe ew nîmetên Xwedê li ku û çawa xerc bike.”⁸⁵

2.8.2. Dawid b. Ehmedê Daranî

Dawid b. Ehmedê Daranî birayê Ebû Suleymanê Daranî ye.⁸⁶ Welîyekî kurd ê Daranê bûye. Qabiliyeteke wî ya birêveberî ya bêhempa hebûye. Bi Ebû Suleymanê Daranî re gelek şêwr li dar xistine. Tevgera wî ya ilmî mîna birayê wî Ebû Suleyman bûye.

⁸³ *h.b.*, r. 171.

⁸⁴ Pileya bêjeya “abid”ê ji ya “arif”ê bilindtir e. Di nava literatûra tesewwufê de kesê ku taeta xwe dike lê zanebûna wî ya tesewwufî tuneye jê re “abid” tê gotin. Kesê ku xwedî îrfan/zanîn e jê re “arif” tê gotin.

⁸⁵ Camî, *Nefâhatu'l-Uns*, r. 171.

⁸⁶ Mustafa Kara, “Daranî” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 8, r. 485, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/darani>), 14.10.2019

Menqebeya li ser Dawid b. Ehmedê Daranî:

Ehmed b. Ebu'l-Hewrarî li ser Dawûd ku xwendekarê birayê xwe Ebû Suleyman bûye, wiha neqil dike: “*Min ji Dawid pirsî. Dilê ku ji deng û awazên xweş hez bike tu yê çi li ser bifikirî? Wî wilo gote min: “Ew dil lawaz û nexweş e, lazim e bê tedawîkirin.”*”⁸⁷

2.9. Weliyên ji Dînewerê

Dînewer li rojavayê Îranê li herêma Cibalê ye. Bi piranî navê wê weke Deynewer hatiye bikaranîn û ev bikaranîn çewt e. Navê wê yê rast Dînewer e. Niha ev bajar kavi bûye. Ji Kengaver û Kirmanşahê 45-48 kîlometreyan dûr e.

Dînewer b.z. di salên 305-64an de di dema Selûkiyan de hatiye avakirin. Di çavkaniyên suryaniyan de weke Dînehver derbas dibe. Di şerê Nîhavendê de dikeve bin hikmê dewleta Îslamê (642) û di dema Mûawiye (661-680) de bajar ji nû ve tê avakirin. Dema ku bajar tê avakirin navê Mahûl Kûfe li Dînewerê û herêma Cibalê tê kirin. Mixalif angaşt dikin ku bêjeya “mah” farisî ye û tê wateya bajarokê. Lê di esasê xwe de ne wilo ye û versiyoneke navê Medyayê ye. Nexasim navên ku ji aliyê wateyê ve nêzîkî wê ne hemû nêzîkî herêma Cibalê ne.

Bajarê Dînewerê di serdema Ebasî û Emewiyan de gelekî bi pêş ketiye. Ji Hemadanê biçûktir e, lê bajarekî gelekî birêkûpêk e. Rez, sûk û gelek avahiyên din bi awayekî xweş hatine avakirin. Di dema xelîfeyê Ebasiyan Muqtedir Billah (908-932) de tevlihevî çêdibe û bajar hinekî xerab dibe. Lewra mirêsa xwe ya berê winda dike. Piştî desthilatdariya Îslamê Dînewer dikeve bin hikma Têmûr. Ji ber zilma Têmûr ti avahiyeke saxlem di bajar de namîne. Ji wê çaxê ve heya niha bajar li ser hişê xwe ve nayê.

⁸⁷ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 171.

Gelek alim û zanyar li vî bajarî perwerde bûne. Di warê riweknasiyê de Ebû Henîfe ed-Dineverî, dîroknasê navdar Îbn Quteybe ed-Dînewerî û gelekên din ên mîna wan lê mezin dibin. Di warê tesewwufê de jî gelek alim perwerde dibin.⁸⁸

2.9.1. Mîmşadê Dînewerî

Ji aliyê tesewwufê ve di tebeqeya sêyem de cih digire. Hem arif e û hem jî zahid e. Ji xelîfeyên Cuneydê Bexdadî ye û di sala 298an a qemerî de wefat kiriye. Di *Tezkiretu'l-Ewliya* û *Nefahatu'l-Unsê* de qala wî hatiye kirin. 'Ettar bi van gotinan Mîmşadê Dînewerî dipesine: Sitûdeyê rical, rubûdeyê celal, sahibê dewleta zemaneyê, alîhîmetê yekane, mucerredbûyê ji kîneyan, şêxê heyamê, pîrê serdemê, bêhevtayê serdemê û hwd. Wer xuya ye Mihemedşah kurt bûye û ketiye şeklê Mumşad. Di serdema hikûmeta bihêz a Ebbasiyan de jiyaye û yek ji şêxên herî mezin ê serdema xwe bûye.

Ji sofiyên Kerramiyan bûye. Lewra hemû ehlên ji boçûna Keramiyan ji vî malbatê hatine. Ehlên Suhrewerdiyeyê jî, ku dûre derdikevin, ji vî boçûnê tên. Mîmşadê Dînewerî serkêşiya vî boçûnê kiriye.⁸⁹ Wekî din. Mîmşadê Dînewerî ji Iraqê û şêxekî mazin e û ji ciwanmerdan e. Lê bi eslê xwe weliyekî kurd ê Dînewerê bûye. Hevalê Baba Tahir e. Kerametên wî hebûne. Di serdema xwe de alimekî navdar bûye û bi navên el-Ulema û Miftahu'l-Mezheb nav û deng daye. Di warê fiqhê de heft tûlayên wî hebûne.⁹⁰ Rewş û jiyana wî bêhempa bûye. Bi Yehya Cella û şêxên navdar re sohbet kiriye. Hevdemê Cuneydê Bexdadî, Ruweyn û Nûrî bûye. Di sala 912an de çûye rehma Xwedê.

Menqebeyên li ser Mîmşadê Dînewerî:

Wî li ser xwe gotiye: "*Xwedê ji razên xwe neynikek daye arîfan. Arîf kengî li eynikê binihêrin wê Xwedê bibinin.*"

⁸⁸ Tahsin Yazıcı, "Dînever" *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 9, r. 356, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/dinever>), (14.10.2019)

⁸⁹ Salih Çift, "İlk Dönem Tasavvuf Klasikleri Tarafından İhmal Edilen Bir Zühd Hareketi: Kerrâmiyye", *Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, c. 17, hejmar: 2, 2008. r. 439-462.

⁹⁰ Osmânzâde Hüseyin Vassâf, *Sefîne-î Evliyâ*, Amadekar: Mehmet Akkuş-Ali Yılmaz, Kitabevi Yayınları, İstanbul. c. 2, 2015. r. 430.

Şêxu'l-Îslam: *“Di dilê mu'minan de meqamek heye. Kesek jê pêvtir nikare xwe bigihîne wê meqamê. Mu'min kengî bixwazin dikarin xwe bigihijînin wî meqamî.”*

Husrî: *“Ez duh bi şev fikirîm ku car caran ez bi xwe jî dikevim xeybê. Gelo rewşa murîd û feqiyên min çawan e. Heger di dilê dostên min de xofa Xwedê tunebûya ez ê serobino bibûma.”* Husrî di helbesteke xwe de li ser vê mînaekeke wilo dibêje:

*Min di çendîn xeyalên xwe de dilê xwe li ba kir
Çunkî di cemala te de ayîn e ev can, a te ye.⁹¹*

Mîmşad: *“Yên ku çil sal e li behîştê ne behîştê didin min. Ez bi tu awayî ne xwazgîne behîştê me.”*

Şêxu'l-Îslam: *“Dema mirov li ber Xwedê be, mirov bala xwe bide tişteki din ew dibe şirk. Xwedê ji Pêxember re gotiye: ‘Pêxember bi tiştên dîtbar re xwe nexapandiye.’⁹² Ya Resûlê Xwedê! Tu bibêjî Xwedê û dev ji wan berde.’⁹³ Ez tu carî bi armanca ku pirsekê ji jê re bibêjim neçûme balê. Ez tenê bi armanca ku lê guhdar bikim bi dilekî safî çûm balê. Erka mirov ew e ku bi tu awayî nebe mihtacê Xwedê.”*

Şêxu'l-Îslam: *“Riya Xwedê dûr û dirêj e. Nexasim ew destên te bigire, tu pê re sohbet bikî, sebir bikî û pê re wext derbas bikî gelekî dijwar e. Ji ber vê ew bi te re dibe dost. Lewra evd bi bîr, ruh, dil û laşê xwe hertim di emrê Xwedê de ye da ku hertim wî bi bîr bîne. Li ser vê Mumşad wilo gotiye: “Kî dostekî Xwedê înkâr bike cezaya wî yê herî biçûk ev e ku tiştên ku Xwedê dide dostên xwe nade wî.”* Rojekê li bal Mumşad bûm, min dît xurtek derbasî hundir bû. Destûr xwest derwîşan bike mêvanên xwe. Mumşad gotê, *‘Tu dikarî wilo mêvan bikî? Welhasil Mumşad qebûl nekir. Dema ku ew çû derwîşan jê re got, ‘Şêx Mumşad tişteki wiha nekiribû. Gelo çima wisa kir? Şêx jî wilo got: “Ev ê ku hat çend qirûş ketine destên wî xwe winda*

⁹¹ Feridüddin Attar, *Tezkiretü'l-Evliya*, Amd.: Süleyman Uludağ, İlim ve Kültür Yayınları, Bursa. 1984. rr. 642-3.

⁹² Sûreyê Necmê, Ayeta 17.

⁹³ Sûreyê Enamê, Ayeta 91.

kiriye. Ji ber vê dev ji derwîştîyê berdaye. Niha jî hatiye da ku tiştêkî bide derwîşan. Ango dixwaze dîsa bibe derwîş. Bi vî awayî nabe ku bibe derwîş.”

Şêx Ebû Ebdulah Tafi: “Mihemed b. Xefîf wilo digot, “Min şevêkê Mîmşad di xewa xwe de dît. Li ser piyan sekinîbû, destên xwe rakiribûn wilo digote Xwedê: Xwedayo. Ezman hatibû xwarê. Dûre ezman bû du parçe û rahişt Mîmşad.”⁹⁴

2.9.2. Ebû Ebbasê Dînewerî

Weliyekî kurd ê Dînewerê bûye. Kunyeta wî Ebu'l-Ebas e. Li ser jiyana wî û çawaniya xwendin, tesewwuf û irfana wî de agahiyên zêde li ber dest nînin. Tenê li hinek çavkaniyên li ser tesewwuf û irfanê û her wiha berhemên li ser dîroka Dînewerê de çend gotinên wî hatine vegotin.

Ebû Ebbas zarokî û xortaniya xwe li Dînewerê derbas kiriye û piştê ji Dînewerê çûye Nîşabûrê. Li Nîşabûrê jiyaye û şîret li xelkê wira kiriye. Piştê çûye Tirmizê.

Gelek gotinên Ebû Ebas hene ku di hin pirtûkan de qala wan hatiye kirin. Her wiha hin berhemên wî jî hebûne, wek mînak navê pirtûkeke wî *el-Qenaet* e. Bi kesên weke Yûsiv el-Huseyîn, Abdullah el-Harraz, Ebû Muhemmed el-Cerîrî û Ebu'l-Ebbas Êbn 'Eta re sohbet kiriye. Cuneydê Bexdadî nameyekê jê re dişîne û bi xêra vê nameyê hevdu nas kirine. Ebû Ebbas ehlê “futuwet”ê⁹⁵ ye. Li gorî şertê başbûnê samîyet û durustbûn e. Lewra kesên li gorî vana tevnegerin tu nirxê wan tune ye. hemdemên xwe gelekî ji ber van tiştan rexne kiriye. Heta welî û sofîyên wilo bi sextekariyê ve tewanbar kiriye.⁹⁶

Di warê sofîtiyê de di tebeqeya pêncem de cih digire. Navê wî yê din Ehmed b. Mihemed e. Bi Yûsif Mihemed re sohbet kiriye. Hemdemê Ebdulahê Xerazî, Cerîrî Êbn 'Eta û Ruweymî ye. Di warê tesewwufê de pispor bûye. Demekê hatiye

⁹⁴ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 231-233.

⁹⁵ Tê wateya kesê/a mîrxas, camêr û metirsiyar û hwd. Li gorî jêderên tesewwufê ev têgeh ji sedsala duyem pê ve sofîyan bi kar aniye. Bnr: Süleyman Uludağ, “Fütüvet”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 13, rr. 259-261.

⁹⁶ Erhan Yetik, “Dîneverî, Ebü'l Abbas” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 9, rr. 358-359, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/dineveri-ebul-abbas>), (14.10.2019)

Nîşabûrê û li wira di warê tesewwufî de we'z û nesîhet kirine. Dûre ji Nîşabûrê veqetiyaye hatiye Tirmizê. Xace Mihemed b. Hamid ku weliyekî navdar ê sed sala çarem û şagirdê Şêx Ebûbekirê Weraq bûye, dema ku dibihîze Ebû Ebbasê Dînewerî ber bi Tirmizê ve tê, tevî murîdên xwe diçe pêşwaziya wî. Dema ku Ebû Ebas nêzîk dibe, xace diçe simê hespê wî maç dike. Murîdên wî ji ber vê hereketa mamosteyê xwe aciz dibin û sedema vî karî jê dipirsin. Xace wilo dibersivîne: "Min bihîstiyê ku ew Xwedayê min pir baş perestiş dike."

Dûre ji Tirmizê çûye Semerqendê û di sala 951ê de li wira rehmet kiriye. Menqebeya li ser Ebû Ebas:

Ji Ebû Ebas dipirsin: *Te Xwedê bi çi nas kiriye? Dibêje: Bi tiştên ku min nas nedikirin.*

Ebû Ebbas: "*Min ji bilî Xwedê her tişt ji bîr dikir. Ez bi cezbeyê diketim. Ez bi vî awayî fena fîl-fena dibûm, lewra ez ji xwe ve diçûm.*"⁹⁷

2.9.3. Ebû Hesen Sayixê Dînewerî

Ji aliyê welîtiyê ve di tebeqeya sêyem de bûye.⁹⁸ Muşerefê xatir û esraran, muqbilê ekabir⁹⁹ û ebraran,¹⁰⁰ sefîneyê¹⁰¹ deryaya evînê, sekîneyê¹⁰² çiyayê sidqê, farixê ji kewnê,¹⁰³ Şêx Ebu'l-Hesen es-Saix li Misrê jiyaye û mezinekî ehlê tesewwufê û bêhempa bûye. Navê wî yê din Ehmed b. Sehl e. Yek ji mezintirîn şêxê Dînewerê ye. Li Misrê jiyaye û li wira di sala 942an de çûye rehmetê. Ew mamosteyê Şêx Ebu'l-Hesenê Karafî, Ebû Bekir ed-Dukkî û Ebû Osmanê Mexribî ye. Bi xwe jî şagirdê Ebû Caferê Saydalanî ye. Li gorî Sulemî ji sofîtiyê bêhtir guh daye zuhd û teqwayê. Li gorî wî rizgariya pirsgirêkên dinyayê encaq bi endîşekirina axîretê wê safî bibe. Divê mirov li arezûyên xwe miqate be yan na wê ew hest wî/wê têk bibe. Divê murîd du caran terka dinyayê bike. Pêşiyê wê dev ji zewq û nîmetan

⁹⁷ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 314.

⁹⁸ *h.b.*, r. 315.

⁹⁹ Mirovên mezin

¹⁰⁰ Mirovên qenc

¹⁰¹ Gemî

¹⁰² Sebr

¹⁰³ Dunya

berde dûre bi bi vî awayî wê ew kes qîmetê bibîne dema ew kes wilo qîmetê bibîne wê payebilindiya xwe veşêre da ku bi awayî tevî nava civakê bibe. Çunkî yê/ya ku bi awayê naskirî terka dinyayê bike ji veqera dinyayê zehmettir e.¹⁰⁴ Menqebeyên li ser Saixê Dînewerî:

Ebû Osman Maxrîbî: *“Ji Ebû Yeqûb Nahrecûrî bêhtir nûra Xwedê li ser wî hebû.”*

Ebû Cafer Seydelanî: *“Wî digot, ‘Divê mirov du caran gumana xwe ya vê dinyayê bibire. Dema tu cara yekem gumana xwe ji dinyayê bibirî wê bêhtir însan rêzê bidîne te. Tu yê bê dinyayê û di nava hêrs û hesûdiyê de bimînî. Helbet ku tu guh nedî van encaq amanceke te ya rewa çêbibe. Bila gunehê te yê ku tu destên xwe ji vê dinyayê bibirî ji ya ku tu li ser vê diyayê bimînî ne zêdetir be. Bila ‘emel û arezûyên te nekevin ber tebîeta xerabe. Heskirina te ya ligel wê, wê nefsa te bikuje. Yekî jê re gotiye gelo mirov ji kê re bibêje murîd?¹⁰⁵ Wî wilo bersiv daye: ‘Li ser vê cîhanê cihên me berfireh in, lê bi ya wan ev der teng e.’ Di berdewamiya gotina xwe de ayeta Xwedê bi bîr aniye: “Her çiqas ser rûyê erdê berfireh be jî ew pê qayîl nabin. Wijdana wan, ew têk birine. Lê dizanîbûn ku ji bilî Xwedê kesekî wan tuneye.”¹⁰⁶*

Ebû Osmanê Mexribî dibêje: *“Min ti kes ji Ebû Yaqûbê Nehrcorî nûranîtir û ji Ebu’l-Hesen es-Saix mezintir nedîtiye.”*

Mîmşadê Dînewerî dibêje: *“Min carekê li çolê dît ku Ebu’l-Hesen es-Saix nimêj dike û siya teyrekî ketiye ser serê wî, jê pirsîn bê ka sedem çi ye şahid ji xayibê girtiye, Ebu’l-Hesen got: Mirov çawa dikare ji sifetên ê ku wek wî be û yê ku wek wî nebe, îstidlal bike.”¹⁰⁷*

¹⁰⁴ Erhan Yetik, “Ebû’l-Hasan es-Sâîğ” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 10, r. 323, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/ebul-hasan-es-saig>), (14.10.2019)

¹⁰⁵ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 315.

¹⁰⁶ Sûreyê Tewbeyê, Ayeta 118.

¹⁰⁷ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 315.

2.9.4. Ebû Bekir Qisayê Dînewerî

Di Tebeqatu's-Sofiyyeyê de jî hatiye gotin ku Ebû Bekirê Qisayê Dînewerî ji Qohistana Iraqê bûye. Ebû Bekirê Qisayî xelkê Dînewerê nebûye, belkî çûye wira û li wira wek Dînewerî hatiye naskirin.

Ji bajarê Iraqê yê Qohistanê ye. Ji ber ku li Dînewerê jiyaye nasnavê wî Dînewerî bûye. Weliyekî kurd ê mezin bûye. Ew jî weke weliyên din ê Dînewerê bûye. Dostê wî yê yekem Cuneydê Bexdadî bûye. Bi gera xwe ya deran ve jî tê naskirin. Menqebeyên li ser Ebû Bekir Qisayî:

Cuneyd: *"Heger ne ji bo xatirê Ebû Bekir Qisayî bûya ez nedihatim Iraqê. Me gelek name ji hevdu re şandine. Min gelek pirs bi riya şandina nameyan jê re şandine, wî bersiva hemû nameyên min dida. Beriya ku here rehmetê hemû nameyên bal xwe şewitandiye. Dema xebera mirina wî ji min re hat, ez gelekî li ber ketim."*

Şêxu'l-Îslam: *"Cuneyd neditirsiya ku ew nameyan bigihîjin ber destên hinekên din. Tirsa wî ev bû ku name bigihîjin ber destê sofîyan û bi saya van nameyan li ser gel payebilindiyan bikin."*

Her wiha dibêje: *"Di nava hezar sofîyan de alimek bes e, guhdarî û zanîn jî heman tişt e. Nexasim a girîng ev e ku dilê wan têr bibe ne ku zimanên wan bilive."*

Şêx Ebu'l-Xeyr Esqelanî: *"Dema ku Ebû Bekir Qisayî radiket, ji ser sîngê wî dengê Quranê dihat."*¹⁰⁸

2.9.5. Ebû Bekir b. Dawûdê Dînewerî

Li Şamê jiyaye. Lê di dawiya temenê xwe vegeyriyaye Dînewerê. Lê bi eslê xwe weliyekî kurd ê Dînewerê bûye. Beşdarî sohbetên Îbn Cella bûye. Li ser jiyana wî agahî pir kêr in û di çavkaniyan de pir kêr qala wî hatiye kirin û jêderka zanyariyên li ser wî *Nefahatu'l-Uns a Camî* ye.

Menqebeyên li ser Ebû Bekir b. Dînewerî:

¹⁰⁸ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 272.

Ebû Bekir b. Dînewerî: *“Heger tiştên ku mirov dixwe helal be ji bo taetê hêzê dide mirov. Berovajî vê heger heram be jixwe tiştêkî ne durist e. Lewra mirov gunehkar dibe.”*

Li gorî riwayetan sed salan jiyaye. Di sala 961ê de rehmet kiriye.¹⁰⁹

2.9.6. Ebû Ebdulahê Dînewerî

Ji aliyê tesewwufî ve di tebeqeya pêncem de bûye. Navê wî yê din Mihemed b. Ebdilxaliq ed-Dînewerî ye. Welîyekî kurd ê Dînewerê bûye. Şêxekî navdar bûye. Ji aliyê debara jiyana xwe ve jî navdar bûye. Di civakê de ji aliyê ilimê ve yê herî safî bûye. Rêza wî ya li hember aliman zêde bûye. Hertim sohbetên wî bi peyrewên xwediyê ilmê re bûye. Gelek salan li Wadû'l-Qurayê maye. Dûre dîsa veqeriyaye Dînewerê û li wira dihere rehma Xwedê. Di Tebeqatê Sulemî de Şêxu'l-Îslam wilo behsa wî kiriye: Di dawîya temenê xwe de tê Wadû'l-Qurayê, li wira derbasî mizgeftêkê dibe. Dema ku diçe nava mizgeftê, kesên ku li mizgeftê bûne rabûne çûne. Ji lewra ew weke mêvan nepejirandine û xwarin jî nedanê. Wê şevê li wira ji birçînan miriye. Sibehê tî wî kefen dîkin û vedişêrin. Roja din dema ku cemaet tê mizgeftê dibînin ku kefen li ser mihrabê raxistî ye û li ser kefen, li ser kaxizekê wilo hatiye nivîsandin: *“Dostekî min hate bal we, we ew weke mêvan nepejirand, we nan nedayê û ji birçînan mir. Em kefenê we naxwazin.”*

Menqebeyên li ser Ebû Ebdulah:

Şêxu'l-Îslam: *“Ebû Ebdulah wilo digot: ‘Xwedê silavan dide feqîran. Çunkî di Quranê de wilo tê gotin, ‘Silava Xwedê li ser we be.’ Yazdeh rojan di keştiyê de ma, piçêkî be jî ba nehat, ‘ebayê xwe derdixist dida ber bayî da ku keştî bimeşe. Digot, ‘beriya ku arezûyên min zora min bibin, ez zora wan dibim.’ Dema ku biçûk bi mezinan re dipeyivin arîkariya Xwedê ji bo biçûkan e. Ev dike ku zarok jî zîrek bin. Ev ‘elametekê Xwedê ye. Heger mezin bi zarokan re nepeyivin, ‘elameta ehmeqî bêmejbûnê ye. Ebû Ebdulah ji hin heval û hogiran re wilo gotiye: ‘Bi cilên li ser sofîyên ku dibêjin em sofî ne nexapin. Heya ew dilên xwe paqij nekin, mesele safî nabe.’”*

¹⁰⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 355.

“Min ji murîdan re got, heya ku hûn dilê xwe perwerde nekin hûn nabin alim. Lewra min zahirperest fêrî xemilandina cilan nekirine. Yên ku wilo dikin Xwedê ji wan hez nake. Lê wan bi ya rastî nekir û xwe xemilandin. Ew diviyabû dilên xwe saft bikira ne ku li pey cisman biketa. Kesên ku çav li wan dikevin, pê dixapin hew ji wan a rast ev e. Lê kesên ku bi wan re dixapin dilên wan pir saft ye. Ebû Ebdulah careke din wilo gotiye: “Carekê ji caran ez li gerê bûm, zilameke nuqsan li ser lingekî xwe dimeşiya, min jê re got çî hewce ye ku tu digêrî? Çunkî arîkariya te ya gerê tune ye. Wî got, tu misilman î? Min got, erê. Wî ji Quranê ayeteke wilo xwend:¹¹⁰”Sond be, me ademî xwedanrûmet û rêzdar kirin û me ew ji bejahî û deryayê siwar kirin û me ew bi tiştên pak û xweş rizqdar kirin, me ew li ser gelek mexlûqatên xwe re çêtir girtine.”¹¹¹

2.10. Weliyên ji Hemedanê

Hemedan yek ji bajarên Îranê yê herî kevnar e û xwedî dîrokeke çend hezar salî ye. Berî hatina ariyan Hemedan navenda etnîka Kasiyan bûye. Ji bilî vê çend şaristaniyên kevnare lê dijîn: Med, Asûr, Împaratoriya Îskenderê Mezin, Sasanî û hwd.

Du hezar salan berî zayîne di encama hin bûyerên ku li Asyaya Navîn rû didin, hin veguhestin di nava qewmê arî de pêk hatin. Di encamê de du qebîleyên Îranî yên Med û Pers ku ji hêla zimên ve cudahiyên biçûk di navbera wan de hebûn, ber bi başûr ve diçin. Medan li herêmen başûrê rojhilatê Gola Êrmîyê di navbera Hemed û Tewrêzê de cih girtin û piştê heya Îsfehanê jî bi pêş ve çûn.

Bajarê Hemedanê li Îranê ye. Paytexta Împaratoriya Medan bûye. 500 salan berî zayîne Med û Persan şer kirine. Di encama şerî de Hemedan dikeve destê Persan. Piştê Pers li ser Hemedanê zal bûne. Piştî wê ketiye destê Sasaniyan. Dûre Sasanî û dewleta îslamê li Nihavendê şer dikin, li gorî salnameya hicrî di sala 645an de Hemedan dikeve destê dewleta Îslamê. Ji ber ku bandora îslamê gelekî lê hebûye, gelek alimên Îslamê tê de perwerde bûne ku yên herî navdar Êbnî Sîna û Baba Tahirê Uryan in. Baba Tahir weke kurd tê naskirin. Ewliya Çelebî di berhema xwe ya bi

¹¹⁰ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 424-425.

¹¹¹ Sûreya Îsrayê, Ayeta 70. r. 288.

navê *Seyhatnameyê* de dibêje ku li bajarê Hemedanê kurd û tirkmen bi hev re dijîn.¹¹² Piştî van dewletên jorê Hemedan dikeve bin hikumdariya Selcûqiyân. Demên yekem Selcûqî Hemedanê dikine paytexta xwe ya rojhilat. Piştî Selcûqiyân Hemedan dikeve bin hukmê Sefewiyân. Di dema Sefewiyân de gelek avahî lê têne çêkirin ku bi saya wan avahiyân bajar piştî rûxandina Moxolan bi ser hemdê xwe ve tê.¹¹³ Niha faris, azerî û kurd bi hev re lê dijîn. Zimanê ku lê tê peyivîn bi pranî farisî ye, ji ber ku kurd û azerî jî tê de dijîn, ziman û zaravayên mîna kurdî, azerî, lorî û lekî tê de têne axaftin.

2.10.1. Zeyad Kebîr Hemedanî

Zêde agahî derbareyê jiyana wî de nînin. Ji Hemedanê ye. Welîyekî kurd ê Hemedanê bûye. Bi Cuneyd re sohbetên wî çêbûne. Zanyarê fiqhê û parêzer bûye. Lewra duayên wî hatine pejirandin. Li gorî gotinên Kehmesê Hemedanî, hevçaxê wî bûye.¹¹⁴

Ji ber ku bi Cuneydê Bexdadî re hevdem bûye û di serdema Kehmesê Hemedanî de jiyaye, lewma em dikarin bibêjin ku di sedsala sêyem a hicrî de jiyaye.¹¹⁵

Menqebeya Kehmesê Hemedanî: “*Carekê ez çûm xutbeya îne, min dît wa ye Zeyad jî li wira ye. Li mîhrabê rûniştibû, duaya baranê dikir. Hîn duaya wî xelas nebûbû, hinkî baran bariyabû ku em nikarîbûn biçûna malên xwe.*”¹¹⁶

2.10.2. Kehmesê b. Huseynê Hemedanî

Di sedsala sêyem a hicrî de jiyaye, cihê jidayîkbûna wî tam diyar nîne. Li Hemedanê jiyaye û bi gelek meşayixan re di têkiliyê de bûye. Hevçaxê Cuneydê Bexdadî û Ziyad el-Kebîrê Hemedanî bûye. Çawa ku hate gotin hevçaxê Ziyad el-

¹¹² Mehmet Akbaş, “*Evliya Çelebinin Gözüyle Kürtler ve Kürdistan*”, Artuklu Akademi, /2(1) r. 53 (<https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/364779>), (15.10.2019)

¹¹³ Tahsin Yazıcı, “*Hemedan*” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 17, rr. 183-185, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/hemedan>), (15.10.2019)

¹¹⁴ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 226.

¹¹⁵ Di beşên menqebeyên li ser Cuneydê Bexdadî û Kehmesê Hemedanî de qala serdema wan hatiye kirin.

¹¹⁶ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 226.

Kebîrê Hemedanî bûye û pê re sohbet kiriye û derheqê wî menqebeyek gotiye ku di *Nefहतatu'l-Unsê* de hatiye. Kunyeta wî Ebû Mihemed e. Welîyekî kurd ê Hemedanê bûye.

Bi gelek welîyan re sohbet kiriye û wîlo gotiye: “*Şevêkê ji şevan ez li mala xwe ya li Hemedanê rûniştibûm, yekî li derî xist, min xwe bi xwe got ew Cuneyd e. Dema min derî vekir min nêrê ku Cuneyd bi xwe ye. Silav da min û got: ez bi qestî hatime ziyaretê te. Rastiya xatirê te ji min re diyar bû û veşerîya çû. Roja din ez li Hemedanê lê geriyam, min kir nekîr, min ew nedît. Di wê navberê de ji Bexdayê kerwanek hatibû. Min ji wan pîrsa Cuneyd kir, haya wan jî jê tunebû. Wê şevê hatibû û çûbû.*”¹¹⁷

2.10.3. Ebû Bekir Hemedanî

Welîyekî kurd ê Hemedanê bûye. Ebûbekir Şehabedînê Ehmed b. Mihemed. Îshaq yek ji mezinên edîb û xelkê Hemedanê ye. Bavê wî Mihemed b. Îshaq însanekî zane û feqîh bûye. Lewma kunyeta wî bûye Ibnê Feqîh.

Ibnê Feqîh zanyar û coğrafîzanekî herî navdar ê sedsala sêyem û çarem e. Berhema wî ya navdar a li ser erdnîgariyê *Kitabu'l-Bildan* e ku di sala 290î de nivîsiye û ji nêzî hezar rûpelan pêk tê. Berhema wî ya din *Zikru'l-Şuera el-Muhedisîn we'l-Bilexatê Minhum we'l-Mufehimîn* e ku li ser jiyana helbestvanên navdar ên serdema xwe nivîsiye.

Şîrûye b. Şehrdar wî wek feqîh û muhendîs dide nasandin û kunyeta wî wek Ebû Ebdullah û leqeba wî jî wek Halan dide zanîn û dibêje: Ehmed b. Mihemed b. Îshaq b. Îbrahîm el-Exbarî navdar bi Ibnê Feqîh riwayeta bavê xwe û gelek mezinên din kiriye.¹¹⁸ Menqebeya li ser Hemedanî:

Şêxu'l-Îslam: “*Huseyn Feqîr wîlo neqil dikir. Derwîşî bi sê tiştan pêkan e. Yek, divê mirov ne çavbirçî be, angê mirov çav bernede malê xelkê. Didu, divê mirov*

¹¹⁷ Camî, *Nefहतatu'l-Uns*, r. 221.

¹¹⁸ Mehdi Derakhshan, *Bozorgan Va Soxansorayane Hamadan*. C. 1: *Baad Az Eslam Ta Zohoore Selseleye Ghajar*, Ettelaat, Tehran r. 138.

mal û milk berhev neke. Û sisê, heger tiştêk ji te re ji cihekî nediyar bê divê tu red bikî yan jî berhev nekî."¹¹⁹

2.10.4. Ehnêf el-Hemedanî

Jiyana wî di dawiya sedsala çarem û destpêka sedsala pêncem a hicrî de derbas bûye. Derheqê jiyana wî de agahiyên zêde tune ne. Tevahiya jêderên ku qala wî kirine, berhema Ebdurehmanê Camî ji xwe re wek çavkanî destnîşan kirine û agahiyên wî dubare kirine.

Ew ji şêxên herî mezin ê Hemedanê ye. Wî gotiye: *"Di destpêka karê xwe de carekê tenê li çolê mabûm. Pir westiyabûm. Min destê xwe ber bi Xwedê ve bilind kir û got: Xwedêyo! Ez lawaz û aciz im û hatime mêvandariya te. Dema ku min wiha got: kete dilê min ku qey yek ji min dipirse ku kê tu vexwendiyî mêvandariyê. Min gotê: Xwedêyo! Ev welatek e ku mêvanên nevxwendî dihebîne. Ji nişkê ve li pişt serê min dengê hat. Min li pişt xwe nihêrî û min dît ku erebekî çolê siwarî hêştirekê ye got: Xeşîmo nezano tu yê bi ku ve biçî? Min got: ez diçime Mekkeyê got: Gelo tu vexwendiyî? Min got: ez nizanim. Got: ma wî di vê rêkê de îtaet nekiriye, ev şert e? Min gotê: erê lê ez mêvanekî nevxwendî me. Got: tu mêvanekî nevxwendiyî pir baş î û welat pir berfireh e. Got: tu yê bikaribî li vê hêştirê miqate bî? Min gotê: erê, ji hêştirê peya bû, hêştira xwe da min û gote min: Here mala Xwedê."*¹²⁰

2.10.5. Xace Yûsifê Hemedanî

Weliyekî kurd ê Hemedanê ye. Yek ji mezinên Neqşîbendîyan bûye. Navê wî yê tam Ebû Yeqûbê Yûsif b. Eyûb b. Huseyn b. Wehereyê Hemedaniyê Bozencêrdî ye. Di sala 440 an jî 441 ê hicriya qemerî de li Bozencêrdê ji dayîk bûye. Bozencêrd gundekî Hemedanê ye û li ser riya Sarî û Riyê dimîne.

Kunyeta wî Ebû Yaqûb e. Mela, alim û arifekî rûhanî bûye. Gelek meqamên wî yê rûhanî û xwedîkeramet hebûne. Heştêmîn alimê "Silsile-î Aliyye"yê ye. Wî gelek însan vexwendine ser riya heqîqetê û rê li ber însanan xistiye. Di sala 535/1140î de li gundê Hemedanê yê bi navê Bûnezecirdê çêbûye. Wekî din, li

¹¹⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 354.

¹²⁰ *h.b.*, r. 213.

Medreseya Nîzamiyeyê li bal Ebû Îshaq el-Şîrazî beşdarî dersan bûye. Ji bilî vê, ji ber destên kesên weke Ebû Caferê Muslim, Ebdulsamed b. Me'mûn, Îbnu'l-Muhtedî Billah, Xetîb el-Bexdadî, Îbni Hezarmerd û Ebu'l-Huseyn Ehmed b. Mihemed b. En-Neqûr ders wergirtiye. Tê neqilkirin ku ji mutesewwufên mîna Ebdullahê Cuweydî û Hesên Simnanî di warê tesewwufê de sûd wergirtiye. Li ser esasên dînî pir sekiniye. Guh nedaye kerametên. Lewra girîngî nedaye tiştên wilo. Ji ber vê, gotinên Ehmed el-Xezalî neecibandine. Lewra li gorî wî gotina Mensûrê Helac a “ene'l-heq” qebûl nekiriye. Ji dêlva vê gotinê pişteka “ene't turad” kiriye. Ders daye kesê weke Ehmed el-Xezalî lewra mamosteyê wî bûye.¹²¹ Di warên dadî û ilmên din de rêhevalên xwe derbas kirine. Dema hîn temenê wî biçûk bûye hemû murîdên Ebû Îshaq ku mamosteyê wî ye, derbas kirine. Di bajarên weke Bexda, Îsfehan û Semerqendê de we'zên hedîsan dane gelek guhdaran. Dûre bi tevahî xwe daye ilm, îbadet û taetê. Di tesewwufê de şopgerê Şêx Ebû Elî Farmedî bûye. Lê beşdarî sohbetên Şêx Ebdullahê Cuweynî û Şêx Hesên Simnanî jî bûye. Demekê di bajarê Mervê de maye. Ji wira diçe Heratê û demeke dirêj li vira dimîne. Dûre mervîyan daxwaz kiriye ku vegere. Ji ber vê daxwazê vegehiyaye Mervê. Piştî dîsa vedigere Heratê. Dema ku wê dîsa vegere Mervê li ser rê diçe rehma Xwedê. Ango di sala 535an de çûye rehma Xwedê. Gora wî li Mervê ye.¹²² Şeş berhemên wî hene:

Rutbetu'l- Heyat: Qala çavdêriya sofîyekî li jîyanê dike û ji sê beşan pêk tê. Ev beş bi sernavên “îman”, “îslam” û “îhsan”ê ne. Nusxeya vê berhemê tenê li Pirtûkxaneya Silêmaniyeyê heye. Ev berhem ji aliyê Mihemed Emîn Reyahî ve hatiye tomarkirin. Wekî din, bi wergera tirkî ya bi navê “Hayat Nedir?” ji aliyê Necdet Tosun ve di sala 1998an de li Stenbolê hatiye çapkirin.

Rîsale 1: Derbareyê edeba terîqetan de ye. Ev pirtûk di nava pirtûka “Hayat Nedir?” a wergera tirkî de cih digire.

Rîsale 2: Qala kaînatê dike de ku kaînat çawa ji bo xizmet û fermana însanan hatiye afirandin. Wergera vê jî di nava pirtûka “Hayat Nedir?” a wergera tirkî de cih digire.

¹²¹ Vassâf, *Sefîne-î Evliyâ*, c. 2, r. 22.

¹²² Hâce Yûsuf-i Hemedânî, *Hayat Nedir? (Rutbetü'l-Hayât)*, Wer.: Necdet Tosun, İnsan Yayınları, 2000. r. 6.

Risale 3: Ev berhem jî derbareyê tewhîdê de ye. Nusxeya vê berhemê li Pirtûkxaneya Navendî ya Zanîngeha Tehranê heye. Ev berhem ji aliyê Celîl Mêsgernêjad ve hatiye çapkirin.

Kitabi Keşf: Di *Nefahatu'l-Uns* a Camî de behsa vê pirtûkê tê kirin. Ev berhem ji aliyê Şemsedîn Mihemedê Deylemî ve bi fikrên tobe û guneh ên muelfîn di pirtûka Rîsale-î Îsfehan de hatiye rexnekirin. Sumeyremî jî li dijî wê pirtûka Reddî Rîsale-î Îsfehan nivîsiye. Li Pirtûkxaneya Silêmaniyeyê bi navê *Kitabu'l-Keşf 'an Menazili's-Sairîn* hatiye tomarkirin. Di serê yekem ê pirtûkê de kêmasî heye. Dibe ku berga duyem a *Kitab- i Keşfê* be."

Şefawetu't-Tewhîd li-Teşfîyeti'l-Murîd: Şîroveya gotina "Sofî ne mexlûq e." Ji bilî vê ji mijarên li ser sebir û pakiya dil jî radiweste. Ev berhem ji aliyê Celîl Mêsgernêjad ve hatiye weşandin.¹²³ Menqebeyên li ser Yûsif Hemedanî:

Di *Rîsaletu's-Sahibiye* de hatiye gotin: "*Îmam Yûsif wextê mirina xwe zanibûye û dema mirinê hin şîret li murîdên xwe kiriye û Xizir Pêxember, Elyas Pêxember, Evdal, Xews û Qutb hatin û ew bi rê kirin û sêvek jî dane wî ku berî mirinê bêhn bike.*"

Ebdulmecîd Xalidiyê Neqşîbendî: "*Rojekê jinek digirî û diçe cem Xace Yûsiv dibêje ku dijmin kurê min dil girtiye. Şêx Yûsif jê re dibêje sebir bike, lê dayîk bêsebrîyê dike. Şêx ji Xwedê re dibêje kurê wî azad bike û di azadiya wî de bilezîne û vedigere ji jinikê re dibêje here malê kurê te li malê ye. Dema jinik diçe malê dibîne belê kurê wê li malê ye. Kurê wê jê re dibêje ez niha li Qustentenyeyê bûm, dest û piyên min li qeydê xistibûn û nobedar di ser serê min re sekinîbûn. Mêrikek hat ez di pişt xwe re veşartim û ji nişkê ve anîm vira.*"

Şêx Mihyedînê Erebi rehmeta Xweda lê be. Di hindek nivîsên xwe de dibêje: "*Xace Yûsif Hemedanî li bal me bûye. Ji heftê salî pirtir welîfî kiriye û li ser siccadeya îrşadê maye. Rojekê ji rojan li dergeha xwe bûye û dil kiriye ku derkeve derve. Ji bilî roja Înê dernedikete derve. Lê îroj pir dixwest ku derkeve derve. Li kerê*

¹²³ Necdet Tosun, "Yûsuf el-Hemedânî" *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 44, rr. 12-13, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/yusuf-el-hemedani>), (15.10.2019)

siwar bûye û derketiye. Hema wilo serê kerê berdaye gotiye hema li ku bisekine ez ê jî li wira peya bibim. Kerê ew biriye derveyê bajêr li nava çolê li ber mizgefteke nepenî sekiniye. Daxilî mizgeftê bûye. Li hundirê mizgeftê xorteke biheybet li nava mizgeftê sekinîbûye. Xortê ciwan serê xwe rakiriye û gotiye êy Yûsif! Pirsgirêkeke min heye û meseleyê jê re qal dike. Piştî vê gotinê Yûsif gotiye êy! Xortê delal, dema pirsgirêkeke cenabê te çê bibe were bajêr, ji min bipirse, zehmetiyê nede min. Xortê Ciwan wilo bersiva wî daye. Dema pirsgirêkeke min çê bibe her kevirek ji min re Yûsifek e.”

Şêx Îbnu'l-'Erebî dibêje: ”Ez ji vê yekê têgihîştim ku murîdên sadiq bi sedeqeyan dikarin şêxên xwe li ser xwe de rakêşin.

Şêx Necîbedînê Buzxuşê Şîrazî rehmeta xweda lê be dibêje: ”Carekê ji caran hin hevokên Yûsif gihîştin destên min, pir kêfa min ji wan re hat. Min gelek vekolîn li ser wan kir û gelek gotinên bi wî awayî dît. Şevê beriya sibehê min xeweke pir ecêb dît. Min extiyarekî biheybet, nûranî û bi rûyên spî dît. Derbasî dergehê bû, bo destnimêjê berê xwe da destnimêjgehê. Cilên spî li xwe kiribû. Li ser cilên wî bi tîpên reş Ayetu'l-Kursî hatibûn nivîsandin. Ez çûm bal wî cibbeyê xwe derxist û da min. Li binê wî yekî xweşiktir hebû, li ser wî jî Ayetu'l-Kursî nivîsandibû. Wî jî da min û got heya ku ez destnimêj digirim van himmet bike. Piştî ku destnimêj girt got tu ji van kîjanê dixwazî? Min got tu kîjanê bidî ez ê qebûl bikim. Yê kesk da min û yê spî jî li xwe re hilda. Got tu min nas dikî? Ez xwediyê wan gotinên ku tu li pey wan ketiyî. Ez Ebû Yûsifê Hemedanî me. Min navê wê pirtûkê kir Rubtetu'l-Heyat. Wekî din jî berhemên min ên xweş hene. Ez li xwe hay bûm ku ez di xew de bûme. Lewra min ev yek di xewa xwe de dît. Li gorî galegalan Ebû Yûsifê Hemedanî li Bexdayê li Medreseya Nizamiyeyê we'z daye. Carekê ji caran dema ku wilo we'zan dide feqeyek radibe ser xwe pirsêkê ji Ebû Yûsif re dibêje. Ebû Yûsif bêerziyan didiyê, dibêje: Rûnê li cihê xwe! Bêhna kufrê ji peyvên te tê. Ez bi bawer nînim tu wekî misilmanekî herî rehma Xwedê. Dûre ji Qeyserê¹²⁴ Rûmê qasidek tê bal xelîfe. Îbnî Saka û dixwaze pê re bipeyive. Ez dev ji dînê Îslamê berdim ez dikarim bême ser dînê we?

¹²⁴ “Qeyser” Sezar e, “Rum” jî Roma ye. Împaratoriya Bîzansê peyrewê Romayê bûye. Împaratoriya Osmaniyan jî peyrewê Bîzansan bûye. Ji ber vê, ev tê wateya ku em bibêjin em peyrewên Romayan in.

Yê Xirîstiyân daxwaza wî qebûl kiriye. Pê re çû Stenbolê û derketin Kayseriyeyê û weke Xirîstiyanan çû rehmêtê.

Îbnî Seqa Quran ji ber kiribû. Dema ku li ber sekeratê bû, hinekan jê pirsîn: Gelo ji Quranê tiştek di bîra te da maye? Got ku tu tiştek di bîra min de nemaye tenê ev ayet maye: “Yên ku bûne kafîr dê bêjin xwezî ew rojekê misilman bûna.”¹²⁵ Hindek kes qiseya Îbnî Seqa bi cûrekî din dibêjin ku di serbohoriya Şêx Ebdilqadirê Geylanî rehma xweda lê be, wê were gotin. Xelîfeyên Xace Yûsif Hemedanî çar kes bûne: Xace Ebdullahê Berqî, Xace Hesênê Endeqî, Xace Ehmedê Yesewî û Xace Ebdilxaliqê Wucduwanî rehmeta xweda li wan be. Piştî Xace Yûsif ev çar kesan xelîfe bûne û hindek xelîfeyên din di xizmeta wan de bûne. Dema ku xace Ehmedê Yesewî ber bi Turkistanê ve çû ji hevalên xwe re got ku bibin peyrewê Xoce Ebdilxaliq.¹²⁶

2.10.6. Şêx Berekeyê Hemedanî

Weliyekî kurd ê Hemedanê bûye. Ummî¹²⁷ bûye. Agahiyên ku li ser jiyana û kesayetiya Şêx Berekeyê Hemedanî di nameyên ‘Eynu’l-Qudat de hatine dayîn pir kêr in, lê li gorî zanyariyên heyî mirov dikare hin tiştan fêhm bike. Em dizanin ku navê wî Bereke ango Bereket bûye û ji ber ku xelkê Hemedanê bûye û hema li wira ji dayîk bûbe û wefat kiribe, jê re şêx Berekeyê Hemedanî tê gotin. ‘Eynu’l-Qudat dîroka jidayîkbûnê û wefata wî diyar nekiriye, lê li gorî agahiyên heyî, tê texmînkirin ku derdora sala 440î de ji dayîk bûbe û di navbera salên 521 - 524an a hicrî de jî çûbe ser dilovaniya xwe. Ji bo dîroka wefata şêx Bereke di berhemên ‘Eynu’l-Qudat de hin agahî hene ku mirov dikare serî li wan bide. Şêx Bereke berî ku bibe bîst salî tevî terîqetê bûye û gihîştîye meqamên bilind. Hemçaxê Ehmedê Xezalî bûye û îhtimal heye ku pê re sohbet kiribe. Ehmedê Xezalî bi qasî sêzdeh salan ji wî biçûktir

¹²⁵ Sûreyê Hicrê, Ayeta 2.

¹²⁶ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, rr. 535-536.

¹²⁷ Kesê ku neçûye li cem tu kesekî û nexwendîye.

bûye. Her wiha hevçaxê şêx Fetheyê Hemedanî jî bûye.¹²⁸ Şêx Bereke Umî bûye û 'Eynu'l-Qudat heft salan şagirdiya wî kiriye. Menqebeyên li ser Şêx Bereke:

'Eynu'l-Qudat di berhemeke xwe de wilo behsa Şêx Bereke dike: "*Di bîra Şêx Berke de tenê Sûreyê Fatîheyê û çend sûreyên din hebûn. Ew jî tam nedixwendin. Bi devoka Hemedanê jî baş nizanibû. Lê Quran baş dizanibû, lewra rast şîrove dikir. Ez li ber wî fêrî Quranê bûm.*"

Xace Ehmed Xezalî: "*Şêx Ebu'l-Qasim Gurganî tu carî navê îblîs nedianî zimên. Lê dema navê wî bigota digot Xaceyê Xacegan û Serê Mehcûran. Dema ku min ev çîrok ji Şêx Bereke re got wî ji min re wilo got Serê Mehcûran baş e ta ku Xaceyê Xacegan ."*

Di cihekî din de gotiye ku Bereke rehmeta Xweda lê be digot: "*Bavekî ji kurê xwe re got tu qet bûyî rûyê gayî? Got bavo rûyê gayî çi ye? Got ew kesê/a ku ji sibê ve ji mala xwe derkeve û bibêje ez ê îroj xezîneyekê peyda bikim. Kurê wî gotê bavo hindî ez hebûme, ez her rûyê gayî bûme.*"¹²⁹

'Eynu'l-Qudat xwe wek şagirdê Şêx Bereke zaniye û gotiye: "*Min heft salan kê-m-zêde Şêx Bereke didît, lê min tu carî cur'et nedikir gotinekê li ser gotinên wî bibêjim.*"¹³⁰

Qudat dîsa dibêje: "*Ez dizanim ku ew Qur'anê baş dizane û tenê hinek sûreyên wê dizanim, û ew sûre jî ne bi riya tefsîrê û tiştên wisa hîn bûme, bi riya xizmeta cenabê wî hîn bûme.*"¹³¹

2.10.7. Şêx Fethayê Hemedanî

Ji Hemedanê ye. Welîyekî kurd ê Hemedanê bûye. Fetha li cem kurd û loran kurtkiriya "Fethullah" e. Li gorî Ebdulhisên Zerînkûb, murşîdê Fetha, Baba Tahirê

¹²⁸ Nasrollah Poorjavadi, *Barakeye Hamadani Ostade Omiye Eynolghozat*, Maaref, Tehran, 986. rr. 8-10.

¹²⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 607.

¹³⁰ Eynolghozat Hamadani, *Namehaye Eynolghozate Hamadani*, Be Ehtemame Alinaghi Monzavi Ve Afif Esiran, c. 1, Tehran, 2016. r. 46.

¹³¹ Hamadani, *Namehaye Eynolghozate Hamadani*, r. 51.

Hemedanî bûye.¹³² Fetha bi xwe jî hevçerxê ‘Eynu’l-Qudat bûye û Şêx Bereke jê re zêde rêz girtiye. Gelek kes Fetha wek murşid û mamosteyê ‘Eynu’l-Qudat dizanin.¹³³ Menqebeyên li ser Şêx Fetha:

‘Eynu’l-Qudat di berhemeke xwe de wilo qala Şêx Fetha dike: “*Yekî ku ez pê bawer bûm, wilo qala Şêx Fetha dikir: ‘Ji Xwedê û însanan xerabî çê nabe. Li cihekî din jî dibêje: Min bihîstiyê Şêx Bereke jî wilo gotiyê Şeytan wilo got li vê dinyayê bextê Şêx Fetha ji yê min reştir e. Piştî ku Şêx Bereke ev got giriya. Di cihekî din de jî wilo dibêje: Heger pêrekî tesewwufê bigihîje kamiliyê dizane ku murîd di kîjan meqamî de ne û gelekî ji Fetha hatibû bihîstin ku filankes ê wiha ye û bêvankes wê wiha bibe.*”¹³⁴

Tê gotin ku ‘Eynu’l-Qudat mehzeza Fetha fêr nekiriye. Bereke hertim şîret li ‘Eynu’l-Qudat kiriye ku gora Fetha ziyaret bike. ‘Eynu’l-Qudat dibêje: “*Min tu carî fêr nekir ku murîdî çî bû ku Şêx Bereke ez dişandim ser tirba Fetha.*”¹³⁵

2.10.8. ‘Eynu’l-Qudatê Hemedanî

Kunyet û navê wî Ebu’l-Fedaîl Ebdulahê kurê Mihemedê el-Mîyancî ye û leqeba wî ‘Eynu’l-Qudat e.¹³⁶ Ebdulkerîm b. Mihemedê Sem’anî nivîskarê pirtûka *Kitabu’l-Ensab* di behsa li ser bajarê Miyanciyê qala malbata ‘Eynu’l-Qudat kiriye. Sem’anî qala ‘Eynu’l-Qudat bi xwe nake lê bavê wî Ebû Bekirê Mihemed û bapîrê Elî b. Hesên wek zanyar û Qudatên Miyanciyê bi nav dike. Li gorî Sem’anî nav û dengê bapîrê ‘Eynu’l-Qudat sînoren Hemedanê derbas kiriye û li Bexdayê jî ku li wira dersa qazîtiyê xwendibû jî binavûdeng bûye. Li gorî agahiyên heyî em dizanin ku ‘Eynu’l-Qudat li Hemedanê ji dayîk bûye, lê dîroka deqîq a jidayîkbûna wî diyar nîne. ‘Eynu’l-Qudat di berhemên xwe de qet amaje bi navê xwe, lewra Ebdullah nekiriye û navê bajarê bavûkalên xwe ango Miyanciyê jî nake. Ew xwe wek “Eynu’l-Qudat bi nav dike. Li tu cihekî nabêje ku çima ev nav lê hatiye kirin û tu belgeyek jî qala vê yekê bike tune ye. Ev nav ji ber bav û bapîrê wî ku her du jî qazî bûne, lê hatibe kirin. Bi vê wateyê ku ew çav an ronîya çavê qaziyan e. Her wiha ev nav

¹³² Abdolhosein Zarinkoob, *Jostejoo Dar Tasavof*, Amirkabir, Tehran, 2004. r. 192.

¹³³ Zarinkoob, *Jostejoo Dar Tasavof*, r. 192.

¹³⁴ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 607.

¹³⁵ Poorjavadi, *Barakeye Hamadani Ostade Omiye Eynolghozat*, r. 31.

¹³⁶ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 604.

dikare bibe belgeyekê ku ew çavkanî û pêşengê qaziyên din bûye. Lewra ew di ser qaziyên din re bûye. Her wiha ev nav dikare îşaretek be li ser vê meselê ku ew têkoşerekî pîroz bûye ku di riya bîr û baweriyên xwe de ji nav çûye. Ew xwe wek ‘Eynu’l-Qudat bi nav dike û fexrê bi bajarê xwe Hemedanê dike. Ji zaroktiya xwe ve pir zîrek bûye û berhemên ilmî yên serdema xwe di demeke kurt de kuta kiriye. Dersên Omer Xeyam û Şêx Hemûviye yên kelim, bîrkarî, astronomî, felsefe û wêjeyê şopandine. Lewra di van waran de têr û tijî bûye. Di bîst û yek saliya xwe de berhema bi navê *Xayetu’l-Behs ‘en Me’ne’l-Be’s* nivîsiye. Di temenê xwe yê ciwan de gihîştîye asta we’zdayînê. Ji ber vê, li medreseya Hemedanê bûye dersdêr. Ji zarokatiya xwe ve bala wî li ser ilmê kelimê hebûye. Derbareyê kelimê de hema hema hemû pirtûkên kelimê xwendîye. Ev xwendin bêhtir şik û gumanan li ser wî çê dikin. Ji ber vê çar salan berhemên Îmamê Xezalî dixwîne da ku wan şik û gumanan ji ser bîra xwe bavêje. Piştî van xwendinan hew jê ku bîra xwe zelal kiriye, lê bîra wî ya ilmî têkeltir dibe. Piştî salekê dema Ehmed el-Xezalî tê Hemedanê di jiyana Qudatê Hemedanî de bandoreke erênî çê dike. Lewra bi hatina wî hinkî motîve bûye. Jê re gotiye: “*ezbenî, birayê min, rêberê min, siltanê min.*” Piştî hevdîtina bi Ehmed el-Xezalî re gihîşt wê qenaetê ku êdî riya ku tê re dihere temam bûye. Bîst rojan pê re sohbetê dike. Piştî ku Ehmed el-Xezalî dihere pênc salan nameyan jê re dişîne. Piştî bandora Ehmed el-Xezalî ya li ser wî, Qudatê Hemedanî berê xwe dide ser tesewwufê lê ji ber fikrên wî yên li ser kelim û îtiqadê mutesewwufên hemdemê jê dikevin şik û gumanê û wî bi zindîqiyê re sûcdar dikin. Qudat guh nade van bêbextiyan.

Bi Şêx Mihemed b. Hemuye û Şêx Ehmed Îmam Xezalî re sohbet kiriye. Fezîletên wî yên şeklî û manewî di berhemên wî de berbiçav in. Wî û Şêx Ehmed Xezalî gelek name ji hev re şandine. *Rîsaleya Xeybiye* jî yek ji wan e ku di naveroka wê de balê dikişîne ser herikbariya xweşbêjî, rewanbêjî û şêwazê. ‘Eynu’l-Qudat di berhema xwe ya bi navê *Zubdetu’l-Heqaiqê* de wilo dibêje: “*Ez ji qîlûqalên zanistên zahirî aciz bûm û min bala xwe da berhemên Hucetu’l-Îslamê. Ez çar salan li ser wan xebitîm. Ez li wira gihîştîm armanca xwe. Seyidê min, Şêxu’l-Îmam, Sultanu’t-Terîqet Ehmed b. Mihemed Xezalî heya ew li bajarê min Hemedanê man ez ji civînên wan ên dînî bêpar nemam.*”

‘Eynu’l-Qudat zanyarekî mezin û wêrek bû ku gelek kesan hesûdî û dexesî lê dikir. Dijminên wî ew bi îrtidadê tawanbar kirin û şandin zindanê. Piştî hate berdan û vegera Hemedanê, di dawiyê de roja 23yê 525ê hicrî, ango 23yê gulana 1131ê hate darvekirin. ‘Eynu’l-Qudat di nameyên xwe yê şexsî de ev encam pêşbînî kiribû, lewre zanibû wê bê binçavkirin û darvekirin û bi awayekî ecêb li benda wê rojê û wê bûyerê bû.

Dema hîn 21 salî bûye pirtûk û risale nivîsîne û dema dibe 24 salî pirtûka xwe ya herî navdar a felsefî bi navê *Zubdetu’l-Heqayiq* nivîsî û hew qasî navdar bû ku gelek dijmin jê re çêbûn. Di 33 saliya xwe de jî tê darvekirin.

Berhemên ‘Eynu’l-Qudat ev in: *Risaleya Lewayih*, *Temhîdat* (bi farisî ye), *Zubdetu’l-Heqayiq fî Keşfî’d-Deqayiq* (bi erebî ye), *Şekwa’l-Xerîb anî’l-Ewtan îla ‘Ulemaî’l-Buldan* (bi erebî ye), *Zubdetu’l-Me’anî*, *Xayetu’l-Mekan fî Dîrayetî’z-Zeman*, *Risaleya Irfanî*, *Risaleya Cemalî*, *Mekatîb*, *Risaleya Yezdanşinaxt*. Ji bilî farisî û erebî, hin helbestên wî yê bi zimanê fehlewî jî hene.

Ji bilî yê jorê hin berhemên ‘Eynu’l-Qudat ên din jî hebûne ku bi xwe di risaleya *Şekwa’l-Xerîb* de behs dike, lê li tu derekî din nehatine peyda kirin.¹³⁷ Menqebeyên li ser ‘Eynu’l-Qudat:

‘Eynu’l-Qudat dibêje: “*Ez û bavê xwe û cemaetek ji îmam û şêxan li mala sofîyan de bûn em reqisîn. Ebû Seîd Tirmizî beyt dixwend. Bavê min nihêrî û got, min Xace Ehmedê Xelalî dît ku bi me ra direqisî û cilkên wî weha û weha bûn. Ebû Seîd got, ez mirinê hevî dikim. Min gotê bimire, ew jî ji nişkê ve nehiş ket û mir. Muftî hat û got dema ku dikarî zindiyan bikujî tu yê bikarî miriyan jî vejînî. Min got kê miriye got Feqî Mehmûd. Min got Xwedêyo Feqî Mehmûd zindî bike ew derhal zindî bû.*¹³⁸ Li Tirmizî nihêrî û wilo got: Dema ku Xace Ehmedê Xezalî bi me re direqisî wilo got kirasê wî wilo bûye. Lewra qala hûrgiliyên kirasên wî dikir. Dûre Ebû Seîd wilo got daxwaza mirinê bi min re çê bû. Min jî got bimire, tavilê ji xwe çû û mir. Miftî li wira bû. Wilo got tu miriyan zindî dikî û yê zindî jî dikujî? Min jî got mirî kê ye? Got Mehmûdê feqî ye. Got Ya Rebî! Tu Mehmûd vejînî. Ê Mehmûd zindî bû. Dîsa wilo

¹³⁷ Nurettin Bayburtlugil, “Aynülkudât el-Hemedânî” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 4, rr. 280-282, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/aynulkudat-el-hemedani>), 16.10.2019

¹³⁸ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, rr. 605-606.

got Ey ezîz! Karên ku Xwedê pêwendiyê bi hinekan re çê dike weke mecazî bizane, lewra mirov beşer e, nezan e. Bizanibe ku avakarê vî karî Xwedê ye. Divê mirov vê ayetê bizanibe:¹³⁹ Bibêje: Melekê mirinê yê ku bûye karsipareyê ruhê we dê we bimirîne, piştî hûn ê li Xwedayê xwe vegerin.¹⁴⁰ Heqîqeta wê jî ev e: Xwedê nefşên ku dema mirina wan tê, distîne û yên zindî jî di xewê de...¹⁴¹ Li ser rêliberxistina Hz. Mihemed û rastiya ku Şeytan bi awayekî mecazî jî rê derdixê jî wilo ye: Bi rastî jî Xwedê kî bivê, jî rê derdixê û kî jî bivê rasterê dike...¹⁴² Heger em bizanibin Şeytan însanan jî rê derdixê. Kê ev heq da Şeytan? Hz. Mûsa derheqê vî tiştî de wilo dibêje: Ev tiştî hanê jî fesadiya te ne wêdetir e.¹⁴³

2.10.9. Ebû Huseyn b. Cehzem Hemedanî

Ji aliyê tesewwufî ve sofîyekî di tebeqeya şeşem de bûye. Welîyekî kurd ê Hemedanê bûye. Navê wî yê din Elî b. Eddillah el-Huseyn b. Cehzem el-Hemedanî ye. Kesayetekî mezin bûye. Xwendekarê Kewkebî û Caferê Xuldî bûye. Şêxê Herema Şerîf bûye. Di pirtûka wî ya bi navê *Behcetü'l-Esrarê* de behsa jiyanname û meqamê sofîyan ên rûhanî dike. Li gorî berhema wî ya bi navê *Tarîxî Yafî'iyê* di sala 1023yan de çûye rehma Xwedê. Şêx Ehmed Kûfanî ew dîtiye.¹⁴⁴

Berhemeke wî ya bi navê *Behcteu'l-Esrar fît-Tesewwuf* heye.

Ebû Îshaq di sala 388an a hicrî ango 988an a zayînî de tevî Ebû Bekirê Ibadanî diçe sefera Hecê û di rê de li cem şêx û zanyarên Besre, Medîne û Mekkeyê, bi taybet li cem Ebu'l-Hesen b. Ebdullah b. Cehzemê Hemedanî hînê hedîsan bûye.

Di pirtûka bi navê *Behrê Zuxar* de wiha hatiye gotin: Ebu'l-Hesen b. Cehzemê Hemedanî şagirdê Kewkenî û Caferê Xuldî ye. Di *Sefînetu'l-Ewliyayê* de hatiye gotin ku pirtûkeke wî ya muteber bi navê *Hucetu'l-Îslam* heye ku qala Hz.

¹³⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 606.

¹⁴⁰ Sûreyê Secdeyê, Ayeta 11.

¹⁴¹ Sûreyê Zumerê, Ayeta 42.

¹⁴² Sûreyê Fatirê, Ayeta 8.

¹⁴³ Sûreyê Arafê, Ayeta 155.

¹⁴⁴ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 428.

Xewsu'l-E'zem dike. Di sala 414an a hicrî de wefat kiriye.¹⁴⁵ Menqebeyên li ser Cehzem:

Şêxu'l-Îslam: *“Ez yekî nas dikim ku li Mekkeyê seriyek da Cehzem, lê tewafa xwe ya Hecê nekir. Lewra ji bo ku bêhurmetiyê lê neke biryareke wilo standiye. Bi gotineke din, wê salê Hec jê re ferz nebûye. Di vira de ziyaretkirina şêxan destnîşan dike ku çiqasî girîng e, nîşanî me dide. Eqîlê Bustî ji Bustê dihere Hecê dibêje ez ê li wira herim bal Şêx Ebu'l-Ebas û şelwarekî jê bixwazim. Lê şelwarên wî tunebûne. Dema diçe cem wî, şêx şelwarekî didiyê. Ji Şêx Ebu'l-Ebas re dibêje li xwe bike û vegere. Û nehişt ku rûnê. Here mala ku tu yê de şelwar bidîta, nedihîşt herin Hecê.*

“Kurekî Şêx Ebu'l-Huseyn Cehzem ê nebixêr hebû û bav pir jê aciz bû. Rojekê dema ku kurê wî li nava Mescidê Heramê digeriya, yekî ji Şêx Şîrevanî re wilo got Ya Şêx! Ev kurê Cehzem e. Bavê wî gelekî ji ber wî li ber xwe dikeve. Şîrvanî wiha dibersivîne: Mezin ji ber lawên xwe li ber dikevin da ku law ji ber mezinan li ber xwe bikevin. Heger bavê wî wilo ne navdar bûya kesekî guh nedidayê, ji ber ku bavê wî navdar bûye, lewma xelk wî nas dike.”¹⁴⁶

2.10.10. Emîr Seyyid Elî b. Şehab b. Mihemed Hemedanî

Seyyid Elî b. Şehab ku weke Mîr Seyyid Eliyê Hemedanî tê naskirin, di sala 714an a hicrî li Hemedanê ji dayîk bûye. Welîyekî kurd ê Hemedanê bûye. Bi navên weke Mîr Seyyid Elî, Emîr-î Kebîr, Seyyid Elî Hemedanî, Elî-î Sanî û Şah-i Hemedan ve tê binavkirin. Binemala wî digihîje heya binemala Hz. Elî îmamê çarem Elî Zeynelabîddîn. Bavê wî Şehabeddîn waliyê Hemedanê bûye. Perwerdehiya xwe ya yekem li bal xalê xwe Seyyid Eleddîn wergirtiye. Bi teşwîq û arîkariya xalê xwe Seyyid Eleddîn li bal xalîfeyê Alauddevle-î Simnanî Mehmûd Mezdekanî perwerdehiya xwe qewîntir kiriye. Piştî vê li bal xalîfeyê din ê Simnanî Takiyuddîn Elî Dostî pileya hirqeyê li xwe dike. Piştî çend wergirtina pileyên wilo bi pêşniyaza weliyan qedera bîst salan derketiye gerê da ku kamilbûna xwe pêk bîne. Lewra Emîr

¹⁴⁵ Vajihadîn Ashraf, *Bahre Zokhar*, Tashih û Tedvîn: Azar Meydokhte Safavi, c.3, Dehli, 2010. rr. 9-10.

¹⁴⁶ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 428.

Seyyid Elî ji bo propagandaya îslamê gelek seferên deryayî û bejahî kirine û çûye welatên mîna Hicaz, herêmên cuda yê Erebiyan, Meşhed, piraniya bajarê Asyaya Navîn, Qefqazyaya, Azerbaycan, Serîlanka, Tebet û hew. Lê berhema wî ya herî navdar li Keşmîrê derketiye holê. Du caran serdana Keşmîrê kiriye û li taxeke bi navê Elaedînê Pore li bajarê ku niha weke Serînger tê naskirin, nîşteciya bûye û li wira gelek xebat kiriye. Ji weliyên Hemedanê cudatir tevgeriyaye. Gelek pirtûk li ser tesewwufê nivîsiye ku pir bibandor bûye. Xwendekarên wî li Keşmîrê gelek tekke ava kirine. Ji ber van xebatên wî yê îslamî zêde li tesewwufê deng daye ku di encama van hewldanan de terîqetê weke Hemedaniye ava kiriye. Ji ber ku hîn berhemên wî nehatine veçirandin li ser Hemedaniyeyê tiştek zêde nayê zanîn. Lê paralelî Hemedaniyeyê rêgezên Kubreviye li ser Hemedaniye sepaniye û ji ber vê Muhyiddîn Îbnu'l-Arabî gelek bala wî kişandiye. Heta ji ber vê li ser pirtûka Arabî ya bi navê *Fusûsu'l-hikem'îne Hallu'l-Fuşuş* şerhek nivîsiye da ku esasên terîqeta Kubreviye û fikrên Arabî têkelî hevdu bike.¹⁴⁷

Di zanistên zahirî û batînî de pispor bûye. Di zanista zahirî de pirtûkên wî yê navdar hene. Ji sedî zêdetir pirtûkên wî yê ilmî hene. Hinek pirtûkên wî yê girîng: *Esraru'n-Noqte*, *Şerhu Esmallah*, *Şerhu'l-Fusûsi'l-Hikem* û *Şerhu'l-Qesîdeyî Humziyeyî Fariziyê* û hwd. Menqebeya li ser Emîr Seyid Elî b. Şehab b. Mihemed:

“Piştî ku Şêx Teqiyedîn çû ser dilovaniya Xwedê, vegeriya û ji şêx re got ferman çî ye? Wî bala xwe dayê û got gera cihên dûr e. Li gelek cihên girîng geriya. Beşdarî sohbetên hezar û çarsed weliyê bû û bi çarsed weliyan re rûnişt. Di sala 1385an de li nêzîkî bajarokê Keber û Sewadê li gundekî çû rehetê.”¹⁴⁸

2.11. Weliyên ji Herranê

Herran bajararekî pir kevn e. Di nivîsên mîxî de weke “Harana”, “Harran” tê binavkirin. Di zimanê akadî de tê wateyên “rê”, “rêwingî” û “kerwan”. Di çavkaniyên îslamî de li aliyê “Diyarimûdar” a Mezopotamyayê derbas dibe. Navê Heranê di pirtûka pîroz Tewratê de derbas dibe. Dîrokasên Îslamê avakirina

¹⁴⁷ Tahsin Yazıcı, “Hemedani, Emîr-i Kebîr” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 17, rr. 186-188, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/hemedani-emir-i-kebir>), 16.10.2019

¹⁴⁸ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 641.

Herranê bi neviyê Nûh Pêxember Kenan an jî bi birayê Îbrahîm Pêxember Aran (Haran) ve pêwendîdar dikin. Ji dîroka kevnare heya niha gelek şaristaniyên weke Aramî, Asûr, Med, Keldanî, Pers, Îskender, Eyyûbî û hwd. bi rê ve birine. Weke ku hûn jî dizanin Riha weke Bajarên Pêxemberan tê naskirin. Navçeya Heranê 44 kîlometreyan dûrî Rihayê ye. Li ser sînore Sûriye û bakurê Kurdistanê hatiye avakirin. Dîroka wê bi qasî 4000 salan dirêj e. Di serboriya dîrokî de Heran dikeve bin hikmê gelek dewletan. Li gorî vekolerên arkeolojiyê yekemîn zanîngeh li vira hatiye avakirin û gelek zanistên fenî û beşerî di paşxaneya dîrokî de li vira bi pêş ve ketine. Heta bigire yek ji sê boçûnên felsefeyê ya bi navê Boçûna Heranê li vira hatiye avakirin. Ji aliyê dîrokî û geştiyariyê ve xaniyên bi heriyê gelekî bala geştiyaran dikişînin. Ji bilî van ji bo me ya herî girîng aliyê wê yê dînî ye. Ji ber vê paşxaneya wê ya dînî gelek mutesewwuf lê perwerde bûne û jiyane. Di dîroka ewil a îslamê de kesên weke Nadr b. Arabî, Ebu'l-Hesen Mahled b. Yezîd, Elî b. Îsa, el-Usturlabî, Ehmed b. Ebdulmelîk hwd. ji vira derketine.¹⁴⁹ Ev bajar ji bilî ereb, ermen û tirkan, gelek kurd jî ji berê ve lê bi cih bûne. Ji ber vê weliyên navdar kesê weke Heyat b. Qeys el- Heranî ku mutesewwufekî binavûdeng e, li vira jiyana xwe borandiye. Em ê li xwarê behsa du kesên kurd bikin ku bi mijara me re eleqedar in.

2.11.1. Hayat b. Qeys el-Herranî

Weliyekî kurd ê Heranê bûye. Di çavkaniyan de navê wî bi vî awayî ye: Di *Nefahatu'l-Uns* a Camî de Hayat b. Qeys el-Harranî, li gorî Hayat b. Qeys b. Reccal, li gorî Zehebî di berhema wî ya bi navê *A'lamu'n-Nubela* Sultan el-Ensarî el-Harranî. Hayat b. Qeys qedera pêncî salî li Herranê maye û beşdarî sohbetên Huseyn el-Bevarî bûye û digel Bevarî bi cemaetkî nimêj kiriye. Yekî pir nerm bûye û xwedî kerametana bûye. Ji ber vê kesên weke Selahaddînê Eyûbî û Siltan Nûreddîn Zengî bûye. Li gorî Ebu'l-Hesen el-Qureşî Hayat b. Qeys ji çar weliyên navdar e ku sê hebên din ev in: Ebdilqadirê Geylanî, Marufê Kerhî, Eqîlê Menbicî. Dema gelê

¹⁴⁹ Ramazan Şeşen, “Harran” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 16, rr. 237-240, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/harran>), (16.10.2019)

Herranê derdikeve duaya baranê Hayat b. Qeys dikin referans.¹⁵⁰ Menqebeyên li ser Heranî:

Mûminekî salih dibêje: *“Ez ji Yemenê li keştiyê siwar bûm. Dema em gihîştin nêzikî Behra Hindê firtone dest pê kir. Pêleke mezin çêbû û keştiya me noqî avê bû. Ez li ser texteyekî mam. Min xwe wilo xelas kir. Pêleke bihêz ez ber bi giravekê ve birim. Ez li giravê geriyam min tu kes nedît. Gelek avahiyên xerabe hebûn. Ji nişkê ve min mizgeftêk biçûk dît ku çar kes lê bûn. Min silav da wan, wan jî silava min li min vegerandin. Hal û wextê min pirsîn. Min serboriya xwe yeko yeko ji wan re vegot. Ez roja yekem wilo li bal wan mam. Dema tarî kete erdê min dît wa ye Heranî derbasî mizgeftê bû. Gişt ji ber wî rabûn. Xêrhatina hevdu kirin. Nimêja esrê bi hev re kirin, heya ber êvarê bênavber nimêj kirin. Piştî wê Heranî dest bi we’zan kir. Got gelî hezkiriyê tobekaran, gelî bextewariya arifan, bîbikên çavên evdalan, dostên bêkesan, stargeha gilîkaran, arîkarên îbadetkaran, dilên hezretkêşan! Piştî vê pir li ber ket û dest bi girî kir. Dema wilo giriya, ji nişkê ve mizgeft rohnî bû û li her derê nûr bariya. Dûre Şêx Heranî ji mizgeftê derket. Yên cemaetê ji min re gotin here li hundirê mizgeftê binihêre. Dema ez daxilî hundirê mizgeftê bûm çol û çiya, her der di bin lingên min bûn. Her cara ku te gavek bavêtaya dengên wilo dihatin. ‘Ya Reb! Heranî ji nû ve vejîne. Piştî vê em di demeke kurt de gihîştin Heranê. Li wira misilmanan hîn dest bi nimêja sibehê nekiribûn.*

Şêx Heran li Herana Rihayê di sala 1185an de çûye ber rehma Xwedê.¹⁵¹

2.11.2. Şêx Ehmedê Herranî

Weliyekî kurd ê Herranê bûye. Herranî sih roj û sih şevan li Mekkeyê weke mêvanekî mihacir xebitiye. Hertim dema rûdinişt nanek di destên wî de bûye, dema radibû mîna ku nan nehatiye xwarin, li cihê xwe maye. Kesayetekî wilo bûye ku kerametê wî yên dînê gelek bûne. Agahiyên li ser jiyana wî pir kêr in û di çavkaniyên din ên tesewwufê de navê wî pir kêr derbas dibe û em jî piştî xwe dikutin agahiyên Camî. Menqebeyên li ser Şêx Ehmedê Herranî:

¹⁵⁰ Süleyman Uludağ, “Harranî, Hayât b. Kays” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 16, r. 240, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/harrani-hayat-b-kays>), (16.10.2019)

¹⁵¹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 766.

Şêx Ebû Hesên Mu'temer: "Carekê ji caran ez û Husrî rûniştibûn. Yek hate bal me û ji Şêx Ehmed re got şîretekê li min bike. Şêx Ehmed jê re got qenciya xwe li cihekê bike. Cehm Reqî jî wê demê li wira bûye û wilo gote Şêxê min! Tu zilêm sar dikî. Husrî jî got ku çi tiştên dan min, min jî heman tişt da wan."¹⁵²

2.12. Welîyên ji Kirmanşahê

Bajarê Kirmanşahê li rojavayê Îranê ye. Bi awayê zimanê farisî weke "کِرمانشاه" jî tê binavkirin û Kirmanşah bajarekî pir girîng e. Kurd wek Kirmaşan bi lêv dikin. Dirêjîya welateya Kirmanşahê 24.998km² ye. Serhejmara wê 1.938.060 e. Piraniya nîştecihên wê kurd in. Wekî din, lor, azerî û hinek jî peywirdarên dewleta Îranê yên feris tê de dijîn.

Navê vî bajarî ji hêla kurdên wê herêmê ve wek Kirmaşan tê bilêvkirin. Mihemedê Mukrî, vekoler û zimannasê kurd, dibêje ku Kirmaşanê navê xwe ji peyva "kurmanc" bi wateya kedkar û cotkar wergirtiye. Ebdurehmanê Şerefkendî ango Mamosta Hejar jî di ferhenga xwe kurdî – farisî yan bi navê Henbaneborîne de dibêje Kirmanşan koka xwe ji "Kirmancan" ango "Şarê Kurmancan" bi wateya gundî wergirdigire.

Bajar di dema Sasaniyan de hatiye avakirin. Dûre bajar bi dorê ketiye bin hikmê Emewî, Ebasî, Buweyhî (Alê Bûiyê), Heseneweyhî (Hesenewiye), Enaziyan, Selcûqî û dawiyê bajar ketiye bin hikmê Osmanîyan ku heya 1917an di bin hikmê wan de maye. Piştê jî ji hêla gelek hikûmetên din ên weke sefawî, efşariye, zendiye, qancar û hwd. ve hatiye îdarekirin.¹⁵³

Kirmanşah warê gelek ayînên kurdan ên kevn bûye û gelek şûnewarên kevn lê hene. Ayîna ku li wira herî zêde serdest bûye Ehlê Heq e.

Ehlê Heq firqeyek ji kurdan e ku li Kirmanşahê û hin herêmên din berbelav e, li Iraqê ji wan re Kakeyî tê gotin. Devoka wan goranî ye ku devokeke zimanê kurdî ye, li Azerbaycanê zimanê wan guheriye bûye tirkî û ji wan re Qereqoqyunlû tê

¹⁵² Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 390.

¹⁵³ Barcel Bazın, "Kirmanşah" *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 26, rr. 66-67, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/kirmansah>), (16.10.2019)

gotin. Navê pirtûka wan a pîroz Nameya Serencamê ye ku ji helbestên goranî pêk tê.¹⁵⁴

Ji ber ku ev cih jî di nava erdnîgariya tesewwufê de bûye, gelek weliyên mutesewwuf lê perwerde bûne. Ji ber ku nîştecihên wê kurd in, bêhtir bandora yên kurd lê çê bûye. Em ê li xwarê behsa çend kesên kurd bikin ku bi mijara me re eleqedar in.

2.12.1. Îbrahîm b. Şeybanê Kirmanşahî

Weliyekî kurd ê Kirmanşahê bûye. Ji aliyê tesewwufî ve di tebeqeya çarem de bûye. Navê wî yê din Ebû Îshaq e. Demekê welîtiya Cebelê kiriye. Murîdê Mexrîbî û Îbrahîmê Xewas bûye. Di ciwaniya xwe de bi zanyariyê hedîsê ve mijûl bûye. Ji kesên weke Elî b. Hesên b. Ebu'l-Enberî, Ebû Kilabe er-Rekaşî, Mihemmed b. Cehm es-Semîrî dersên hedîsê wergirtiye. Dûre berê xwe daye tesewwufê. Di warî de ji bo ku ilmê xwe zêde bike li derên weke Dînewer, Şam, Mekke, Medîneyê geriyaye. Li ber destên Ebû Ebdullahê Mexrîbî sîh salî perwerdehî wergirtiye. Mutesewwufên sextekar bi awayekî tund rexne kiriye. Li gorî wî xizmeta ji bo însanan pîroz e. Ev tişt ji bavê xwe hîn bûye û heya dawîya temenê xwe domandiye. Bal kişandiye ser felsefeya tesewwufê û nefsa xwe ya dunyawî ji dinyaya kapînok parastiye. Yê derdora xwe hertim hişyar kiriye. Ji wan re gotiye ku divê her tim meriv Xwedê û mirinê ji bîra xwe dernexe. Yekî camêr bûye gotiye ji dêleva ku hûn bibêjin “sola min”, bibêjin “solên me.” Ji ber vê nêrîna wî meriv dikare wî weke ehlê Futuvvetê bihesibîne.¹⁵⁵ Menqebeyên li ser Kirmanşahî:

Ebdulah b. Menazîl: *“Zêde zêde rêz dida feqîran.” Di sala 948an de çû rehma Xwedê.*

Dibêje: *“Kesê/a ku henekên xwe bi şêx û weliyan bike wê bibe rezîlê civakê.”*

Û wî jî gotiye: *“Derwêşekî digot, divê mirov nezîvire dîsa li mal û milkên xwe nenihêre. Nemaze sohbet têk diçe.”*

¹⁵⁴ Mohammad Raof Tavakoli, *Tarikhe Tasavof Dar Kordestan*, r. 12.

¹⁵⁵ Erhan Yetik, *“Îbrahîm b. Şeyban” TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 21, rr. 352-353, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/ibrahim-b-seyban>), (16.10.2019)

Û wî jî gotiye: "Bavê min gote min, fêrî ilmê zahir bibe da ku tu bigihîjî heqîqetê. Yan na, heger tu bê ilm herî ber Xwedê tu yê bextewer nebî."¹⁵⁶

2.12.2. Muzeferê Kirmanşahî

Weliyekî kurd ê Kirmanşahê Muzeferê Kirmanşahî, ji aliyê tesewwufî ve di tebeqeya çarem de ye. Li Cebelê mezin bûye. Bi kesê weke Ebdulah Xeraz re sohbet kiriye. Mutesewwufekî navdar e. Mamosteyê Ebbasê Şair bûye. Menqebeyên li ser Muzefer:

Şêxu'l-Îslam: "Muzefer şev dikir sê beşan, ji sisiyan yek nimêj dikir, a dîn Quran dixwend û ya dawî dua dikir. Kelogirî dibû û malikên jêrê dixwend: "Evînê mar xiste himbêza min. Ne bijîşkek ne jî efsûnkarek dikare rehet bike. Lê dildara ku ez ji hiş birime. Li bal te ye, derman û nivişt ..."

Arif ew kes e ku dil û bedena xwe dide gel û mirovan. Her kesê ku rêzê ji bêrûmetan re bigire wê bela bêne serê wan. Divê mirov bi çavekî îbret binihêre. Divê mirov li gorî pêdiviyên xwe bixebite. Beriya ku mirin bê divê tu bi dilê xwe terka wê bikî. Jê re gotine kî feqîr e, Muzefer gotiye, ku pêdiviya wî bi kesî tune. ¹⁵⁷

2.13. Welîyên ji Mukriyanê

Wilayeta Mukriyanê yek ji wilayetên bakurê rojavayê Îranê ye ku dikeve navbera parêzgehên îroyîn ên Êrmiye, Sine û heta bigire beşek ji parêzgeha Tebrîzê û bajarên wek Meraxeyê jî digirtin nava xwe û di bin desthildariya hakimên Mukrî de bû. Ebdulqadirê Babanî derheqê erdnîgariya mîrektiya Mukrî de wiha dinivîse: "Dirêjahiya Muriyanê 10 û berahiya wê bi qasî 8 fersendan¹⁵⁸ e û li vê herêmê bi qasî 600 gund û bajarek heye." Ji hêla erdnîgariyê ve Mukriyan ji bakur ve digihîje Gola Êrmiye û Neqedeyê, ji rojhilat de digihîje Miyanduab û Tekabê û ji aliyê başûr ve jî digihîje sînorê Herêma Kurdistanê. Riza Qulîxanê Hidayet dibêje eşîra Mukrî ji walîzadeyên Kurdistana Mukrî ne ku di navbera Miyanduab û Meraxe û Kurdistana Erdelan û Êrmiyeyê de y"e û navenda hikûmeta wan Sawucbilax ango Mihabad e.

¹⁵⁶ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 371.

¹⁵⁷ *h.b.*, r. 374.

¹⁵⁸ Yekeyeke pîvanê ye. Her fersengek bi qasî 6 kîlometreyan e.

Piraniya çavkaniyên wek Mihemed Emîn Zekî Beg, Vasîlî Nîkîtîn, Cemîn Rojbeyanî, Îbrahîmê Efxem û hwd. ku qala dîroka herêma Mukriyanê dikin, Şerefnameya Bedlîsî wek çavkanî nîşan didin.

Di Şerefnameyê de bi awayekî eşkere hatiye gotin ku eşîra Mukrî (ku ser bi eşîra Baban e) di serdema hikûmeta siltanên Qere Qoyûnlû û Aq Qoyûnlû de, yanê derdora sedsala 15an hatine wê herêmê.¹⁵⁹

Cemîl Rojbeyan dîroknasê kurd di pirtûka xwe ya bi navê Fermanrewayanê Mukriyan derbarê navê Mukriyanê de dibêje ku ev peyv ji koka xwe "Muxreyan" bûye ku di serdema Med û Hexamenîş û Sasaniyan de muxên zerdeştî ji Hemedan, Pasargad, Textê Cemşîd û Tîsfûnê ji wê riyê derbas dibûn û diçûn agirgeha Azeguşnesbê li derdora Tekabê. Ev peyv piştî guherî û bû Muqriyan û Mukriyan.¹⁶⁰

Di dîroka vê herêmê de gelek bûyerên cuda rû dane û gelek serhildan pêk hatine ku du bûyerên wê di dîroka kurdan de gelekî deng vedane, yek komkujiya Mukrî ji hêla Şah Ebbasê Sefewî ve ku salekê piştî şerê Kela Dimdimê pêk hat û ya din jî Komara Kurdistanê ye ku di sala 1948an de ji hêla pêşewa Qazî Mihemed ve li Mihabadê hate damezirandin û piştî 11 mehan hate serkutkirin.

2.13.1. Ebû Ebdulahê Mukrî

Ji aliyê tesewwûfî ve di tebeqeya pêncem de bûye. Navê wî yê din Mihemed b. Ehmed b. Mihemed el-Muqrî ye. Bi kesên mîna Yûsif b. el-Huseyn, Ebdulahê Xerazê Razî, Muzefer Kirmanşahiyê Ruweym, Cerîrî û Îbnî Eta re sohbet kiriye.

Yek ji şêxên camêr bûye. Bi qasî pêncî hezar dînar jê re mîrate dimîne, xêncî erd û zeviyên. Ev pere bi temamî li xelkê feqîr belav kiriye. Di temenê xwe yê ciwan de tewafa xwe ya Hecê kiriye. Di sala 976an de çûye rehma Xwedê. Hinek şîretên wilo li mirovên misilman kiriye: *“Kesê/a ku bi rastî jî feqîr e, ew kes e ku xwediyê her tiştî ye lê tu tişt xwedîtiyê lê nake. Kesê/a ku bê minet xizmeta hevalê xwe bike, Xwedê wê tiştêkî bide wî/wê ku tu carî jê têr nebe. Kî ji min diyariyekê werbigire ez ê pir kêfxweş bibim. Nefsbiçûktî tebîeteke xweş e, kesê/a nefsbîçûk başiyê bi dijminê*

¹⁵⁹ Vasili Nikitin, *Kord o Kordestan*. Werger: Mohammad Ghazi. Niloofar, Tehran, 1988. r. 48.

¹⁶⁰ Jamil Rojbayani, *Farmanravayane Mokriyan*, Wergêr: Ahmad Sharifi, Beghdad, 1992. r. 9.

xwe re jî dike. Heger kesek jê hez neke jî yê wî wê li bal wî camêr be. Heger ji yekî nefret bike jî wê li bal ê ku jê nefretê dike rûnê û wê pê re sohbeteke xweş bike.”

Tevlî sohbeta Ebdulah Xeraz bûye û wilo gotiye: “*Kerem bike ferman bike şêxê min. Ez ê sê tiştan ferman bikim. Ya yekem, divê tu bi hemû yeqîn û baweriya xwe nimêja xwe ya ferz bînê cih. Ya duyem, divê tu hurmetê ji civaka misilman re bikî. Ya sêyem, ji bilî kesên ku heqên mirovan dixwin, tiştên ku di hişê te de ne, tu bînê zimên.*”¹⁶¹

2.13.2. Ebu'l-Qasimê Mukrî

Derheqê Ebu'l-Qasim de agahî kême, hema hema tenê Camî ser wî nivîsiye. Me jî tenê agahiyên ji Camî sîd wergirt. Ji aliyê tesewwufî ve di tebeqeya pêncem de bûye. Navê wî Cafer b. Ehmed b. Mihemed el-Muqrî ye. Birayê Ebû Ebdulahê Muqrî ye. Yek ji şêxên mezin ê Xorasanê bûye. Di rêça xwe de bêhempa û pir serkeftî bûye. Şêx Sulemî dibêje: “*Me di di nava şêxan de kesekî wek wî hêja nedît*” Bi kesên mîna Ibnê Eta, Cureyrî, Ebû Bekir bi Ebî Sedan û Ebû Eliyê Rûdbarî re sohbet kiriye û li Nîşabûrê çûye ser dilovaniya Xwedê.

Abû'l-Qasim gotiye: *Arif ew kes in ku merûfên wan ew mijûl bikin ku bi çavên erê yan na li xelkê binêrin.*¹⁶²

2.14. Welîyên ji Mûsilê

Bajarê Mûsilê li aliyê rojavayê çemê Dîcleyê dimîne. Navê Mûsilê ji bêjeyeke erebî pêk tê. Wateya navê wê bi erebî “wesl” lewra gihîştin e. Navê wê yê din “mewsil” e, tê wateya xaçeriyê. Binavkirina navê “xaçerê”yê paşxaneya wê ya dîrokî radixe ber çavên mirov. Bajarê Mûsilê ji berê ve ji ber ku navendeke bazirganiyê bûye, bûye bajarê mezin. Ji ber van sedemên jorîn gelek caran ev bajar hatiye talankirin, lewra bajar ketiye bin hukmê gelek milletên cuda. Dewletên weke Asûr, Sasanî, Bîzans, Emewî, Ebasî û hwd. maweyeke dirêj di bin hukmê Îslamê de maye. Ji ber vê paşxaneya wê ya dîrokî gelek millet lê bi cih bûne û civakeke kozmopolîtîk

¹⁶¹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 422.

¹⁶² *h.b.*, r. 423.

ava bûye. Ji bilî vê di dîroka Îslamê de gelek mutesewwuf tê de perwerdehiya xwe dîtine. Lewra ji bo şagirdên misilman bûye wargeha perwerdehiyê. Di Rojhilata Navîn de bi dehan milletên ciyawaz perwerdehiya xwe di medreseyên Mûsilê yên dînî de wergirtine. Her çi qas ereb lê zêdetir bin jî, gelek mutesewwufên kurd lê perwerdehiya xwe wergirtine û weke ku em ê li jêrê jî behs bikin, ji ber ku weliyên kurd li vira jiyana xwe ya dînî buhurandine bajar bi paşnavê wan ve hatiye binavkirin.

Mûsil piştî Bexdayê bajarê herî qerebalix ê Iraqê û hejmara şêniyên wê derdora milyonek û heşt hezar kesî ye. Beşa bajêr a sereke li perê rojhilat ê Dîcleyê dikeve û bajarê kevnar ê Nînewayê li rojavayê bajêr dimîne. Mûsil di sedsalên dehem, yazdehem ên zayînî de paytexta hikûmetên wek Hemdaniyan bûye. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem demekê ket destê Berîtanîyê. Ji ber paşxaneya wê ya dîrokî û her wiha bîrên wê yên niftê xwedî girîngiyeke mezin e. Gora Yûnis pêxember û gelek şênwarên dîrokî yên dînî li vî bajarî ne. Di dirêjahiya sedsala bîstem de Mûsil navenda pêkvejiyana qewm û etnikên cuda bû. Berî projeya erebîzekirina Mûsilê ji hêla Sedam û partiya Baasê ve, bi sedan sal Mûsil wek bajarekî bi piranî kurdnişîn dihat hesabkiri. Lê vê dawiyê piraniya şêniyên wê erebên sunî bûne. Li vî bajarî bi hezaran ereb, asûrî, kurd, tirkmen, ermenî û şebek dijîn.¹⁶³

2.14.1. Feth b. Eliyê Mûsilî

Li Mûsilê welî û kesayetiyeke mezin ê kurd bûye. Hemdemê Bişrê Xefî ye. Heşt salan beriya Bişrê Xefî, li gorî salnameya hicrî di sala 220î de û li gorî salnameya mîladî di sala 835an de çûye ber rehma Xwedê.¹⁶⁴

Menqebeyên li ser Fethê Mûsilî:

Li gorî menqebeyekê: *“Rojekê di taxan de digere dibîne ku xelk qurbanan serjê dikin. Li ser vê ji Xwedê re dibêje tişteki min tune ye ku ez qurbanî te bikim.*

¹⁶³ Sâmi Es-Sakkâr, “Musul” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 31, rr. 361-363, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/musul--irak#1>), (17.10.2019)

¹⁶⁴ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 179.

Tenê ev heye. Tiliya xwe dixwe qirika xwe û xwe difetisîne. Di qirika wî de xeteke kesk xuya dibe.”¹⁶⁵

Rojekê diçe mala Bişrê Xefî û dibêje: *“Eger tiştêkî xwarinê hebe, bîne em bixwin. Jê re xwarinê tînin. Hinekî dixwe û hinekî jê dixwe tûrikê xwe. Keçikeke wî dibîne û jê re dibêje fetih îmamê mutewekîlan e û xwarin hilda û bir*”¹⁶⁶.

Bişrê Xefî dibêje: *“Heger tewekula¹⁶⁷ te ji dil be zerera tiştên wilo nîne.*”¹⁶⁸

Şêxu'l-Îslam li ser Feth b. Elî Musilî wilo neqil dike: *“Heger tecerud¹⁶⁹ qewîn be milkê Hz. Silêman nayê zanîn. Lewra hebûn û nebûna wî dibe yek. Heger qewîn nebe, aqilê wî wê bi tiştên biçûk ve belasebeb mijûl bibe.*”¹⁷⁰

“Rojekê ji mezinekî re dipirsin gelo ilmê Feth heye? Yê mezin dibêj hema ya ku terka dunyayê kiriye besî wî ye.”

Ebû Ebdullahê Cela dibêje: *“Ez li mala Siriyê Seqetî bûm, piştî ku demek ji şevê derbas bû, rabû û kincên xwe yê paqij li xwe kir, min jê re got tu vî wextê şevê bi ku ve diçî? Got ez diçim hizûra Fethê Mûsilî. Dema derket derve nobedar wî digirin û dibin davêjin zindanê. Roja piştî wê destûr tê dayîn ku bi daran li girtiyan bidin. Dema ku celad destê xwe bilind dike ku lêxe, destê wî hişk dibe ji ber vê nekarî daxîne. Jê re gotin tu çima lêna xî, got kalîkek li hember min sekiniye û dibêje lê nexe, destê min ketiye bin fermana wî. Dema lê dinêrin, dibînin Fethê Mûsilî li wira sekiniye. Lewre li Sirî nexistin û ew berdan.”*

*“Rojekê Feth digirî û hêsirên xwîna jî çavên wî tên, jê dipirsin Ya Feth! Tu çima digirî? Dibêje dema gunehên min têne bîra min, xwîn jî çavê min diherike, divê giriyê min bi rîyan nebe, bi îxlas be.”*¹⁷¹

¹⁶⁵ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 178.

¹⁶⁶ Yê ku her tiştê xwe ji Xwedê re hiştiye, jê re stû xwar kiriye.

¹⁶⁷ Yê ku tiştêkî bike û li benda qedera xwe bimîne. Lewra piştî ku dike li hêviya Xwedê dimîne êdî.

¹⁶⁸ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 178.

¹⁶⁹ Kesê ku xwe ji her tiştên dinyayê safî dike.

¹⁷⁰ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 179.

¹⁷¹ *h.b.*, r. 179.

2.14.2. Qezîb el-Ban el-Mûsilî

Kunyeta wî Ebû Ebdulah e. Welîyekî kurd ê Mûsilê bûye. Qezîb el-Banê Mûsilî eshabê şêx Ebdulqadirê Geylanî û di pirtûka "*Futûhatê Mekiye*"yê de hatiye gotin ku şêx Ebdulqadir ew wek Mufredu'l-Hezret zaniye û gotiye ku ew ji mufredan e. Nivîskarê Futûhatê dibêje: Mufredûn cemaetek e ku derveyî dayîreya qutbê ne û Xizir eleyhî selam ji wan e.¹⁷² Îbrahîm b. Ehmed b. Qezîb el-Ban, Ebdulqadir b. Mihemed b. Qezîb el-Ban, Ebdullah b. Mihemed b. Qezîb el-Ban sê kesayetiyên navdar in ku li Helebê jiyane û ji nisleta Qezîb el-Ban bûne û di gelek çavkaniyan de qala wan hatiye kirin. Menqebeyên li ser Qezîb el-Ban el-Mûsilî:

Şêx Muhyîddîn el-Erebî: "*Me hinek ewliya dîtin ku diketin haletên sosret. Bi awayên sosret bi awayekî diketin awayekî din. Yên ku ew didîtin fikir dikirin ku li ser sûretê cismanî çê dibe. Lewra bawer dikin ku ev tiştên hanê rast in. Û dibêjin ev wilo çê bû ew wilo çêbû. Lê halbûkî yên ku wilo dibêjin, nizanin ku ji wê bizavê dûr in. Lewra me ev gelek caran bi çavên xwe dîtiye. Meseleya Ebû Ebdulahê Musûlî ku bi navê Qezîb el-Ban el-Mûsilî jî tê naskirin, wiha bûye. Nebê nebê tu vê înkâr bikî. Ku razên Xwedê di nava kesin alim de zêde û mezin e, û bi awayê eqlî nayê fêmkirin. Ango aqilê mirov nabire.*"

Şêx Ebdulahê Yafiî dibêje: "*Li gorî gotegotên ehlên ilmê, yekî got derwêş nimêj nake. Rojekê ji rojan rabûn da ku nimêj bikin, yê ku nimêj nedikir rûniştîbû. Yekî ji feqîyan jê re got rabe û tu jî bi cemaetê re nimêj bikî. Rabû bi wan re nimêj kir. Feqiyê ku jê re got rabe nimêj bike, li bal wî bû da ku binihêre bê nimêj dike yan na. Dema nimêj dike, yê feqî dibîne mîna ku yekî din ji dêleva wî nimêj dike. Feqî şaş dimîne! Heya ku çar rîket nimêj kir belkî çar kesan ji dêleva wî nimêj kir. Dema silava nimêja da zilamê yekem ku ji dêleva wî nimêj dikir ne li bal wî bûye. Piştî wê derwêş ji feqî re got Ya feqî! Em wilo li meseleyê binihêrin. Kîjan ji wan zilaman bi te re nimêj kiriye?*"

Şêx Ebdulah Yafiî wilo berdewam dike: "*Min meseleyeke wiha ji Qezîb el-Ban el-Mûsilî bihîstiye.*"

¹⁷² Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 754.

“Qaziyê Musûlê ev agahî bi temamî red dikir. Rojekê dît ku wa ye Qezîb el-Ban el-Mûsilî ji rê derbasî aliyê din dibe. Qaziyê Mûsilî dibêje gelo ez wî gilî bikim da ku cezê bixwe. Dema wilo xwe bi xwe dibêje ji nikşê ve Qezîb el-Ban dibe şiklê gur hinek wêdetir dibe weke bedewiyekî. Piştî van bûyerên derasayî qazî lêborîna xwe jê xwest da ku wî efû bike. Dûre qazî dibe murîdê wî.”

Ji Şêx Ebdilqadir re dibêjin: *“Qezîb el-Ban el-Mûsilî nimêj nake. Dibêje wisa nebêjin! Hertim berê wî li deriyê Ke‘beyê ye.”*¹⁷³

2.15. Weliyên ji Nîhavendê

Nîhavend, ne tenê li Hemedanê, li seranserê Îranê herêmeke herî kevnar e. Bi hezaran salan dîroka wê heye. Ev bajar berî hatina îslamê li nava Îranê, paytexta tevahiya erdnîgariya Îranê bûye. Li başûrê Hemedanê dimîne.

Şerê herî dawîn ê di navbera ereb û îraniyan de li Nîhavendê qewimiye, ev şer li gorî hin çavkaniyan di sala 19an û li gorî hinên din jî di salan 21ê ya hicriya qemerî de rûdaye û encamê de hêzên ereb ji ber hejmara eskerên xwe yê zêde û ji ber çekên xwe bi ser ketine. Bi vî şerê ku ereb jê re dibêjin Fethu’l-Futûh berxwedana îraniyan a sîstematîk bi dawî hatiye û bi reva Yezdgird re hikûmeta Sasaniyan dirûxe û ereb ber bi rojhilat ve diçin.¹⁷⁴ Nîhavend bi piranî ji ber şerê ku sala 642yan a zayînî di navbera îranî û ereban de derket tê naskirin. Bajarê Nîhavendê li Îranê ye. Li herêma Hemedanê ye, 60 kîlometreyan dûrî başûrê Hemedanê ye. Li rojavayê wê jî bajarê Kirmanşahê heye. 80 hezar serhejmara bajêr heye. Di bajêr de kurd, azerî, ermen û hwd. jiyane. Bajarê Nîhavendê ketiye bin hukma Daryûş, Sasanî, Sefewî û Osmanîyan û hwd.¹⁷⁵

2.15.1. Ebû Ebbasê Nîhavendî

Weliyekî kurd ê Nîhavendê bûye. Ehmed b. Mihemed b. Fezl ku wek Şêx Ebu’l-Ebbasê Nîhavendî jî tê naskirin, yek ji arif û weliyê sedsala çarem a hicrî bûye.

¹⁷³ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 755.

¹⁷⁴ Mohammadtaghi Imanpoor, Fatemeh Farokhi, “Barkhorde Aarab Ba Zanane Irani”, kov. *Nameye Bastan*, hej. 1-2, 2013. r. 67.

¹⁷⁵ İbrahim Sarıçam, “Nihâvend” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 33, rr. 98-99, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/nihavend--iran>), (17.10.2019)

Ebû Ebbas yek ji damezirînerên îrfan û tesewwufa îslamî ye ku li Nîhavendê ji dayîk bûye û hevdemê Uzedu'd-Doleyê Deylemî ye. Şêx Ebû Ebbasê Nîhavendî ji hêla mezinan ve bi leqebên pir bilind hatiye binavkirin. Wek mînak 'Ettarê Nîşabûrî wî wek "Muhteşemê Serdemê" û Camî jî wî wek "Yekaneyê Serdemê" bi nav kirine.¹⁷⁶

Derheqê dîroka wefata wî de agahiyên zelal berdest nînin, lê li yeqîn tê kirin ku ev weliyê mezin di salên destpêkê yên sedsala pêncem a hicriya qemerî li Nîhavendê çûye ser dilovaniya xwe û gora wî jî li cihekî bi navê Deriyê Şêx ku yek ji taxên herî kevnar ê bajêr e, hatiye definkirin. Şêxu'l-Îslam di warê tesewwufê de wî di tebeqeya şeşem de dizane. Navê wî yê dîn Ehmed b. Mihemed b. Fezl e. Şagirdê Caferê Xuldî û pîrê Emû bûye. Şêx Ebu'l-Ebbas navê Emû lê kiriye. Menqebeyên li ser Ebû Ebbas:

Şêxu'l-Îslam: *"Ebbas Feqîrê Herewî gotiye ku Ebû Ebbasê Nîhavendî wisa gotiye yê ku delîla wî ya ilm (tesewwuf) ne Xwedê be dijminê wî Xwedê ye."*

Şêxu'l-Îslam dibêje: *"Nîhavendî digot heger ehlê tesewwufê destê xwe yê rastê ji rastiye bigirin, divê destê çepê jê bikin."*

Dîsa Şêxu'l-Îslam dibêje: *Li Nîhavendê yekî neft difrote. Yekî pir rehet bûye. Lê hêdî hêdî xelk jê bi dûr ve ketine. Yekî ji Ebû Ebbas pîrsa wî merikî kiriye. Ebû Ebbas gotiye wilo difikirî ku malên wî bi bereketa derwîşan zêde dibe. Êdî malên wî ji feqîran heram bûye."¹⁷⁷*

Ebû Ebbasê Nîhavendî: *"Di destpêkê de min gelekî serê xwe bi softiyê re diêşand. Min diwazdeh salên xwe da ser vê meseleyê. Di encamê de min bi tenê dilê xwe lê rehet kir. Dinya û alem dixwaze ku Xwedê bi wan re be. Bi ya min ne wilo ye, bi ya min bila Xwedê dev ji min berde, kanî ez çi me, li ku me, ez dixwazim xwe bi xwe, xwe nas bikim. Di esasê xwe de ev peyva hanê Şêx Ebû Seîd Ebu'l-Xeyr jî gotiye: "Nahêlin ku mirov bi tena serê xwe bimîne. Kêm caran bi gel re be lê piranî bi Xwedê re be. Carekê ji caran xirîstiyaneke bihîstiyê ku di nava misilmanan de kesên xwedî feraset hebûne. Ev xirîstiyana çûye dergaha Ebu'l-Ebbasê Qesab. Ebu'l-*

¹⁷⁶ Attar, *Tezkiretû'l-Evliya*, rr. 824-825.

¹⁷⁷ *Nefahatu'l-Uns*, r. 295.

*Ebbasê Qesab gotiye tu li vira bi çi re mijûl dibî? Yê xirîstiyên wilo bersiv wî daye min xwest tiştekî hîn bibim. Piştî ji wira diçe Tekeya Şêx Ebû Ebbasê Nîhavendî. Li wira çar mehan dimîne. Nîhavendî tu tiştek jê pirs nekiriye. Piştî çar mehan dema ku xwestiye here. Nîhavendî jê re gotiye tu hew qasî li bal me mayî, ma tu hema tiştekî nabêjî? Tiştekî wilo ne durist e. Piştî vê meseleyê ew xirîstiyên derhal dibe misilman û piştî ku Nîhavendî diçe rehmetê dikeve dewsa wî.*¹⁷⁸

2.15.2. Cuneydê Bexdadî

Mîrê sofîyan bûye. Li gorî Martin Lings û hemû mutesewwufên Îslamê jî ku hemfîkr in, sofîyê herî mezin Cuneydê Bexdadî ye.¹⁷⁹ Ji aliyê tesewwuffî ve di tebeqeya duyem de bûye. Navên wî yê din Ebû Qasim, Qewarîrî, Zecac¹⁸⁰ û Xezaz in. Lewra di serdema xwe de bi van navan hatiye binavkirin û bi van navan navdar bûye. Ji ber ku bavê wî karê zicaciyetiyê kiriye navê Qewarîrî û Zecacê li pey wî xistine. Bi eslê xwe jî Nîhavendê ye. Ji berê de Nîhavend şûnewarên kurdan bûye. Lewra Cuneydê Bexdadî weliyekî kurd ê Nîhavendê bûye. Lê belê ew bi xwe dibêje ku ez li Bexdayê çêbûme. Ebû Sewrî xwendekarê wî bûye. Di temenê xwe de sî carî bi peyatî çûye Hecê.¹⁸¹ Li gorî hinekan jî mezhebê Sufyanê Sewrî bûye û bi kesên weke Sîrrî Seqetî, Haris Muhasibî û Mihemed Qesab re sohbet kiriye. Weke ku me li jorê jî got, di navan sofîyan de cihekî taybet wergirtiye. Gelek peyrewên wî hebûne. Mutesewwufên weke Heraz, Ruweym û Şîblî dane pey wî. Di sala 910an de çûye rehmetê.¹⁸²

Cuneyd heya bîst saliya xwe bi bazirganiyê re mijûl bûye. Di heman demê de li bal hiqûqzanê navdar Ebû Tahir perwerdehiya hiqûqê wergirtiye ku di warê hiqûqê de gelekî bi ser ketiye. Gelek xebatên hiqûqnasiyê kirine. Ev xebatên xwe bi piranî weke name ji hevalên xwe re şandine û vê dawiyê weke pirtûk hatiye tomarkirin.¹⁸³

¹⁷⁸ Cavit Sunar, *Ana Hatlariyle İslâm Tasavvufu Tarihi*, r. 292.

¹⁷⁹ Lings, *h.b.*, r. 127.

¹⁸⁰ Şûşe angos camfiroş, ji ber ku bavê wî ev kar kiriye.

¹⁸¹ Vassâf, *Sefîne-i Evliyâ*, c. 1, r. 48.

¹⁸² Camî, *Nefâhatu'l-Uns*, r. 48.

¹⁸³ Ahmet T. Karamustafa, *Sufism The Formative Period*, Typeset in Goudy by Koinonia, Manchester, and printed and bound in Great Britain by The Cromwell Press, Trowbridge, Wilts, Manchester, 2007. rr. 15-16.

Piştî vê di temenê mayî de, li ser tesewwufê rawestiyaye. Bi têgehên “muhebet”, “uns” û “fena”yê ramanên xwe yên tesewwufî berbelav kiriye. Li ser tesewwufê gotinên wilo gotine: “*Xwedê te dikuje û bi xwe ve zindî dike. Di tesewwufê de tenê Xwedê heye. Me hema wilo negot tesewwuf ha wiha ye, beravajî vê me ji bo nefsa xwe bi kar anî.*”

Lewra, di riya tesewwufê de ji bo Cuneyd mestbûn ji serxweşiya manewî girîngtir e. Çunkî bi baweriya wî nefis encaq bi mestbûnê ve bê têkbirin. Ji bilî vê li gorî Cuneyd ji bo ku mirov mertebeya tesewwufê derbas bike û xwe bigihîne wehdeta îlahî zuhd û taet şert e. Bi kurteyî Cuneyd şerîet û heqîqetê bi tesewwufê re temam kiriye. Ew dibêje ku dawîya tesewwufê serê tesewwufê ye. Lewra dawîya wê tune. ¹⁸⁴ Ji bilî vê gelekî li ser “tewhîd”ê sekiniye ku bi vê sekna xwe gelekî bandor li ser Îslamê kiriye. Lê ji aliyekî ve jî ji ber van fikran di dawîya sedsalên sêyem û duyem de muxalîfên wî serî li hember wî rabûne. Ya ku pê de diçû yekîtî û tekanebûna Xwedê bûye. ¹⁸⁵ Piştî xwendina destpêkê çû xizmeta Sîriyê Seqetî û ilmên manewî hîn bû. Gotinên Cuneyd di warê usûl û furûê de wek erbabê heqîqeta hucetê hatine zanîn û ew wek Seyilu’t-Tayife û Lisanu’l-Qedem bi nav kirine. ¹⁸⁶

Se'diyê Şîrazî hikayeteke wî wiha bi nezm kiriye:

Bihîst min ku Cuneydê di Sen'ayê dî
Seyek ku didanê nêçîr jê ketî
Hebû hêz ku rojek wekî şêrê har
Reben mabû wek roviyê pîr û jar
Seyê ku digirtin kuvî bi carekî
Di bin lingê pêz abû wek jarekî
Ku dît ew seyê natewan û neçar
Ji nanê xwe hawête berya wî par
Bihîst min Cuneydî digot pê girî
Kî zane kî qenc e, ez an ev mirî?¹⁸⁷

¹⁸⁴ Cavit Sunar, *h.b.*, rr. 42-44.

¹⁸⁵ Ahmet T. Karamustafa, *Sufism The Formative Period*, r. 16.

¹⁸⁶ Javad Noorbakhsh, *Pirane Tarîghat*, Khanghahe Nematollahi, Tehran, 1979. r. 23-25.

¹⁸⁷ Farisiya helbestê wiha ye:

Di sala 297 an 298an a hicrî de di temenê xwe yê 91 salî de li Bexdayê çûye ser dilovaniya xwe û li gotistana Şonîziye li rex gora Siriyê Seqetî hatiye definkirin. Berhemên Cuneydê Bexdadî ev in: el-Qesîdetu's-Sofîrye, es-Sirr fî'l-Enfasî's-Sofîyye, Dewau'l-Erwah, Risalet ila Beizi Exwanîh, Risalet ila Yehya b. Muaz er-Razî, Risalet ila Emr b. Osman el-Melikî, el-Êxlas û es-Sedeq, Mesail fî et-Tewhîd, Edebu'l-Mufter ila Ellah, Risale ila Ebîbekir el-Kesayî ed-Dînewerî, Kitabi Dewa et-Tefrît, Şerhi Şetehatet Ebî Yezîd el-Bestamî, el-Wesaya, Kitab ila Ebî el-Ebas ed-Dînewerî, Risalet ila Ishaq el-Maristanî û hwd. Gelek berhemên wî yên din jî hene ku me navên wan li vira negot.¹⁸⁸

Menqebeyên li ser Cuneydê Bexdadî:

Ebu'l-Ebbasê 'Ettar: *“Cuneyd serkêş û îmana me ye. Rojekê xelîfeyê Bexdayê ji Ruweym re dibêje “bêedeb!”*. *Ruweym jî dibêje ma ez bêedeb im? Min rojekê bi Cuneyd re sohbet kir. Lê qesta wî ev e ku kesên nivê rojekê bi Cuneyd re sohbet bike ew ne bêedeb e.*

Şêx Ebû Bekirê Hedad: *“Kesê bi aqil be wê weke Cuneyd be.”*

“Tê gotin ku di tebeqeyekê de sê kes bûne, yê çaran tunebûye. Li Bexdayê Cuneyd, li Şamê Ebû Ebdulahê Cella, li Nîşabûrê Ebû Osmanê Hîrî ye.”

“Carekê dema ku Cuneyd zarok bûye, bi zarokan re lîstîye, Siriyê Seqetî hatiye bal wî û jê re gotiye tu derheqê şikiriye de çi dizanî? Cuneyd jî wilo bersiv daye qenciya ku Xwedê bi mirov re bike divê mirov eksiya wê neke. Lewra divê mirov

شنیدم که در دشت صنعا جنید
سگی دید بر کنده دندان صید
ز نیروی سر پنجه شیر گیر
فرمانده عاجز چو روباه پیر
پس از غم و آهو گرفتن به پی
لگد خوردی از گوسفندان حی
چو مسکین و بی طاقتش دید و ریش
بدو داد یک نیمه از زاد خویش
شنیدم که می گفت و خوش می گریست
که داند که بهتر ز ما هر دو کیست؟

¹⁸⁸ Süleyman Ateş, *“Cüneyd-i Bağdâdî” TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 8, nr. 119-121, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/cuneyd-i-bagdadi>), (18.10.2019)

qenciya Xwedê bi tiştên xerab xerc neke ez hertim ji van peyvên Siriyê Seqetî ditirsiyam. Axirê rojekê min biryar da ku herim bal wî. Dema ez çûm, ji min re got bi xêra Xwedê ku ez li benda te bûm û wî ji min re got divê tu dîwaneke xwe ava bikî û sohbetan li gel mirovan bikî. Lê min bi xwe bawer nedikir ku tiştêkî wilo bikim. Min şevêkê di xewa xwe de Hz. Mihemed dît. Ji min re got "Bi însanan re sohbetê bike." Dema wilo ji min re got ez veciniqîm û hişyar bûm. Ez li benda sibehê mam da ku herim bal Siriyê Seqetî. Ez çûm bal wî. Wî ji min re got heya Pêxember nehata xewa te, te ji min bawer nedikir. Roja din, ez rabûm û min gazî xelkê kir da ku tiştên ji min re dihat xwestin pêk bînim. Dema sohbetên xwe li dar dixwe yekî xirîstiyaniyê jî tê sohbetên wî, lê cilên xwe yê xirîstiyaniyê li xwe nake. Kesê xirîstiyaniyê ji Cuneyd re dibêje Ya Şêx! Pêxember gotiye: "Ji feraseta misilmanan bitirsîn. Çunkî ew bi nûra Xwedê dinihêre." Wateya vê çi ye? Cuneyd dibêje bibe Misilman, çunkî dema wê hatiye. Hema li wira yê xirîstiyaniyê dibe misilman."

Îmam Yafî: "Xelkê bawer dikir ku kerametên Cuneyd hebûne. Lê halbûkî Cuneyd du keramet nîşan dabûn. Ya yekem dizanibû ku ew xort xirîstiyaniyê bûye, ya duyem jî fêhm kiribûye ku yê xirîstiyaniyê wê bibe Misilman."

Ji Cuneyd pirsîne: "Te ev ilmê xwe ji ku peyda kiriye? Gotiye heger cihê vê ilmê hebûya hûn ê jî peyda bikira. Tesewwuf ew tişt e ku demek be jî bêyî ku rêzdarî bike li bal Xwedê bi awayekî dilsoz taeta xwe bike."

Şêxu'l-Îslam: "Qesta Cuneyd bêyî lêgerîna heqîqetê, dîtîna û venihêrîna nixumandî ye. Çunkî heyîna lêger ragihandîna dîtîna ye. Ango heger yek ji heyîna xwe derbas nebe, nikare bigihîje asta heqîqetê. Îlm, ne ku mirov bi cezbe wînda bibe, divê cezbe di nava ilmê de wînda bibe. Çunkî wilo bixêrtir e. Lewra ew asta ku gihîştîyê asteke ilmî, tewhîd û bişeref e. Bala xwe bide ser Xwedê, çavên ku tu bi wan dibînî jê pêvtir li kesekî din nenihêrî da ku tu ji heqîqetê şaş nebî. Ya ku Cuneyd bi êşa xwe 'emel dike ji tiştên tewş bi xêrtir e. Yê ku taetê bike ji yê ku hurmetê bike çêtir e."¹⁸⁹

¹⁸⁹ Feridüddin Attar, *Tezkiretû'l-Evliya*, rr. 452-460.

Cuneyd: *“Hew ji xelkê ez xwendekarê Siriyê Seqetî me. Helbûkî ez xwendekarê Mihemed b. Qesab im. Ji Cuneyd re gotin tesewwuf çi ye? Wî wilo bersiv da: Ez nizanim, lê piştire wiha got tesewwuf tebîetêke bişeref e. Çunkî Xwedê tesewwuf amajeyî qewmekî bişeref, kesayetekî bişeref û zemanekî bişeref kiriye. Ango tenê Xwedê wan dizane. Dema wilo be mirovên ku li gorî wan ‘emel bikin Xwedê bi xelatên xwe xelat dike.”*

Şêxu’l-Îslam: *“Rojekê Cuneyd û Zunnûn bi hev re diçin bal Mecnûnê ku ji eşqa Leylayê dîn bûye. Cuneyd ji Zunnûn re dibêje çima Mecnûn wilo dîn bûye? Zunnûn dibêje ji ber ku dinya ji xwe re kiriye girtîgeh.”*

Ji Cuneyd dipirsin: *“Bela çi ye? Cuneyd dibêje divê mirov xwe ji belayê biparêze.”*

Yek ji Cuneyd re dibêje: *“Pîr û şêxên Xorasanê dinya û perdeya nefsê di sê cûreyan de li hev kirine. Cuneyd: Ew gotinên wan ji bo xelkê ne. Ji bo kesên alim tenê perdeyek heye. Mirov ‘emelê xwe tê de dibîne, xêran jê dibîne û bi nîmetan tê xapandin.”*

Şêxu’l-Îslam: *“Di navbera mirov û Xwedê de perde heye. Kesê/a ku tenê bi nîmetên Xwedê ‘emel dike, Xwedê perdeyekê din dixê navbera xwe û evdê xwe.”*

Wasitî: *“Kesên ku zêde zêde li benda nîmetan bin, xofa Xwedê nakeve dilê wan û divê mirov taeta xwe bi awayekî semîmî bikin da ku ew helak nebin.”*

Farisê Bexdadî: *“Zewqa taet û şîrkê yek e.”*

Şêxu’l-Îslam: *“Heger taeta ku tu dikî tu naecibînî ew bi te xweş nayê û tu jê kêfê nastînî. Heger tu bi taeta xwe pesnê xwe bidî tu yê şîrkê bikî. Li gorî fermana Xwedê taeta xwe bikî, bi ‘emelên xwe qayîl nebe, bispêre Xwedê. Çavên Şeytên kor bike.”*

Ji Cuneyd dipirsin: *“Ma dibe ku mirov ‘emelên baş neke û minetiya Xwedê bike?”*

Cuneyd: *“Her ‘emel wilo ye. Ango her ‘emel lêborîna li ber Xwedê ye û bi teşwîqa wî çê dibe.”*¹⁹⁰

Îsmayîlê Heqiyê Borûsewî: *“Cuneyd peyrewê mezhebê Sewrî bûye û heta bigire li ser vî mezhebî fitwa jî daye. Ji ber destên xwendekarê Îmamê Şafî ders wergirtiye.”*

Şêx ‘Ettar dibêje: *“Ji Sirî dipirsin dibêjin gelo murîdin hene ku ji merteba pîr bilindtir bin? Dibêje erê. Mebesta wî ev bûye ku mertebeya Cuneyd ji wî bilindtir bûye.”*¹⁹¹

2.16. Weliyên ji Qesrê Şîrînê

Îro Qesrê Şîrîn yek ji bajarên eyaleta Kirmanşahê ye. Bajar li Ostana Kirmanşahê, piştî Îslamabad û Kengawerê wargeha herî mezin e. Cîranên Qesrê Şîrîn ji rojhilat ve Serê Polê Zehab (bi kurdî Serpêll), ji başûr ve bi Gîlanê Xerb û ji rojava ve jî bi bajarên Başûrê Kurdistanê Xaneqîn, Qere Tepe û Şêx Lanqar re hevsînor e. Qesrê Şîrîn li ser xeta sînore Başûrê Kurdistanê dikeve. Her çend li bajêr û derdore lor û soranîaxêf hebin jî, lê niştecihên bajêr bi piranî bi zaravayê lekî û devoka Qesrî diaxivin. Zaravayê lekî ya Qesriyan, ku wek Pêşko jî tê binavkirin yek zaravayekî têkel e û ji hemû zarava û devokên din ên kurdî bandor wergirtiye. Hemû niştecihên Qesrê Şîrîn kurd in. Di nav niştecihên Qesrê Şîrînê de ji bilî mislimanên sunî, kurdên Şîe û yên Ehlî Heq jî hene. Ev bajar beriya hatina Îslamê yek ji navendên pîroz ên Zerdeştîyan bûye. Niştecihên Qesrê Şîrîn bajarê xwe wek ‘Qesr’ binav dikin. Di demên kevn de ji bajêr re Taxî Şîrîn jî hatiye gotin. Navê fermî ku îro jî tê bikaranîn, digihîje dema Sasaniyan.

Erdnîgariya Qesrê Şîrînê li Kurdistanê yek ji deverên gelek balkêş e. Êrdima bajêr ku dûrî rêzeçiyeyên Zagrosan dikeve, bejî û berî ye. Ji ber vê yekê havînan gelekî germ e. Li derdora bajêr hin girên nizm ên silsile-çiyayên Zagrosê hene. Herçend iqlîmeke germ û çolî li heremê serdest e jî, derdora bajêr bi daristanên kesk ve xemilandî ne. Li mehên biharê lehî û barana heremên bilind ku ber bi vê beriyê ve

¹⁹⁰ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 67-70

¹⁹¹ Vassâf, *Sefîne-i Evliyâ*, c. 1, r. 49.

dimeşe ritûbeta binê erdê diparêze û geş dihêle. Ji ber iqlîma erdîma heremê li derdora bajêr nebat û fêkiyên tropîkal tê gihandin.

Di dîroka kurdan de bi peymaneke di navbera dewletên Osmanî û Safewîyan de cihê xwe girtiye. Piştî şerên dîrdirêj di navbera herdu dewletên dagirkerên Kurdistanê, di sala 1639an de li bajarê Qesrê Şîrînê di navbera herdu alîyan de peymanek hate morkirin û sînorê herdu dewletan hate kifşkirin. Bi gotineke din, Kurdistan cara yekem ji alî van herdu dewletan ve bi peymana ku li vî bajarî hatibû morkirin, parçe bûbû. Sînorên îro bi vê peymanê hatine diyarkirin. Ev bajarê şîrîn bûbû şahidê vê karesetê tahl.¹⁹²

2.16.1. Şêx Îsmâîlê Qesrî

Weliyekî kurd ê Qesrê Şîrînê bûye. Yek ji sihabeyên Şêx Ebu en-Necîbê Suhrewerdî bûye. Bi Şêx Necmedînê Kubra re sohbet kiriye. Xirqeya¹⁹³ esil ji cem Şêx Nexmedînê Kubra li xwe kiriye, wî jî li cem Mihemed b. Mankîn û wî jî li cem Mihemed b. Dawûd, navdar bi Xadimu'l-Fuqera, wî jî li cem Ebu'l-Ebbasê Îdrîs, wî jî li cem Ebu'l-Qasim b. Remezani, wî jî li cem Ebu Yaqûbê Taberî, wî jî li cem Ebu Ebdullahê b. Osman, wî jî li cem Ebû Yaqûbê Nehrcûrî, wî jî li cem Ebû Yaqûbê Sûsî, wî jî li cem Ebdulwahid b. Zeyd, wî jî li cem Kemîl b. Ziya quddesullahu teala erwahihim û wî jî li cem Emîrulmuminîn Elî b. Ebîtalib û wî jî li cem pêxember ku salam û selewatên Xwedê lê bin, li xwe kiriye. Lewra ev silsile bi vî awayî dom kiriye.¹⁹⁴ Şêx Îsmâîlê Qesrî yek ji eshab û şagirdên herî baş ê Şêx Ebû Necîbê Suhrewerdî bûye û beşdarî dersên wî bûye û hemû ilmên zahirî û batinî bi taybet ilma fiqh û hedîsê xwendine. Hin kes dibêjin ku "Qesr Ronas" navê berê yê bajarê Dizfûlê¹⁹⁵ bûye. Yaqûbê Hemewî di pirtûka xwe ya bi navê *Mu'cemu'l-Bildanê* de li derbareyê Şêx Îsmâîl de wiha nivîsiye: "Wateya Qesr heman cih e ku navê wê Dizfûl e, gelek kesên xwedî ilm û navdar ji vî bajarî derketine, yek ji wan Îsmâîlê Qesrî ye. Ev şêx yek ji wan edîb û zahidan e ku di ibadet û riyazetê de gelekî têkoşer bûye û

¹⁹² Welat Baz, "Şîrîna Rojhilat Qesrî Şîrîn", Rojnameya Basnûçe, hej. 20, rr. 8-9.

(http://www.arsivakurd.org/images/arsiva_kurd/kovar/basnuc/basnuc_20.pdf), (18.10.2019)

¹⁹³ Ev adet jî weke yek ku bawernameya xwe ya derçûnê bistîne ye. Ji lew ra di nava vê silsileyê wateya wergirtina bawernameya ilmî ye.

¹⁹⁴ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 609.

¹⁹⁵ Ev bajar jî li başûrê Kirmaşanê dikeve û ser bi parêzgeha Xûzistanê tê hesêb.

yek ji zanayên ilmê hedîsê bûye. Di sala 557an de şagirdên hedîsê li cem wî ders xwendine û destûra riwayetê ji wî distandin." Menqebeyên li ser Şêx Îsmâîlê Qesrî:

“Rojekê Necmedînê Kubra diçe bajarê Dizfûlê, gelekî birçî, westyayî û nexweş bûye. Tu cihekî ji bo mayînê peyda nake, lewre li gorî deb û resma bajarên berê, diçe xanqaha Şêx Îsmâîl. Necmedîn Şêx Îsmâîl li ser minberê dibîne ku kincên qirêj lê ne. Li cem xwe dibêje ji alimekî wiha re dûr e ku kincên wiha qirêj li xwe bike. Lê gotinên biwate û bilind ên Şêx Îsmâîl berevajî kincên wî, gelekî paqij dibîne. Ji nişkê ve Şêx li cem xwe dibîne ku jê re dibêje: Ey talibê metlûbê, tevî ku ev kinc qirêj e, lê nimêjî ye.”

“Necmedînê Kubra sema' înkâr kiribûye. Rojekê di xanqahê de ji şêxan re dibêje sema' ji nexweşiya min zêdetir, min aciz dike. Şêx Îsmâîl destê wî digire û radike semayê û nêrîna wî diguhere. Piştî demekê dibêje şevêkê Şêx Îsmâîl ji ber germahiyan tê ber serê min û got: Dixwazî rabî? Min got: Belê. Destê min girt û ez rakirim û semayê, piştî ku ez baş gerandim û ez dame ser dîwêr, min got qey ez ê ji xwe ve herim, lê dema ez bi xwe ve hatim, min xwe tam tendirust dît û tu nexweşiyek bi min re nemabû. Roja piştî wê ez çûme cem wî û heyamekê li cem wî mam û jê tiştan hîn bûm.”¹⁹⁶

2.16.2. Ebu'l-Qasimê Qesrî

Ji bajarê Qesrê Şîrînê ye. Welîyekî kurd ê Qesrînê bûye. Yek ji murîdên navdar ê Cuneydê Bexdadî ye.¹⁹⁷ Zêde agahî derheqê jiyana wî de nîne. Me tenê ji Camî sûd wergirt. Menqebeyên li ser Ebû Qasimê Qesrî:

Ebû Ebdulahê Xefîf: “Rojekê ji min re got min bibe çolê. Min ew bir. Em rastî civatekê hatin. Civatê bi tawleyê dilîst. Ebu'l-Qasim hema li ber wan rûnişt û bi wan re bi tawleyê lîst. Ez ji ber vê reşwê aciz bûm. Ji nişkê ve xwe aciz kir û qutîka tawleya wan şikenand. Wan jî kêrên xwe derxistin da ku li Ebu'l-Qasim bixin. Ebu'l-Qasim ji wan re got kanî kêrên xwe bidine min ez bixwim.” Ez wê çaxê matmayî bûm. Min jê re got, te çima wilo kir? Wî wilo bersiv da min heger tu bi çavê ilmê

¹⁹⁶ Mohamad Hosein Hekmatfar, *Arefî Az Dezfool*, r. 12.
(<https://kashefedezfoly.blogspot.com/category/cat-14>), (23.10.2019)

¹⁹⁷ Ji ber ku murîdê Cuneyd bûye, lewre piştî serdema wî jiyaye.

Ledonî¹⁹⁸ binihêrî wê çaxê tu pirsgirêk çênabe. Lê min li yê ku tawle dilîstin bi çavên şerîatî nihêrî ji ber vê min xirabî dît¹⁹⁹ Ebu'l-Qasim pîr serê xwe berdida ber xwe. Min jê re got tu çima wilo serê xwe berdidî ber xwe? Gote min heft rojan carekê nan dixwar. Cinekî silav dida min, min ew nedidît. Min carekê jê re got heger min tu bidîtayî ez ê bextewar bibûma. Wexta min wilo got, min dît yekî xweşik xuya bû. Min jê re got tu kî yî? Got ez cinekî mumin im. Dema ez yekî weke te dibînim dixwazim pê re sohbetê bikim. Ji niha û pê ve dixwazim hertim te bibînim. Û em wilo bûne dost û heval. Gelek tişt rayî min dida. Rojekê got were em herin mizgeftê em hinekî li wira bimînin. Got dema em li mizgeftê sohbetê bikin kesek min nabîne wê te tenê bibînin û wê bibêjin ev dîn bûye. Min got em herin li dawîya mizgeftê rûnên bila kesek me nebîne. Em derbasî hundirê mizgeftê bûn û em rûniştin. Ji min pîrs kir tu van mirovan çawa dibîni? Min got hinek xewişî ne, hinek di xewê de ne û hinek ji wan jî hişyar in. Wî dîsa pîrs kir got tu zanî ku niha ew çi difikirin? Min got na. Dema min çavên xwe xurandin min dît ku li ser serê her yekî qijikek veniştîye. Qijikan seçavên xwe bi perperîkên xwe girtibûn. Dûre ji min re pîrsî ev ayeta Quranê tê bîra te? Kî ku berê xwe ji Qurana Xwedayê Rehman biguherîne, em ê jê re şeytanekî vebohtî (hazir) bikin, êdî ew şeytan hevalê wî ye.²⁰⁰ Ew qijikên li ser serên wan şeytan in. Bi qasî hileyên wan hene.”

“Cinekê hate bal min, ez pîr birçî bûbûm. Li bal min pariyekî nan hebû. Min ew nan xwar û ez pê têr bûm. Piştî demekê ew cin careke din dîsa hat û silav da min lê xwe xuya nekir. Cin wilo got me ji ber pêkanîna vê nefsê û musîbetan bi sebir karê xwe pêk anî. Lewra em wilo bi sebir li te digeriyan û me tu didîtî. Loma me tu ceribandî û me dît ku sebra te tune ye. Ew cin çû û êdî careke din nehat. Ji wê rojê ve heya niha ez ji ber vê serê xwe wilo berdidim ber xwe”.²⁰¹

¹⁹⁸ Bi nêrîna tesewwufî.

¹⁹⁹ Ev mesele di menqebeya Ebû Bekir Qesrî de jî heman derbas dibe. Li gorî Şêxu'l-Îslam ev mesele ya Ebû Bekir Qesrî ye ku bi ya Ebû Ebdillah Ebûl Qasim Qesrî ye. Lewra dibe ku du mesele wilo weke hevdu bin.

²⁰⁰ Sûreyê Zuxrufê, Ayeta 36.

²⁰¹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 406-407.

2.16.3. Ebû Bekirê Qesrî

Li Bajarê Qesrî Şîrîn ji dayik bûye. Welîyekî kurd ê Qesrînê bûye. Ji Qesra Hubeyre ye, lê li bajarê Şîrazê jiyaye. Welîyekî wilo navdar û xwedîşîyan bûye ku zanibûye kî li ku derê çawa guneh kiriye. Agahiyên li ser jiyana wî pir kêr in û yê heyî jî hemû *Nefahatu'l-Unsê* wek çavkanî nîşan didin.

Menqebeya ku Şêx Ebû Ebdulah bin Xeffî li ser Qesrî neqil kirine: “Qesrî rojekê ji rojan wilo ji min re got *rabe em herin çolê. Dema em bi rê de diçûn em pêrgî civatekê hatin ku bi tawleyê dilîstin. Qesrî silav li wan kir û hewl da ku li bal wan rûnê û bi wan re bi tawleyê bilîze. Ji şerman xwêdan di ser eniya min de avêt. Min got kanî bê wê xelk çi bibêjin. Lê tiştekî wilo sosret nebû, daket jêrê em dîsa bi rê ve çûn. Em dîsa pêrgî çend kesan hatin ku bi kişîkê dilîstin. Çû bal wan qutîka kişîkê ji destên wan girt, şikand û parçe kir. Du kesan xwe lê rakêşandin û kêr derxistin. Qesrî ji wan re got kanî wan kêran bidin ez ê bixwim. Ji ber vê ew ji tirsan revîrevî ji wira reviyên. Piştî vê min jê re got yê ku bi tawleyê dilîstin te dengê xwe ji wan re nekir, lê te ew teriqandin. Wî wilo bersiv da min min li yê ku bi tawleyê dilîstin bi awayê Ledonî²⁰² lê dinihêrî lewra wê çaxê tu pirsgirêk tunebû. Lê min li yê ku kişîk dilîstin bi awayê şerîtetê nihêrt û ji ber vê min bi xirabî dît”.²⁰³*

2.17. Welîyên ji Suhrewerdê

Suhrewerd herêmeke ser bi navçeya Xudabendeyê li parêzgeha Zencana Îranê ye û nifûsa wê zêdetirî 6 hezar kesan e. Bi sedan salan di destê kurdan de bûye û şênîyên wê niha bi zimanê azerî diaxivin. Her wiha ev bajar nêzî bajarê Bîcarê yê Rojhilatê Kurdistanê dimîne.

Li gorî gelek kesan dîroka Suhrewerdê vedigere berî îslamê û berî ku îslam were, Suhrewerd bajar bûye. Gelek şûnewarên wê yê dîrokî yê girîng hene, weke mînak nivîstekeke sabit û mektûb heye ku bi xetekî gir hatiye nivîsandin û ya serdema Zerdest e. Her wiha li ser kevîrên li herêma Suhrewerdê û kûzikên ku li wira

²⁰² Bi nêrfîna tesewwufî

²⁰³ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 353.

hatine dîtin, gelek nexşeyên cuda hene. Di nava şênîyên bajêr de meşhûr e ku dibêjin xelkê wira di destpêkê de kafir bûne û piştê bûne zerdeştî.

Hin vekolerên kurd li ser vê baweriyê ne ku Suhrewerd navekî kurdî ye û ji du beşên "sor" û "berd" ango kevir pêk tê û bi kurdî wateya kevirê sor dide. Parêzgeha Zencanê ku Suhrewerd beşek ji navçeya wê ya bi navê Xudabende ye.

2.11.1. Şêx Zîyauddînê Ebû en-Necîbê Ebdulqahirê Suhrewerdî (k.d., 563/1168)

Ziyauddîn Ebu'n-Necîb Ebdulqahirê Suhrewerdî di navbera salên 490 û 662yan ya hicrî de jiyaye û ji welî û meşayixên sofîyeyê bûye. Li herêma Suhrewerdê li nêzî Cîbalê hatiye dinyayê. Bavê wî Ebdullah b. Mihemed b. Emoyeyê Suhrewerdî û Şhabeddînê Umerê Suhrewerdî jî biraziyê wî bûye.²⁰⁴

Perwerdehiya xwe ya yekem li Cîbalê wergirtiye. Dûre çûye Îsfahanê bal Ebû Elî el-Haddad dersên hedîsê wergirtiye. Dêrora sala 507an (1113) Ebu'n-Necîb dihere Bexdadê li Medreseya Nizamiyeyê li bal kesên weke Esad Mîhenî (fikih), Zahir b. Tahir eş-Şehhamî, Ebû Bekir Mihemmed b. Ebdulbaqî el-Ensarî, Ebû Elî Mihemmed b. Seîd b. Nebhan dersên hedîsê wergirtiye. Di ciwaniya xwe de çûye Bexdayê û hînî ilmên fermî bûye. Li wira fikih, kelam baş hîn dibe. Çendekî mamostetiyê dike û dersan dibêje, lê piştê dev jê berdide û dest bi sofîtiyê dike. Dema bîst û pênc salî bûye ji bo jiyaneke zuhdiyane ji Medreseya Nizamiyeyê vediqete û dihere Îsfahanê bal Ehmed el-Xezelî da ku zuhdê baş hîn bibe. Bi xwe xebitiye û debara xwe kiriye û çendakî seqayî kiriye.²⁰⁵ Piştê dest bi we'zan kiriye û gelek nav û deng dide. Ew û xwendekarên xwe li kêleka Çemê Dîcleyê Medrese û kerwanserayekê çê dikin û dikin cihê feqîr û belengazan û civînên xwe jî ji her kesî re vekirî dihêlin. Di dawiya temenê xwe de dixwaze here Beytu'l-Muqedesê lê ji ber serdestî û gefên xaçparêzan nikare vî karî bike. Lewre Nûreddînê Zengî wî dihewîne û çendekî li Şamê dimîne û li wira polên we'zê li dar dixîne. Dawiya temenê xwe li Bexdayê derbas dike. Di zanistên mîna zahirî û batinî de xwediyê kemaleke bilind

²⁰⁴ Vassâf, *Sefîne-i Evliyâ*, c. 1, rr. 283-284.

²⁰⁵ Av firotiyê.

bûye. Gelek pirtûk nivîsîne. Bi 12 nişfan digihîje Hz. Ebûbekir. Ji terîqeta Ehmedê Xezalî ye.²⁰⁶ Di pirtûka xwe ya bi navê *Adabên Murîdan* de wilo dibêje: “*Di vê babetê de her kes hemfîkr e ku kesê/ ku bi halê xwe yê feqîr şîkur bike yan jî ji vî halê xwe memnûn be, çêtir e ji halê dewlemendiyê. Yê/a ku vê hedîsê pêş bike destê camêran ji yê hişk çêtir e û li dijî vê ya derkeve wilo dibêje destên camêran heger ew mal û milk di nava lepên wî de bi xêrê bê xerckirin wê baş be. Destên hişk bi tiştên dunyewî ve manewiyata xwe xerab dike. Ji ber vê, heger têkoşîn û camêrî bi nîrx be wê delîla feqîriyê bi ser bikeve.*”

Bi dehan berhemên wî hene. Em ê sê hebên girîng bidin: *Adab ul-Murîddîn, Esmâu'l-Husna, Xerîbu'l-Mesabîh* û hwd. Menqebeyên li ser Şêx Ziyaeddînê Suhrewerdî:

Di berhema xwe ya bi navê Dîroka Îmam Yafî de wilo neqil dike: “*Hevalekî Şêx Ebûn Necîb Suhrewerdî wilo digot rojekê ez û Şêx li sûka Bexdayê digeriyan. Ez çûm dikana qesab. Gewdeyê mîhê daleqandî bû. Şêx nêzikî gewdeyê mîhê bû, dema nêzik bû mîh peyivî. Ji ber vê dilê qesab çû, ket erdê. Piştî ku qesab bi ser hişê xwe ve hat tobe kir.*”²⁰⁷

2.17.1. Şêx Şehabeddîn Suhrewerdî

Di sala 1145an de li Suhrewerdê çû bûye. Ev cih li ser Zencanê ye ku ev der li ser eyaleta Cîbalê ya Iraqê ye. Ji ber ku ji binemala Hz. Elî tê bi paşnavên “bekrî”, “teymî” û “qureşî” re tê naskirin. Pirê caran hew ji vekoleran Suhrewerdî el-Maktûl e. Bavê wî Ebû Cafer Mihemmed demekê muderistiya Medreseya Nizamiyeyê dike. Dûre li medreseyê dibe qazî. Ji ber bêbextiyekê tê dardakirin. Dema ku bavê wî tê dardakirin Şehabeddîn hîn şeş mehî bûye. Dûre Şehabeddîn di şazdeh saliya xwe de dihere Bexdayê bal apê xwe Ebûn Necîb. Li bal apê xwe û çendîn aliman hînî ilmê fikhê û hedîsan bû. Bi pêşniyaza Ebdulqadirê Geylanî ku hevalê apê wî bûye, pêşiyê dev ji ilmê kelimê berdaye û ji bo irşadê çûye Besrayê. Di dema xelîfe Nasir Lidînillah pêşengiya teşkilata futuwetê kiriye. Di sala 628an de çûye Hecê û bi kesê

²⁰⁶ Reşat Üngören, “*Sühreverdî, Ebü'n-Necîb*” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 38, r. 35-36, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/suhreverdî-ebun-necib>), (18.10.2019)

²⁰⁷ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 281.

weke Îbnu'l-Fariz hevdîtin pêk aniye. Piştî vê ji kurên Îbnu'l-Fariz xirqeya terîqetê wergirtiye. Dawiya temenê gund çavên wî baş nedîtine dîsa jî bi arîkariya murîdan çûye we'zdayînan. Şehabeddîn di sala 632/1234an de çûye rehma Xwedê. Roja din li Verdiyeyê tê veşartin.

Şehabeddîn di damezrandina terîqetan de lewra di ciwaniya xwe de ji Ebdulqadirê Geylanî pêşniyaz wergirtiye, bi hemdemên xwe Evhaduddînê Kirmanî Muhyiddîn Îbnu'l-Arabî re sohbet kiriye û ji ber ku Evhaduddînê Kirmanî fikrên Ehmed el-Xezelî û 'Eynu'l-Qudatê Hemedanî pesend kiriye wî rexne kiriye. Ji ber vê çalakiyên xwe yên irşadî û ilmî xwe li ser sunitiyê ava kiriye.

Lîsteya berhemên şêx Şehabeddîn ên farisî û erebî li gorî lîsteya Şarezorî û hevrûkirina wê bi lîsteya di Ensîklopedyaya Îslamî de wiha ye: el-Muşari' we el-Mutarihat, et-Telwîhat, Hikmetu'l-Êşraq, el-Lemehat, el-Lewahu'l-Muadiye, el-Heyakil en-Nûriye, el-Muqawimat, er-Remz el-Mewmî, el-Mebde' we el-Mead, Bustatnu'l-Qulûb, Tewraqu'l-Enwar, et-Tenqîhat fî el-Usûl, Kelemetu't-Tesewuf, el-Bariqatu'l-Îlahiye, en-Nefehatu'l-Musawiye, Lewamiu'l-Enwar, er-Reqem el-Qudsî, Itiqadu'l-Hukema, Kitabu's-Sebr, Rîsaletu'l-Êşq, Rîsalet Der Haletê Tufûliyet, Resaliya Rojek bi Cemaseta Sofiyan re, Rîsaleya Eql, Şerha Rîsaleya Awaza Cebayîl, Rîsaleya Pertewname, Rîsaleya Luxetmoran, Rîsalet Xurtbetu'l-Xerîbe, Rîsaleya Sefîrê Sîmorx, Rîsaletu't-Teyr, Rîsaleya Tefsîra Ayatên "Min Kitabi'llah we Xeber 'en Resûlillah", et-Tesbîhat We De'ewat êl-Kewakib, Edeiyet Muteferiqe, ed-De'wet el-Şemsiyet, es-Sirac el-Wefab, el-Waridatu'l-Ilahiye bi teheyirati el-Kewakib we Tesbîhatuha, Mukatebat ila el-Mulûk we el-Meşayix, Kitab fî'l-Sîmiya'i, el-Elwah, Tesbîhat el-Uqûl we en-Nufûs we el-Enasir, el-Heyakil, Şerhu'l-Êşarat, Keşfu'l-Xetai'l-Îxwan es-Sefa, el-Kelimat ez-Zewqîye we en-Nukatu'l-Şweqîye, Rîsale (navê rîsaleyê nehatiye gotin), Muxtesereke Biçûk Di Hikmetê De, Eqlê Sor...²⁰⁸ Menqebeyên li ser Şêx Şehabeddîn:

Mela Yafîî derbareyê wî de wilo gotiye: *“Ew hosteyê dema xwe bûye, di zemanê xwe de kesayetekî tekane bûye. Lewra ji ber vî kêrhatina wî ya tesewwufî*

²⁰⁸ Hasan Kamil Yılmaz, “Sühreverdî, Şehâbeddin” TDV İslam Ansiklopedisi, c. 38, r. 40-42, (<https://islamansiklopedisi.org.tr/suhreverdi-sehabeddin>), 18.10.2019

însanên derdorê pê re şêwirîne, pirsên wan ên dînî bersivandiye. Di zanistên zahirî û batînî de bûye rêberê arîf, welî û şêxan bûye. Ji binemala Ebûbekirê Sidîq e. Di tesewwufê de peyrewê apê xwe Ebu Bekir Necîbê Suhrewerdî ye. Beşdarî sohbetên Şêx Ebdilqadirê Geylanî bûye. Ji bilî van gelek şêxên giregir nas kirine. Li gorî riwayetan li Girava Ibadanê bi Abdalan²⁰⁹ re maye. Di wê demê de Xizir jî dîtîye.”

“Şêx Ebdilqadirê Geylanî jê re gotîye tu yê dawîn î û navdar bûyî. Pirtûkên wî pir bûne. Evarîf, Reşefu'n-Nesayih, E'lamu't-Teqî hinek pirtûkên wî yên sereke ne. Dema ku bi kêşeyên dijwar re rû bi rû dima berê xwe dida Xwedê û diçû Kabeyê da ku pîrsgirêkên xwe safî bike. Şêxê Bexdayê bûye. Heger di nava terîqetan de pîrsgirêk çêbibûya pê re dişêwirîn. Hinekan name jê re dinivîstîn.”²¹⁰

“Ji Şêx Sadeddînê Hamewî re gotîye tu Şêx Şehabeddîn çawa dibînî? Hamewî, wilo bersivandiye, ew nûra eniya Hz. Mihemmed e.”²¹¹

2.18. Welîyên ji Êrmiyeyê

Hemû deverên herêmê ji ber rengîniya sirûştî xwe mîna seyrangeh û cihê geryana xelkê ne. Gundê Bendê li rojavayê Êrmiyê, herêma Mîrgewer, Tîrgewer û Soma Biradostê seyrangehên herêmê yên naskirî ne. Êrmiye zadgeha Zerdeşt û navendeke dînî ye. Piraniya dîroknivîs û coxrafîzanên îranî û Erebbên serdema piştî hatina Îslamê (Ibn-î-Hewqel, Hemdullah Mustewfî, Yaqût-î- Hemewî û hwd) bajarê Êrmiyê weke cihê jidayikbûna Zerdeşt bi nav dikin. Her wiha Êrmiye di çaxê desthilatdariya “Partî û Sasaniyan” de ziyartegeha Zerdeştîyan bûye. Gor an jî tirba dayika Zerdeşt ya bi nave Exdûbe niha li gundê Emebê an jî Enbê li herêma Tîrgewerê ye ku dikeve rojavayê bajarê Êrmiyê. Texmîna wê hindê ku Zerdeşt li Êrmiyê hatiye dinyayê ji ber vê ye ku gora dayika wî li gundê Embê û gora du kes ji huriyên hezretê Îsa Mesîh di kilîseyê Nene Meryemê ya bajarê Êrmiyê de ye, ev yek bûne sedem ku ev bajar wek yek ji mezintirîn navendên dînî bê binavkirin. Li gorî

²⁰⁹ Peyva “abdal” yan jî bi bilêvkirina kurdî evdal, ku peyveke erebî ye, tê wateyên jar, hejar, belengaz, perîşan hwd. Li gorî baweriya tesewwufa berê evdal ew kes bû ku pergala manewî sererast dikir û li gorî hedîsa Hz. Elî hezkiriyekî Xwedê bûye. Ji bo agahiyên berfirehtir li vê rûpelê binihêrin: (<http://www.yardimcikaynaklar.com/abdan-Nedir-kimlere-denir/>) (20.10.2019)

²¹⁰ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 315.

²¹¹ Vassâf, *Sefîne-i Evliyâ*, c. 1, r. 285

jêderên dîrokî, herêma Êrmiyê di destpêkê de cihwarê jiyana her du qewmên Pers û Mad û hemû êlên wan du netewên Arî bûye ku li rex erdên bi xêr û bêr ên li derdora Gola Êrmiyê ji bo karê çandiniyê, belav bûne.²¹²

Êrmiye navenda parêzgeha Azerbaycana Rojava ye. Wilayeta Êrmiyeyê û navê Êrmiyeyê di nexşeya Kurdistana mezin de ye. Êrmiye dikeve bakurê Rojhilatê Kurdistan û bakurê rojavayê Îranê. Êrmiye bajarekî dêrîn e ku li ser nav û dîroka wê ji aliyê gerok, vekolîner û nivîskarên ve gelek pirtûk hatine nivîsandin. Êrmiye, Wiramê yan Urmê bajarê duyem ê herî mezin ê Rojhilatê Kurdistanê ye. Nifûsa bajarê Êrmiyê li derdora 970.000 kesî ye. Xelkê Êrmiyê bi zimanê kurdiya kurmancî û zimanê azerî dipeyivin. Ji bilî vê ermen û asûrî jî qederekê hene.

Kurdnasê navdar Vladîmîr Fyodoroviç Mînorskî kevnariya bajarê Êrmiyê digehîje 4000 salan. Nîşanên huner û şaristaniyeta Kurdan li herêmê pir in. Birca Şûşe, kela Îsmâil Xanê Mezin, Kela Dimdimê û gelek kelehên din ji wan asarên dêrîn in ku li herêmê pir têne dîtin.

Kela Dimdimê yek ji avahiyên berî Îslamê ye ku destaneke kurdan a herî girîng ya şer û berxwedaniyê di xwe de dihevine. Li gorî hinek çavkaniyan ev keleh di dema desthilatdariya Sasaniyan de hatiye çê kirin. Kela Dimdimê li ser çiyayê Dimdimê ku ketiye navbera çemê Barendiz û Geliyê Qasimlûyê hatiye çê kirin. Ev keleh li ser riya Mehabad û Êrmiyeyê li rexê gundê Balanicê cih digire. Beşa kelehê ya bakur û her wiha di beşa başûr de jî hîn hin dîwarên wê hene ku pêwîst e were nûjenkirin. Di avahiyê de riyeke binerd heye ku dîwarên wê bi kerpîçan hatine çê kirin. Erdnîgariya wê kelehê bi awayekî balkêş e, ji ber ku di wê herêm an derbasgehê de şûnewarên kevnar û şaristaniya kurdan ên weke Girê Heseno, Kevirnivîsa (Ketîbeya) Kelaşîn, Mezargeha Firewtîş, Kela Textê Silêman û her wiha gelek şûnewarên din ên dîrokî cih girtine.²¹³

²¹² Osman Gazi Özgüdenli, “Urmîye” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 42, rr. 179-180 (<https://islamansiklopedisi.org.tr/urmiye>), (19.10.2019)

²¹³ Yaqûb Kurmanc, “*Danasîna Bajare Êrmiye û Kela Dimdimê*”, RiaTaza, Malpera Kurdî a çandî, hunerî û wêjeyî, (<https://krd.riataza.com/2017/10/05/danasina-bajare-urmiye-u-kela-dimdim/>), 19.10.2019

2.18.1. Ebû Hesenê Urmevî

Weliyekî kurd ê Êrmiyeyê bûye. Mezinekî tayifeyê bûye. Di serdema Husrî, Ebû Ebdulahê Rûdbarî û Îbnî Xefîf de jiyaye. Li Êrmiyê jiyaye û wira jî çûye ber rehma Xwedê.²¹⁴ Weliyekî xwedî kemal û sofîyekî xwedî zewq û hal bûye. Navê wî di nava şêx û arifên sedsala sêyem a hicrî de hatiye qeydkirin. Tê gotin ku bi şêxên wek Ebu'l-Huseynê Esrî, Ebû Ebdullahê Xefîf û Şêx Ebû Ebdullahê Rûdbarî re hevçax bûye û her yek ji wan hêjayan bi têra xwe deryayeke fezl û kemalê bûne. Ebu'l-Hesenê Êrmewî bi wan re murawid e²¹⁵ û mukatebe kiriye. Piraniya jiyana Ebu'l-Hesenê Urmevî li Êrmiyê derbas bûye û di nava xelkê herêmê de xwedî rêz û hurmet û meqam û menzeleteke bilind bûye. Dîroka wefata wî tam nayê zanîn, lê wer xuya ye ku di destpêka sedsala çarem de wefat kiriye û temenê wî di navbera 70 heya 80 salan de bûye. Hin berhemên vî weliyê giranqedir hene, lê tevî gelek vekolînan, ji bilî çend pirs û bersivên ku di risaleyêke bi navê "Berhevokek ji Gotinên Arifan" de nivîsiye.

Murîdek derheqê wefayê de pirseke wila lê dike. Şêx dibêje: "*Mirov nikare li tiştên ku vegeyare, vegere*". Murîd şîroveyeke zêdetir dixwaze, Şêx wilo didomîne: "*Ya ku bizanî ji bo çi hatiyî.*"

Ji Şêx Ebu'l-Hesen dibipirsin bê ka înzîwa û tekbûn baş e yan lihevciwîn û meclis û muxalif e? Urmiye dibêje: "*Bêyî civîn û muxaletetê nefis nagihîje kemalê û înzîwa piştî pêkhatina kemalê, derdikeve holê*".

Hin gotinên wî yên din:

"*Sefa û wefa her du birayên hev in.*"

"*Rûyê feqîrtiyê, nerind û kirêt e.*"

"*Nerehetiya fikir û tevliheviya wijdanê, ezabekî mezin e.*"²¹⁶

²¹⁴ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 390

²¹⁵ Sohbet.

²¹⁶ Mohammad Tamadon, Mahmood Ramiyan, Alaaddin Takish, *Bozorgan Va Sokhansorayane Azarbayjane Gharbi*, r. 11. (<https://ketabnak.com/book/51402/%D8%A%AF%D8%A>), (23.10.2019).

Menqebeya li ser Urmewî: Jê re gotine wefadarî çî ye? Gotiye: “*Dilsozî ew tişt e ku tu dev jê berdî û dîsa lê venegerî.*”

Dîsa jê pirs kirine, gotine wefadariya aliman çî ye? Wilo bersiv daye: “*Ev tişt e ku alim zanibe bê çîma hatiye vê dinyayê.*”²¹⁷

2.18.2. Ebû Bekir Yezdanyarê Urmevî

Weliyekî kurd ê Êrmiyeyê bûye. Ji aliyê tesewwufî ve di tebeqeya duyem de cih digire. Navê wî yê din Huseyn b. Elî b. Yezdanyar e. Şêwazeke wî ya tesewwufî ya taybet hebûye. Weliyên weke Şiblî û hinekên din şêwaza wî red kirine. Wî jî hin gotinên wan red kiriye. Di ilmên zahîrî û mijarên mîna muamele û merîfetê de pispor bûye.²¹⁸

Weliyekî sedsala sêyem bûye ku meketebeke taybet xwe çêkiriye, hinek şêxan bi başî behsa wî nekirine û bi bawer in ku Yezdanyar xwedî baweriyên taybet xwe bûye û wî hin heqîqetên ku bingehên sofiyan bûne înkâr kiriye.

Li dewsa dibistana niha ya Nevîdê Fethê Rizaiyê berê goristaneke bi navê Şêx Ebû Bekir hebû. Ev goristan ji du beşan pêk tê ku beşeke wê ku li dawîya kuçeyê ye biber e û berî ku bibe dibistan, goristanek bûye ku bi qasî 75cm heya metroyekê ji erdên derdora xwe bilindtir bûye û dihat gotin ku di binê wê de dexmeyer heye.²¹⁹ Beşa din ya goristanê ji vê beşê mezintir bû. Di başûrê vê beşa goristanê de gumbedekeke biçûk û kelefe û gelek kevnar hebû ku xelkê digotin gora arifekî navdar ê bi navê Huseyn b. Elî muleqeb bi şêx Ebû Bekir bûye ku goristan bi navê wî hatiye navlêkirin. Dema ku goristan li nava bajêr rakirine, ev gumbed hilweşiya û piştî ku xweliya wê rakirine, kevirê mermer hatibûye dîtin ku li ser wî ev nivîs hebûye:

"هذا قبر الشيخ الفاضل الكامل شيخ ابوبكر حسين بن علي ارموي يزداينار زينهارانى"

²¹⁷ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 390.

²¹⁸ *h.b.*, r.337.

²¹⁹ "Nevîdê Fethê Rizaiyê" tê wateya "mizgîniya rizgarkirina Êrmiyeyê". Berî niha navê Êrmiyeyê, Rizaiye bûye. Ji ber vê yekê jî ev nav li dibistanê kirine ku dema serleşker Tehmasîbî hatiye û bajar ji hêzên kurdan bi pêşengtiya Simko standiye, lewma ev nav lê kirine. Ev dibistan hê jî heye û li kolana bi navê Taliqanî li nêzî navenda Êrmiyeyê ye.

Yanê "ev gorî şêxê fazil û kamil Şêx Ebû Bekir Huseyn b. Eliyê Êrmewiyê Yezdanyarê Zîneharanî ye."

Piştî peydabûna vî kevirî, gor bo 20 metroyan wêdetir hate veguhestin û hîn jî di nava jûrekeke servekirî de ye ku piştî hinek xanî li derdorê hatine çê kirin. Deriyê wê tune ye û divê mirov ji pêlekanaan derkeve jorê.²²⁰ Ev gorî û jûra ku tê de bûye, gelek caran ji hêla nivîskarên pirtûkê ve hatiye dîtîn, lê kevir li wira nebûye û xwendayekî muemer daye zanîn ku kevir birine Tehranê û di Muzeya Îrana Bastan de tê ragirtin. Li ser kêvir hatiye nivîsandin ku şêx Ebû Bekir di sala 333yan a hicriya qemerî de wefat kiriye. Derheqê navên "Yezdanyar" û "Zîneharanî" û pêwendiya wan bi şêx Ebû Bekir re vekolînên berfireh hatin kirin, lê mixabin encameke baş derneket holê. Tiştê yeqîn ev e ku Şêx Ebû Bekir di nîveka sedsala sêyem di navbera salên 240 heya 333yan de jiyaye. Zîneharan navê gundekî kevnar ê Êrmîyeyê bûye ku niha navê wî guherandine û kirine Zermanlû. Nivîskarê *Telxîsu'l-Asarê* di binê navê Êrmîyeyê de bi êşkere wiha dibêje: "Êrmîye ji biladê Azerbaycanê ye û Şêx el-Arif ez-Zahid Huseyn b. Elî ji koka xwe ji wira ye û dibêje: Kurd bû û erebî diaxivî." Di wê pirtûkê de bi zelalî bal hatiye kişandin li ser kurdbûna wî.²²¹ Menqebeyên Şêxu'l-Îslam:

Ebû Bekir Yezdanyar Xwedê di xewa xwe de dîtîye û ji Xwedê re gotiye Xwedêyo pêdiviya min bi te heye. Xwedê jê re gotiye min her tişt daye te, ma min tu li hember êrişê sofîyan neparastibû?"

Rojekê hinekan jê re behsa têgeha destbendiyê (destên girêdayî) kirine û pirs a wê jê kirine. Wî wilo li wana vegehandiye: "*Tişt miştên vikîvala ne, guh nedine wan.*"²²²

Li ser sofîyan û redkirina wan gelek meseleyên Êrmewî hene. Di rewşa zahiriye de hişê wî tevlîhev bûye, di warê batiniyê de jî alîgirê heqîqetê bûye. Derbareyê wî de wilo hatiye neqilîkirin: "*Firişte nobedarê asimanan, alimên hedîsan nobedarê sunnetan, sofî jî nobedarê Xwedê ne.*"

²²⁰ Ev gotin a dema nivîsandina pirtûkê, yanê derdora 50 sal beriya niha ye.

²²¹ Mohammad Tamadon, *Bozorgan Va Sokhansorayane Azarbayjane Gharbi*, 2012. rr. 159-163.

²²² Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 135.

Şêxu'l-Îslam dîsa wilo neqil dike: “*Ebû Ebbasê Nîhavendî rojekê serê sibehê dibîne ku hemû sofî di xewê de ne, ji wan re wilo gotiye razên, hemû razên. Çimkî Ew (Xwedê) dixebite. Ji ber ku we hemû taet û fermanên wî pêk anîne, hûn dikarin rakevin, lewra mafê we ye. Wî jî gotiye hûn dibînin ez dijitiya sofîyan dikim? Bi Xwedê ez ne dijî wan im, tenê ji bo xatirê tiştên wila ji wan aciz dibim. Ji bilî vê, ez wan weke alim dibînim. Ez ji wan hez dikim da ku wilo nêzîkî Xwedê bibim. Lewra ya girîng ew e ku mirov hez kirina Xwedê di dilê xwe yê safî de bihebîne. Sohbeta Xwedê û Resûlê wî li ser her tiştî ye. Kesên ku hem tobe bike hem jî gunehan bike heger bi vî awayî tevbigere vegera li bal Xwedê heram e.*”²²³

2.18.3. Şêx Husameddînê Çelebî

Navê wî yê esil Şêx Husameddînê Hesên b. Mihemed b. Hesên b. Exiyê Tirk Tacu'l-Arifîn Şêx Mihemed Ebu'l-Wefayî Kurdî ye û Husameddînê Çelebî di destpêka Mesnewiya Mewlana de dibêje ku bi eslê xwe ji Êrmiyeyê ye. Piştî malbata wî koçî Konyayê dike. Çelebî di sala 1225/622an de li Konyayê ji dayîk dibe. Perwerdehiya xwe ya ilmî li Konyayê hildide û li wira dersdariyê dike. Ji ber ku bavê wî li Konyayê serdariya Exiyan dike navê “Îbnî Axî Turk” lê dikan.²²⁴ Wekî din, bi vê gotina jorê ku me behs kir kurdbûna wî wilo tê pesendkirin: “*Emseytu kurdiyyen we esbehtu Erebiyyen.*” Lewra bi şev weke kurd raketiye û sibehê weke ereb ji xewê rabûye. Ev gotin gotineke têkel e, lewra derbareyê Ebû Ebdulah el-Muştehîrê Babûnî (k.d., s.s., 4.), Şêx Tacudînê Ebu'l-Wefa (k.d., 500/1107), Huseyn b. Elî b. Yezdanyarê el-Urmewî (h., k.d., 333) û Baba Tahirê Uryan (h. ss., 5.) de jî di çavkaniyan de heman tişt derbas dibe. Lê Camî di *Nefahatu'l-Unsê* de dibêje ev gotin li ser Ebû Ebdulah el-Muştehîrê Babûnî (k.d., s.s., 4.) hatiye pesendkirin. Li gorî qenaeta Alkış ev gotina hanê li ser Şêx Ebu'l-Wefa ye, lewra dema mirov çavkaniyan dide li ber hevdu ev îdia piştrast dibe.²²⁵ Ji bilî vê, kesayeta Çelebî bi xizmeta wî ya ku ji Mewlana Celaledînê Rûmî, berhema wî ya navdar “Mesnewî” û avakirina Mewlewîtiyê girîng e.²²⁶ Weke ku tê zanîn berhema Mewlana ya Mesnewî

²²³ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 135.

²²⁴ Abdurrahim Alkış, “Mesnevî'nin İnşasında ve Mevleviliğin Müesseseseleşmesi Sürecinde Çelebi Hüsameddin'in Yeri”, *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, c. 13, hej. 2, 2011. rr. 6-7.

²²⁵ Abdurrahim Alkış, *h.g.*, r. 6.

²²⁶ *h.g.*, rr. 1-4.

di nava nivîsîna dîroka nerîta Îslamê de berhema herî girîng e ku ne tenê li nav gelên Rojhilata Navîn belkî di nava hemû gelên cîhanê de deng daye ku hîn jî gotinên wî yên Mesnewiyê dibin referansên gelek pirtûkên Îslamê.²²⁷ Çelebî di nivîsandina vê berhema bêhempa de bûye îlham, ji ber vê navê berhemê yê din “Husamîname” ye. Mewlana di her cilda Mesnewî û Mektûbatê de pesnê Çelebî dide. Ji bilî vê, Çelebî piştî wefata Mewlana qedera deh salan postnişîniya Mewlana ava dike. Piştî gora Mewlana ava dike ango dergaha Mewlana çê dike. Dûre li wira weke dîwanekê saz dike û nusxeyeke resen a Mesnewiyê dide nivîsandin, bi vê dest bi dersên Mesnewiyê, nerîta Mesnewîxaniyê û semayê dike.²²⁸ Camî di *Nefehatu'l-Unsê* de bi tu awayî behsa jiyana Husamedîn nake. Yekser wilo behs dike: Dema Selahadîn diçe ber rehma Xwedê, Mewlana bi tevahî ji Husamedînê Çelebî hez dike. Mewlana Husameddîn dike xelîfeyê xwe. Mewlana gelekî ji Husameddîn hez dike. Bandora Husamedîn li ser nivîsîna berhema navdar “Mesnewî”yê jî gelek e. Li gorî Camî, Mewlana gotiye û Husameddîn nivîsiye û carinan bi dengekî bilind ji Mewlana re xwendiyê û nêrînên xwe jê re gotiye. Vê jî bandoreke pir li ser Mesnewiyê kiriye. Di sala 1285/684an de li Konyayê çûye ber rehma Xwedê. Gora wî li kêlaka gora Mewlana ye.²²⁹ Menqebeyên li ser Çelebî:

Çelebî deh salan piştî wefata Mewlana diçe ber rehma Xwedê. Eflakî li ser vê menqebeyeke wilo neqil dike: *“Rojekê Çelebî bi hevalên xwe re diçe nava rezên Humamê ya Meramê. Civateke mezin li wira kom bûye. Ji nişkê ve derwêşek tê û nûçeyêke wilo nexweş neqil dike. Alema “Kubeyî Hadra” kete “Turbeyî Mutahara” û derzeke mezin çê bûye. Çelebî pir li ber dikeve û li çongên xwe dixê. Hevalên wî jî xwe ji giriyan dikujin. Piştî demekê Çelebî dibêje li dîroka wefata Mewlana binihêrin. Dostên Çelebî lê dinihêrin û fêm dikin ku deh sal bêqisûr derbas bûye. Bi vê re bûbû yazndeh sal. Ji nişkê ve wechê wî hate guhertin û weke pelên daran ricifî. Ji hevalên xwe re got min bibin malê. Nexasim peymanî me ya din wextî tije bibe. Êdî dema koçkirinê ye. Divê em ji vê rizgar bibin. Dema ku dostan mizgîniya pevgihanê da, divê mirov li ser hişê xwe ve herin. Ê ev malikên jêrîn gotin: Ji sûretê beden re bibêje, bile here, ez kî me? Neqîş kê nabe, çunkî ez edebî me. Madem*

²²⁷ H. Ahmet Sevgi, “Hüsameddin Çelebi” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 18, r. 512 (<https://islamansiklopedisi.org.tr/husameddin-celebi>), (19.10.2019)

²²⁸ Abdurrahim Alkış, *h.g.*, r. 1

²²⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 313.

Xwedê dibêje heger hûn dilsoz bin mirinê arezû bikin. Ez dilsoz im, ez giyanê xwe feda dikim. Piştî vê gotinê, wî li hespekî siwar dikin û dibin malê. Piştî ku wî dibine malê dihere ber rehma Xwedê. ²³⁰

2.19. Weliyên ji Xorasanê

Xorasan li bakurê rojhilatê Îranê ye û bi welatên Turkmenistan û Efxanistanê re hevşînor e. Berî çend salan li ser sê parêzgehan hate dabeşkirin ku wek Xorasan Bakur (Xorasanê Şomalî), Xorasan Rezewî (Xorasanê Rezewî) û Xorasan Başûr (Xorasanê Conûbî) têne naskirin. Rûbera wê herêmê bi giştî 15,444 mîlê çargoşe ye. Li vê herêmê gelek nijad û etnîkên cihêreng dijîn ku birîtî ne ji: Kurd (Kurmanç), Belûç, Lor, Tirk, Tirkman, Sîstan, Efxan û Ereb û Tat. Weke ku li dîrokê heye gelek ji van etnîkên ku li Xorasanê²³¹ dijîn ji deverên din hatine û li wira bi cih bûne. Dema mirov li cografîyaya Îranê dinêre dibîne ku Xorasan cihekî stratejîk e û hertim dewletan xwestiye vê herêmê li hember êrişên biyaniyan biparêzin. Ev mijar di dirêjahiya dîrokê de bûye sedema gelek koçberiyên. Bi taybet piştî ku hikûmeta Sefewîyan hate damezirandin û mezheba şîî bû mezheba Îranê ya fermî, şerê di navbera Sefewî û welatên cîran ên weke Osmanîyan û yên din de gurr bû û hertim jî kurd bûne qurbanîyên wan pevçûnan.²³² Di pirtûka *el-Buldan* a Ehmed b. Ebî Yeqûb ku yek ji sê berhemên herî girîng ên sedsala sêyem a hicriya qemerî ye, tevahiya herêmên han di bin sernavê Xorasanê de hatine û wek Nahiyeya Şerqî hatine binavkirin. Di wê berhemê de Nahiyeya Şerqî herêmeke pir berfireh digire nava xwe ku herêmên wê yên girîng ji aliyê Bexdayê ve wiha hatine rêzkirin: Herêma Cebelê (Iraqa Ecem), Semere, Hilwan, Nînewer, Qezvîn û Zencan, Azerbaycan, Hemedan, Nîhavend, Kerec, Qom û derdorên wê, Îsfahan, Rey, Qums, Teberistan, Gurgan, Tûs, Neyşabûr, Merv, Bûşenc, Badfîs, Sîstan, Kirman, Taliqan, Cuzcan, Belx, Mervrûd, Buxara, Xetl, Semerqend, Ferxane, Taşkend, Çaç.²³³ Kelîmullahê Tevehudî di berhema xwe ya navdar a bi navê *Koça Kurdan a Dîrokî Ber bi Xorasanê ve* de dibêje ku ji dema Şah Îsmayîlê Sefewî ve kurd bi taybet kurdên Qehremanlû bi

²³⁰ Abdurrahim Alkış, *h.g.*, rr. 11-2.

²³¹ Mebesta min ji Xorasanê, Xorasan mezina a berî ku bibe sê parçeyan e.

²³² Mehdî Jafarzadeh, *Dîroka Kurdan li Xorasanê*, Semînera Lîsansa Bilind a Bitez a çapnebûyî, Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016. r. 7.

²³³ Alexnder Belenitski, *Xorasan Ve Maverau'n-Nehr*, Wergêr: Pervîz Vercavand, Tehran 2013. r. 21.

awayê berbelav ji bo parastina sînorên Xorasanê ber bi wê eyaleta ziyandîtî ve hatin şandin û ev siyayet ji hêla cîgirên Şah Îsmayîl ve jî hat şopandin û kurd ber bi Xorasanê ve hatin veguhestin.²³⁴ Kurd weke netewekî îranî li vê erdnîgariyê dijîn û bi hezaran sal in ku niştecihê rojhilatê Îranê ne. Wilo ku diyar e berî şerê Çaldiranê, Kurdistan bi giştî li ser dewleta sefewiyan bûye lê piştî ku şerê navbera osmaniyan û sefewiyan derket, pareke mezin ji Kurdistanê jê cihê kirin û kete bin deshilatdariya osmaniyan. Kurdên Xorasanê ji aliyê wêjeyê ve gelek çalak in û du helbestvanên wan ên klasîk ên bi navê Ibnê Xerîb (ss., 18.) û Ceferquliyê Zengilî (Sedsala 19an) hene ku dîwan û helbestên wan ên kurdî berdest in. Her wiha ji navdarên wira yê kurd mirov dikare Êvezxanê Celalî û Cecoxan bi nav bike ku dijî Turkmenistan û rûsan serhildanên mezin çê kirin û Mehmûd Dewletabadî, romannivîsê navdar ê Îranê jî li ser serhildana Gulmihemedê Kelmîşî romaneke farisî bi navê Kilîder nivîsiye ku yek ji romanên herî navdar ê Îranê ye. Elîekber Dihxoda di ferhenga xwe ya navdar de Xorasanê wek rojhilat wate dîke.²³⁵ Kurdên ku niha di nava sînorên Îranê de dijîn li parêzgehên Kurdistan, Azerbaycana Rojava, Kirmanşan, Îlam, Xorasan û Loristanê dijîn. Berfirehbûna cografîyaya deverên kurdnişîn û cîrantiya bi netew û etnîkên cûrbicûr re bûye sedema pirrengî û pirçandîbûna kurdan, ji hêla ziman û baweriyê ve ev tişt pir xuya dîke, bawerî û dînên cihêreng weke misilmanên sunnî, şîî, ehlê heq, yarsan di nava kurdên Îranê de hene.²³⁶ Dîne ku me eleqedar dîke misilmantî ye û weke mezheb jî sunnî ne. Ev bi xwe meyla mijara me ye. Niha em ê li jêrê yeko yeko li ser weliyên erdnîgariya Xorasanê rawestin bê kanî ve zat kî ne.

2.19.1. Dawûd el-Belxî

Dawûdê Belxî yek ji şêxên kurd ê mezin ê tesewwufa Îranê di sedsala duyem a hicrî de bûye. Li Xorasanê mezin bûye û li gelek cihên wek Iraq û Erebiştanê geriyaye. Zêde agahî li ser Belxî nîne. Ji ber vê em tenê serî li Camî dixin. Menqebeyên li ser Belxî:

²³⁴ Kalimollah Tavahodi, *Harakate Tarikhiye Kord Be Khorasan*, c.1, Vase, Mashhad, 2006. r. 25.

²³⁵ Luxetnameya Duhxoda yek ji luxetanameyên farisî ye herî navdar e ku ji hêla Elîekber Duhxoda ve hatiye nivîsandin.

²³⁶ Mehdî Jafarzadeh, *Dîroka Kurdan li Xoresanê*, h.ç., r. 12.

Îbrahîmê Edhem li ser wî wiha dibêje: *“Di navbera Kûfe û Mekkeyê de ez bûm hevalê mêrikekî, dema nimêja mexribê kir, piştî du rike’etê sivik kirin û li bin lêvên xwe de tiştêk got. Li aliyê destê wî yê rastê tasikeke tijî terîd²³⁷ û kûpîkekî avê peyda bû. Bi xwe xwar û vexwar û da min jî. Min ev bûyer ji şêxekî ku bi xwe xwedanê ayat û keramatan bû re got, şêx gote min lawo! Ew birayê min Dawûd e û wî hew qasî qala Dawûdî kir ku hemû kesên di wê civatê de giriyan. Piştî got ew xelkê gundekî Belxê ye û hemû gundê navçeyê şanaziyê bi wî gundî dikin ku Dawid ji wî gundî ye. Şêx ji min pirsî, çi hînî te kir? Min got ismê e'zem. Got kîjan e? Min gotê ew di dilê min de hinkî mezin e ku ez nikarim bînim ser zimên.”²³⁸*

2.19.2. Ebû Zeydê Merxeziyê Xorasanî

Weliyekî kurd ê Xorasanê ye. Dihxuda di luxetnameya xwe de dibêje Merxe rengdêrek e ku ji bo xelkê bajarê Mervê tê bikaranîn. Lewre em tê digihîjin ku Ebû Ziyad xelkê bajarê Mervê bûye. Merv yek ji bajarên herî kevnar û dîrokî ye li Xorasanê. Menqebeyên li ser Xorasanî:

Şêxu’l-Îslam dibêje: *“Xace Ebû Zeydê Merxezî feqiyê Xorasanî diçû Hecê, dema ku gihîşte Kirmanşahê li wira rastî Îbrahîmê Şeybanî hat. Wê salê neçû Hecê û ji bo avakirina dilê xwe hevaltiya wî hilbijart. Paşê sê caran çû Hecê. Dema ku Xace Ebû Zeyd çû rehmêtê, wê rojê baraneke wisa guj dibariya ku tu kesî nekaribû derkeve derve. Demekê di malê de çal kirin (xistin gorê) ku paşê ji gorê derxistin. Dema ku xwestin ji gorê derêxin, di gora xwe de nebû.”*

Şêxu’l-Îslam digot: *“Wî ew wilayet ji fiqhê bi dest nexistibû. Belkî ji wî pîrî û hevsohbetiya pê re peyda kiribû.”²³⁹*

2.19.3. Şêx Ehmed Neccar Esterabadî

Şefîê Kedkenî di pirtûka xwe ya bi navê *Esraru’-t-Tewhîd* de dibêje: *“Subkî qala kesekî bi navê Ehmed b. Îbrahîmê Necar dike ku muhendisekî Nîşabûrê bûye û*

²³⁷ Xwarineke ku nanî hûr dikin goşt û ava wê berdidin ser û dixwin.

²³⁸ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 182.

²³⁹ *h.b.*, r. 371.

di şerha ehwalê Elî b. Ehmedê Wahiyê Nişabûrî de dibêje ku Wahidî ji zarokê Ehmedê Nekar bihîstiye ku hevçaxê Ebû Seîd bûye."²⁴⁰

Her wiha dibêje ku Şêxu'l-Îslamê Ensarî qala Ehmedê Çêştî kiriye û gotiye ku wî Ehmedê Nekar dîtiye. Ebdu'l-Heyê Hebîbî vî Ehmedê Nekar û Ehmedê Nekarê ku di riya Amulê de heval û hemseferê Ebû Seîd bûye, yek dizane, lê Şefîê Kedkenî dibêje: "*Kesê ku ew, tevî ku di ciwanîyê de, dîtiye, nikare hemseferê xortaniya Ebû Seîd ê di riya Amulê de be.*"

Şêxu'l-Îslam dibêje: "*Ew şêxê Xorasanê ye û digel şiblî û Murteiş sohbet kiriye. Carekê Şiblî simbelê wî diqusîne êdî piştî hînga simbel çenedibût*".²⁴¹

2.20. Weliyên Din

2.20.1. Ebû Ebdulahê el-Muştehîr Babunî

Babûn gundekî derdora Bexdayê ye û Ebû Ebdullah di sedsala çarem de jiyaye û yek ji arifên wî zamanî bûye. Hatiye gotin ku Babûnî li tu medreserekê nexwendîye û erebî jî nizanibûye, ango bi gotineke din "umî" bûye. Lê di zuhd û teqwa û merîfetê de gihîştîye asteke bilind û bûye xwedî keşif û keramatan. Gihîştîye asteke wisa bilind ku her kes ji her alî ve ji bo bidestxistina ilm û irfanê berê xwe daye wî. Babûnî gotiye: "*Her kes ku afiyetê bixwaze, bêjin bile miyanerew bin.*" Û "*pêşketina murîdan di temkîn û rêzgirtina wan de ye.*" û "*mirov bi sê tiştan dikare xweşiya dunya û axiretê bi dest bixe: Yek mirov li pey eybên xelkê nekeve, didu mirov li ber dilê hevalên xwe ve were, sisê dilovaniya bi heval û kesên nêzîk re.*" Ebû Ebdullahê Babûnî di dawîya sedsala çarem a hicrî de li Şîrazê wefat kiriye. Gorî Babûnî li Şîrazê yek ji gorên navdar e.

Tê gotin ku wî gotiye: "*Emseytu kurdiyên we esbehtu Erebiyyên.*" Yanê ew kurd bûye. Lewra bi şev weke kurdekî raket û sibehê weke erebekî ji xew rabû.²⁴² Ev gotin gotineke têkel e, lewra derbareyê Ebû Ebdulah el-Muştehîr Babûnî de (h., s.s.,

²⁴⁰ Mohmmad Ben Monavar Ben Abi Said Ben Taher Ben Abi Said Mihani, *Esrar-ol Tohid Fi Maghamate al-Sheikh Abi Said*, Moghadame ve teshih: Mohammad Reza Shafi Kadkani, c.1. Agah, Tehran 2014. r. 39.

²⁴¹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 221.

²⁴² h.b., 222.

4.), Şêx Tacuddîn Ebu'l-Wefa (k.d., 500/1107), Huseyîn b. Elî b. Yezdanyar el-Urmewî (h., k.d., 333) û Baba Tahirê Uryan (h. ss., 5.) de jî di çavkaniyan de heman tişt derbas dibe.²⁴³ Lê Ebdurehmanê Camî di *Nefahatu'l-Unsê* de dibêje ev gotin li ser Ebû Ebdulah el-Muştehîr Babûnî (h., s.s., 4.) hatiye pesendkirin. Li gorî qenaeta Alkîş ev gotina hanê li ser Şêx Ebu'l-Wefa ye, lewra dema mirov çavkaniyan dide ber hevdu ev îdfîa piştrast dibe.²⁴⁴ Meseleya wî wilo ye: Ew ji malbateke kurd bûye. Rojekê ji rojan tê medreseyeke Şîrazê. Dema daxilî medreseyê dibe dibîne ku xwendekarên medreseyê fêrî ilm dibin. Pirsekê ji xwendekaran dike. Dema pirsra ji wan dike xwendekar dikenin. Piştî vê dibêje ez jî dixwazim fêrî ilmê we bibim. Xwendekar jî dibêjinê heger tu bixwazî herî mala xwe bi werisekî lingên xwe bi banê malê ve girê bide û bi dengekî hêlî bibêje 'kezbûreten usfûraten' da ku deriyê ilm li ber te vebe. Haya wî jê tune ye ku xwendekar henekên xwe pê dikin. Dihere mala xwe wan çawa gotibe weke wan dike û wilo dibêje. Ji ber ku yekî wilo henûn bûye serê sihebê dihere rehma Xwedê. Lewra digihîje heqîqeta Xwedê.²⁴⁵

2.20.2. Şêx Mihyedînê Ebdulqadirê Cîlî (Şêx Ebdulqadirê Geylanî)

Di sala 470/1077an de li herêma Gîlanê li bakurê Îranê li gundê Neftê ji dayik bûye. Bavê wî Ebû Salih Mûsa yekî dîndar bûye. Bavê wî li Bexdayê bi navên kesê "ne ereb", "biyanî" hatiye binavkirin. Kesê ku wilo bê binavkirin û ku ew kes li herêmekê kurdan be jixwe çavkanî jî destnîşan dikin ku kurd e. Binemala Geylanî digihîje heya Hz. Elî. Hîn dema ku biçûk bûye bavê wî çûye rehma Xwedê. Ji ber vê li bal dê û apê xwe Savmaî mezin bûye. Dema ku dihere dibistanê xelkên derdorê yeqîn dikin ku ferîşte wî diparêzin. Lewra hîn dema biçûk bûye keramet nîşan daye. Armanca tehsîla wî ya mezin çûna Bexdayê bûye. Di hejdeh saliya xwe de destûrê ji dêya xwe dixwaze tevî kerwanekê dibe û dihere Bexdayê. Li wira bi kesên weke Ebû Galib b. Bakillanî, Cafer es-Serrac, Ebû Bekir Sûsen û Ebû Talib b. Yûsiv hedîs, ji kesên weke Ebû Sad el-Muherrimî, Ebû Hattab û Kadî Ebû Huseyîn fikih, ji kesên weke Zekariya Tebrîzî jî dersên wêjeyê wergirtiye. Di van salan de bi mutesewwufê

²⁴³ Abdurrahim Alkîş, *h.g.*, r. 4.

²⁴⁴ *h.g.*, r. 6.

²⁴⁵ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 222.

weke Ebu'l-Xeyr Mihemmed b. Muslîm ed-Debbas re pêwendiya tesewwufê çê kiriye.

Geylanî wexta dihere Bexdadê pêşî ji mezhebê Şafîî bûye dûre bûye Henbelî. Heya dawiya temenê xwe li gorî van herdu mezheban fetwayan dide. Ebdulqadirê Geylanî heyra dawiya temenê xwe li gorî hukmên zahirî yê dînî û şerî' jiyaye. Ji xeynî vê her gav guh daye Quran û hedîsan û li gorî vê jî 'emel kiriye. Divê kesê zahir derûniya xwe ya jiyânê neke manchê haletê dînî. Her tim şîret li murîdên xwe kiriye. Li gorî wî pêwîst meriv Quranê li gorî tecwîdê bixwîne da ku heqê xwendinê bide.

Ebdulqadirê Geylanî wexta ku yekem car we'z daye kêma kes beşdarî wî bûye. Dûre bi hezaran kes beşdarî we'zên wî dibin ku hinkî cih namîne cemaeta xwe dibe mizgefta Babulhalbeyê. Bi xîtabeta xwe ya qewîn bi hezaran kes di bin bandora xwe de hiştiye ku hinkî bibandor bûye beşdarvan ji xwe ve çûne, qenaet bi wan hatiye ku wê herin Behîştê. Li gorî hin menqebeyan hezar berhem nivîsiye lê yê respîrkirî li dora pêncî hebî ne. Piştî wefata Gaylanî navûdendê wî bi terîqeta Qadiriyê, ku damezrînerê vê terîqetê ye, li alema Îslamê berbelav bûye. Hema hema di Rojhilata Navîn de bi dehan ziyaretgehên wî hatine çêkirin ku ev jî girîngiya wî dide nîşan.²⁴⁶

Hin menqebeyên li ser şêx Ebdilqadirê Geylanî:

Şêx Ebdulqadir bi xwe gotiye: "*Dema zarok bûm, ez rojekê çûme çolê û min çêlekek girt û ji bo şovkirina zêvî anî, çêleke ziman vekir û got Ya Ebdulqadir! Tiştê ku hatiye xuliqandin, ji bo vî karî çênebûye, ez tirsiyam û vegeyriyam banê serayê, min dît hecî di erefatê de sekinîne. Ez çûme cem diya xwe û min jê re got bihêle ez herim Bexdayê û ilmê bixwînim û salihan ziyaret bikim! Sedema vê daxwaza min pirs kir, min jê re salix dan. Giriya, rabû 80 dînar anî di binçenga kirasê min ve dirû, îzna min a seferê da û soz ji min stand ku hertim sadiq bimînim, ji min re got Lawo! Here ku min tu spartî Xwedê û heyra roja qiyametê ez ê te nebînim.*"

²⁴⁶ Süleyman Uludağ, "Abdülkâdir-i Geyânî" *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 1, tr. 234-239 (<https://islamansiklopedisi.org.tr/abdulkadir-i-geylani>), (20.10.2019)

“Ez bi kerwanekî biçûk re ber bi Iraqê ve ketim rê. Piştî ku em ji Hemedan derbas bûn, şêst siwar hatin û kerwan dorpêç kirin. Tu kesî tundî li min nekir. Ji nişkê va yek hate aliyê min û got feqîro! Çi bi te re heye? Min got 40 dînar, got Kanî? Min got di binê binçenga min ve hatiye dirûn. Wilo zanî ku ez henekan dikim. dev ji min berda û çû. Yekî din hat û min dîsa wisa jê re got.”

“Wî jî dev ji min berda û her du çûne cem serokê xwe û qala gotinên min ji hev re kirin. Serok gazî min kir û ez birim ser bilindahiyê ku talana kerwan lê dabeş dikirin, ji min re got çî bi te re heye? Min 40 dînar, got kanî? Min got bi binçenga kirasê min ve hatiye dirûn. Destûr da û kirasê min bişkivandin û pere tê derxistin. Got te çîma ji me re got? Min got dêya min soz ji min standibû ku ez li ser rastî û sdaqetê bimînin û ez tu carî sozê dêya xwe li erdê naxim. Serokê wan giriya û got ev çendîn sal in min îxanet li sozê Xwedayê xwe kiriye. Û tobe kir. Hevalên wî jê re gotin tu heya niha di talanan de pêşengê me bûyî, hema di tobeyê de jî bibe pêşengê me! Hemûyan tobe kir û hemû tiştên ku ji kerwan standibûn, dubare vegerandin.”²⁴⁷

Şêx dibêje: “Ez yazdeh salan di bircekê de rûniştim û min bi Xwedayê xwe re ehd kir ku ti tiştêkî ne dixwim, ne jî vedixwim, heta ku bi xwe li min bide xwarin û vexwarin. Carekê min çil rojan tiştêk nexwaribû, yek hat hinek xwarin danî pêşiya min û çû. Ez hew qasî birçî bûm ku piçek mabû rihê min biçê. Min got bi Xwedê ez ji ehda xwe derbas nabim. Ji nişkê ve dengê ji batin hat digote min el-cû', el-cû' (birçîtî, birçîtî)! Ji nişkê ve Şêx Ebû Seîd di ber min re derbas bû û deng bihîst. Ji min re got Ebdulqadiro! Ev çî ye? Min got ev bêqerarî û bêhedariya nefîsê ye, lê rih li ser sozê xwe ye û li ber çavê Xwedayê xwe ye. Got were mala me! Û çû. Min ji xwe re got ez naçim tu cihekî. Ji nişkê ve Xizir pêxember hate cem min û got Rabe here cem Ebû Seîd! Ez çûm min dît Ebû Seîd li ber derê mala xwe sekiniye û li benda min e, gote min Ebdulqadiro! Ma gotina min ji te re kêmbû? Gerek Xizir jî bihata? Ez birim nava malê û ji xwarekê ku çê kiribû, parî çê dikirin dixist nava devê min heta ku ez têr bûm.”

²⁴⁷ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 337.

Her wiha gotibû: *“Ez carekê li seyranê bûm, yek hate cem min ku min heta wê demê nedîtibû, got dixwazî em biaxivin? Min got belê, got bi şertê ku dijî min dernekevî. Min got bila be. Got li vira rûne heta ez bê m. Salek di ser re derbas bû, dema vegeriya ez hîn li wira bûm. Saetekê li cem min rûnişt. Rabû û got ji vira neçe heta ez bê m, saleke din jî di ser re derbas bû, dubare hat, ez dîsa li wira bûm. Saetekê li nik min rûnişt û rabû û got ji vir neçe heta ez bê m, saleke din jî di ser re derbas bû, dubare hat. Bi xwe re nan û şîr anîbû. Got ez Xizr im, Xwedê emir li min kir ku bê me tev te nê n bixwim. Me tev xwar. Got rabe here Bexdayê! Em tev çûne Bexdayê.”*²⁴⁸

2.20.3. Şêx Eliyê Kurdî

Dîroka jidayîkbûna wî diyar nîne û rasterast amaje bi serdema jiyana wî nehatiye kirin, lê ji ber ku tê zanîn Şêxu'l-Îslam şagirtê wî bûye û Şêxu'l-Îslam bi xwe di navbera salên 440 û 536an ên hicrî de jiyaye, lewre em dikarin bigihîjin vê encamê ku Şêx Eliyê Kurdî bi ihtimaleke mezin di sedsala pêncem de jiyaye. Şêxu'l-Îslam Ehmedê Cam şagirdê wî bûye û qala serpehatiyeke xwe bi wî re dike.

Ji paşnavê wî jî weke ku diyar e kurd e. Ji ber keramet û haletên rûhanî bi dîntiyê ve hatiye te wan barkirin. Gelek ehlên Şamê bûne murîdên wî. Tu carî serî li ber dadgehane netewandiyê. Beravajî vê hinekî zane bûye dadgehê rêz daye wî. Zêde agahî ser wî nîne. Em tenê serî li *Nefahatu'l-Unsê* dixin. Menqebeyên li ser Şêx Elî Kurdî:

Rojekê ji yekî payebilind re gotiye: *“Merasimekê ji bo derwêşan li dar bixe.” Zilam tavilê dawetnameyekê amade dike û gazî katibên baş dike ku xitabeta wan baş e û derwîşên navdar in. Dema mêvan hatine piştî wê Şêx Eliyê Kurdî jî hatiye. Li kêlekê çavên wî qutîkên şekiran vedike. Ji xwediyê malê re dibêje vana têxe hewzê.” Zilam hemû dixê hawiz. Derwîşan şerbet vexwarin û heya destikê sibehê sema û reqs kirin. Dûre xwarinek xwarin û çûn. Şêx Elî ji xwediyê malê re got dema tu derkevî derve, derî qufil bike û piştî sê rojên din were bal min. Xwediyê malê jî wilo kir. Belê, dema xwediyê malê wilo dike dibîne ku palgehên malê hatine çirrandin. Şaş dimîne! Ji Şêx Elî re dibêje te çima wilo kir? Şêx Elî jê re dibêje tu*

²⁴⁸ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 338.

hem xwe weke mûminan nîşan didî û hem jî tu li ser mermerên heram xwarinê didî. Ev ne tişteki durist e!”

“Xwediyê malê li matmayî ma û wilo lê vegerand: “Bavê min ev mermer dane min.” Lê Şêx Elî bi hêrs dibe û guh nadê û diçe. Xwediyê malê dizanîbû ku Şêx Elî ehlê tesewwufê ye, lewma li ser vê meselê fikirî û kete bîrê ku ew mermer ji yekî sextekarî kirîne. Lewma doz li hostayê ku ew kar kiribû vekir û di dawiyê hosta li xwe mikur hat ku wî yên sexte bi kar anîne.”

Carekê dema ku Şêx Şihabudîne Suhrewerdî tê Şamê dibêje em herin dîwana Şêx Elî. Kesên derdorê ji Şêx Şihabudîn re dibêjin ku Şêx Elî ne nimêj dike ne jî cihê xwe yê awret dinixumîne. Ango wilo beradayî digere. Şêx Şihabudîn dibêje ka em binihêrin û ji ber van gotegotan xwestiye wî bibîne. Dema diherin ber mala Şêx Elî, Şêx Elî cihê xwe yên awret kişif dike, rûdinê û li benda wan dimîne. Şêx Şihabudîn jê re dibêje tu xwe tazî bikî jî em ê bêne ziyareta te. Dûre bi hev re rûdinin xwarinê dixwin. Ango Şêx Şihabudîn û hevalên xwe qedir didine Şêx Elî.²⁴⁹

2.20.4. Şêx Ebû Tahirê Kurd

Weke ku ji paşnavê wî jî diyar e weliyekî kurd e. Bi Xoce Xizir re sohbet kiriye. Dostaniyeke wî ya pir dilsoz bi Şêxu'l-Îslam Ehmed re hebûye. Li ser jiyana wî agahiyên zêde tune ne û kesên ku qala wî kirine jî, Camî wek çavkanî nîşan dane.

Ji ber ku bi Şêxu'l-Îslam (440-536) re hevaltîyeke wî ya kûr hebûye, lewma em dikarin bibêjin ku di serdema wî de jiyaye. Yanê di dawîya sedsala pêncem de, û di destpêka sedsala şeşan de hebûye. Menqebeyên li ser Ebû Tahirê Kurd:

Şêxu'l-Îslam Ehmed: *“Rojekê dilê min çû mişmişan. Tahirê Kurd ji min re got heger tu salekê rojiyê bigirî ez ê mişmişan bidim te. Min qebûl kir. Piştî salekê min jê re got tiştê te got, min kir lewra min salekê rojî girt, ka tu jî xwediyê soza xwe be. Tahir çû ji min re mişmiş anî û da min. Nefsa min kire hawar! Min ji Tahir re got tu çima van paqij dikî? Ji min re got ‘ez ê vana bidim te û tu yê bixwî. Ev mişmiş ên baş in. Ez di ber wan de gelekî xebitîm da ku berên baş çê bibin. Ez û nefsa xwe ketin*

²⁴⁹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 433.

qirika hevdu. Min xwe bi xwe got, ji niha pê ve ez her tiştî naxwazim. Piştî vê min dusê hebên din ji darê da hev û min çend heb jî xist bêrika çakê xwe û ez çûm bal Tahir û min danî ber wî. Saetekê li mişmişan nihêrî û ji min re got te ev ji darên weqfê anîne? Min got na, min ji nava milkên xwe anîne. Tu derewan li min dikî! Ev ne yên te ne. Ez pir li ber xwe ketim. Ez hêrs bûm û min dua ji Xwedê re kir. Min got ya Rebî! Tu jî dizanî ku ew milkên hanê ji bavê min mane û min ew mişmiş jî ji milkên bavê xwe anîne. Tu bi awayekî wî bide qanehkirin. Piştî vê Tahir gazî lawikê xwe kir, jê re got here ji nava kerî mîhekê bîne em ê serjê bikin. Çunkî birçîbûn li serê Ehmed xistiye. Ji ber vê nizane ku çi dike. Heya ku xwarin hat ez wilo rûniştim. Dema xwarin hat xofeke wilo kete dilê min vê şorbê û vî goştî nexwe, ne helal e. Min bi tenê nan xwar. Tahir got te çima goşt û şorbe nexwar? Ehmed wilo bersiv da wilo xweştir e. Ji min re got bi rastî dibêjî? Min a dilê xwe got. Wî gazî lawikê xwe kir. Lawikê wî got kerî li cihekê dûr bû. Min jî ji filan qesabî kirî. Gazî qesab kir. Qesab got ew goştê haram bû. Ji min re anîn min jî serjê kir. Tahir serê xwe bera ber xwe da, ez ji wira çûm. Ez çûm cihekê ez giryam û min dua ji Xwedê kir. Ya Rebî! Te ez bi tu mirovan re nekirim heval. Zemanekî pêrekî min hebû ez pê re dişewirîm, niha ew jî tune ye. Piştî demekê Tahir hate bal min rûnişt. Ez bi dileke safî hatim. Ya Rebî! Te çawa haya wî ji goşt çê kir ku li ber xwe kete, haya wî ji mişmişan jî çê bike. Dema min wilo digot, min dît wa ye Xoce Xizir hat û wilo got, 'Tahir, tu ji milkên Ehmed re dibêjî weqf, tu ji goştê şikber re dibêjî yê helal e, Tu van ji ku fêr bûyî? Tu yê hertim wisa bikî?'²⁵⁰

2.20.5. Şêx Emmar Yasir el-Bidlîsî

Ji Bedlîsê bûye. Lewra weliyekî kurd ê Bedlîsê bûye. Murîdê Şêx Ebu'n-Necîbê Suhrewerdî bûye. Di perwerdekirina murîdan de pispor bûye.

Emar b. Mihemed b. Meter b. Sehab şêxekî ji terîqeta Suhrewerdî ye ku di sedsala şeşem de jiyaye. Mehsûmelîşah wî weke Şêx Ema b. Yasirê Endolosî bi nav dike. Bidlîsî ji kurdên Bidlîsê û nêzîkî Exlatê ye û murîdê Ebû Necîb Ebdulqahirê Suhrewerdî ye. Dîroka jidayîkbûna wî diyar nîne. Derheqê wefata Bidlîsî de jî

²⁵⁰ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 432-33.

nêrînên cuda hene. Şîrvanî wefata di serdema hikûmeta Mustenzerê Ebbasî de dize, li halekî ku Xwansarî sala 582yan dibêje. Bidlîsî li Bidlîsê hatiye veşartin.

Yek ji kesên ku Bidlîsî koka terîqeta xwe digihîne wî, Husamedînê Elî, arifê Bidlîsî ye ku li ser Quranê tefsîreke irfanî bi navê *Camîu't-Tenzîl we et-Te'wîl* nivîsiye. Li gorî Camî, Ebu'l-Cenab Ehmed b. Umer b. Mihemedê Xofî ku wek Necmedînê Kubra tê naskirin, murîdê Bidlîsî yê navdar bûye ku bi alîkariya şêx Emar deriyê futûhatên xeybî lê hatine vekirin.

Derbareyê Necmeddîn û Bidlîsî de tê gotin ku Necmeddîn Xirqeya Teberikê ji Bidlîsî wegirtiye. Yanê Şêx Emar "Pîrê Sohbetê" yê Necmedîn bûye û Îsmailê Qesrî xirqeya sereke (îradet) daye Necmeddîn. Lewre gotina Mehsûmelîşah a derheqê têkiliya Kubrewiye û Suhrewerdiyeyê de ji hêla Şêx Emarê Bidlîsî ve bê belge ye. Li gorî Nûrbexşê Qohistanî, nivîskarê *Silsiletu'l-Ewliyayê*, hin berhemên Bidlîsî derbareyê ilmên ewliya, ehwal û mukaşifatan de heye. Elaudoleyê Simnanî jî derheqê risaleyê Bidlîsî dibêje: "*Ji Bo Xelwetiye Zakir*" hatiye nivîsandin. Du berhemên Bidlîsî bi zimanê erebî berdest in: *Behcetü't-Taife Billah el-Arifet* (derbareyê mijarên irfanî ye.), *Sewmu'l-Qelb* (li ser çawaniya tesfiyeya ruhê însên e.). Menqebeyên li ser Yasir el-Bidlîsî:

Di berhema Şêx Necmuddînê Kubra ya bi navê *Fewaîhu'l-Cemal* de wilo hatiye gotin: "*Dema ez hatim bal Şêx Yasir ez bi destûra wî ketim xelwetê. Wilo hate bîra min, min zanistên zahirî xitim kirin, dema min Futûhat-ı Xeybiye²⁵¹ jî bi dest xist, min ew ji kesên meyldar re qal kir. Ez bi vê niyetê ketim xelwetê. Lê wê tenê têrê nekir. Ez ji ber vê ji xelwetê derketim. Ji ber vê Şêx Yasir wilo got wê niyeta xwe sererast bike paşê têkeve xelwetê. Axirê nûra wî ya batinî dilê min geş kir. Min pirtûkên xwe şandin weqfan û min cilên xwe li feqîran belav kir. Li ser min tenê cubeyek mabû. Min xwe bi xwe wilo got ev xelwetgeh qebra min e, cube jî kefenê min e, ne gengaz e ku ez careke din derkevim derve. Heger dilê min bixwaze ku ez derkevim derve ez ê cubbe û cilên xwe qetqetî bikim. Dema min wilo got, Şêx Yasir*

²⁵¹ Di zimanê erebî de tê wateya "vebûn" an jî "vebûna/ belavbûna îlahî". Tiştên ku meriv ji wan bê hêvî ye, lê ji nişkê ve wana bi dest dixe. Ji lew ra wateyên mîna kerameta manewî û dilê safî tê lê barkirin.

wilo gote min têkevî xelwetê, êdî te niyeta xwe sererast kir. Ez ketime xelwetê û min xelweta xwe tamam kir."²⁵²

2.20.6. Edî b. Musafirê Şamî Hekkarî (Şêx Adî)

Weke em dizanin rola Şêx Adî di dîroka kurdên êzdî de gelekî girîng e. Çunkî Êzîdî xwe lê digirin û wî weke kesayetekî pîroz dibînin. Bi vê munasebetê bi dehan vekolîn li ser Şêx Adî û dînê êzdiyan hatine kirin. Lê di vira de em ê li gorî mijara xwe li ser bikolin. Ji bilî vê, vekolînên ku li ser hatine kirin hema hema mîna hevdu agahiyan didin. Mînak, weke ku me li jêrê jî gotiye, hema hema di hemû çavkaniyan de derbas dibe ku Şêx Adî û Ebdilaqadirê Geylanî bi hev re çûne Mekkeyê. Ji ber vê, me tenê çend vekolîn weke çavkanî destnîşan kirin û me sûd ji wan wergirt.

Şêx Adî ji xelîfeyê Emewîyan Merwan b. el- Hekem (k.d., 685) hatiye. Ango bi eslê xwe ereb û Emewî bûye. Lê paşê weke yekî kurd tê naskirin û dibe kesayetekî pîroz ji bo dînê ezdiyatîyê. Di navbera salên 1073-1078an de li Lubnanê li gundê Beyt Farê ji dayîk dibe. Li gorî baweriyên Êzdiyan beriya ku Şêx Adî bê dinyayê, weke efsane tê behskirin ku wê Şêx Adî weke sofîyekî pîroz bê dinyayê. Bavê wî bi xwe vê agahiyê dide. Li gorî rîwayetan bavê Şêx Adî Musafir b. Îsmâîl diçe daristanê û çil rojan li wira dimîne. Di xewna xwe de yek jê re dibêje here malê û bi jina xwe re têkeve têkiliya cinsî. Çunkî wê ji vê têkiliyê zarokek çê bibe û wê navê wî zarokî li rojhilat û rojava belav bibe. Ev kes dostê Xwedê ye. Bavê wî tê malê û Xwedê zarokekî dide wan.²⁵³

Piştî bavê xwe postnîşîniya terîqeta Edewiyeyê kiriye.²⁵⁴ Şêx Adî hîn di xortaniya xwe de dihere Bexdayê û li wira li ber destên sofîyê bi nav û deng Ehmed el-Xezalî ku mamosteyê Ebdilqadirê Geylanî jî bûye, ders wergirtiye.²⁵⁵ Di wê demê de beşdarî sohbetên Ebû Necîb Ebdulqadir es-Suhrewerdî û Ebû Hemîd dibe. Paşê di sedsala 12an de li Çiyayên Colemergê bi cih dibe. Li wira ji destên Ûqayl al-

²⁵² Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 281-2.

²⁵³ Birgül Açıkyıldız, *Ezidiler, Bir Toplumun, Kültürün ve Dinin Tarihi*, Wer.: Zülal Kılıç, Alfa Yayınları, İstanbul, 2015. r. 124.

²⁵⁴ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weşanxaneya Nûbiharê*, Stenbol, 2013. r. 149.

²⁵⁵ Roger Lescot, "Quelques Publications Récentes sur les Yézidis", *Bulletin d'Etudes Orientales*, 6, 1936. rr. 103-108.

Membîcî û Ebu'l-Wefa el-Hulwanî perwerdehiyeke baş werdigire û gelekî bi nav û deng dibe. Li gorî rîwayetan di sala 1116an de bi Ebdilqadirê Geylanî re çûye Mekkeyê. Lê dûre, piraniya sohbetên xwe li herêmên Kurdistanê kiriye û şaxên xwe li wan deran bi cih kiriye. Ji ber vê, di nava kurdan de eleqeyekê mezin dibîne û di encamê de dibe yekî pîroz ku baweriyekê diafirîne. Ji ber vê bandorê bi hezaran murîdên wî çê dibin. Di encamê de baweriyekê bi navê Êzîdî diafirîne. Di navbera salên 1160-1662an de li Çiyayên Colemergê dihere rehmetê. Lê paşê meytê wî weke simbolîk tînin Laleşê Başûrê Kurdistanê. Ji ber serboriyêke dûv û dirêj gora Şêx Adî dibe weke perestgehekê û bawermendên Êzîdî li wira teatên xwe yên dînî dikin.²⁵⁶ Ji ber ku yekî pîroz bûye, di efsaneyên qewlên Êzîdî de bi dehan kerametên wî yên derasayî hene. Hinek ji wan weke Menqebe li xwarê ne.

Îbnî Esîrê Cezîrî di cilda yazdehem a pirtûka *Elkamilê* de dibêje: “Adî kurê Misafir û yek ji parêzkarên mezin bûye û li Şam û Elbakê jiyaye û paşî çûye Hekkariyê û paşmaya jiyana xwe li wira raborandiye, heta ku di sala 1162ê zayînî de çûye ser dilovaniya Xwedê.”

Îbnê Xellîkanê Hewlêrî jî di pirtûka *Wefayatu'l-E'yan* de dibêje: “Şêx Adî kurê Misafir li gundê Beyt Qarî ya Elbakê hatiye perwerdekirin. Ew zilamekî xwedannas û parêzgar bûye û nav û dengê xwedannasiya wî li her cihî deng daye û belav bûye. Ji ber vê yekê gelek kes bûne alîgir û peyrewên wî. Bi ku de çûye gel bi dû wî de çûye û paşî gel ew wekî pêşengê xwe hilibijartiyê û ji wî re her tişt xwestine. Wî bi kesayetî û mezinên parêzkarên wê demê yên wekî ‘Eqîl Muncî, Hemad Bas, Ebî Necîb, Ebdilqadir Sehwerdî, Ebdilqadir Geylanî û Ebdilqadir Helwanî re têkiliyên xurt û peywendî danîne. Lê paşî ji wan veqetiyaye û penahê xwe ji çiyayên Culemêrgê re biriye. Li wira perestgehek ava kiriye û gel qesta wî kiriye û çûye bal wî. Şêx Adî di sala 1162ê zayînî de can spartiyê canaferîn.”

Hafîz Şemseddînê Zehebî di beşa duyem a pirtûka *Dulel Îslamî* de dibêje: “Şêx Adî di sala 1162ê Zayînî de li Culemêrgê koça dawî kiriye û li wira ew spartine axê. Piraniya gelê herêmê bawerî bi wî aniye û bûne peyrew û alîgirên wî.”

²⁵⁶ Philip G. Kreyenbroek, *Ezidilik Arka Planı, Dinî Âdetleri ve Metinsel Geleneği*, Çev: Amed Gökçen-Damla Tanla, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2014. rr. 31-32.

Şêx Zeynedîn di beşa duyem a *Tarîxu Îbnî'l-Werdî de* dibêje: “Şêx Adî kurê Misafir di sala 1162ê zayînî de di meha Miheremê de li welatê Culemêrgê koça dawî kiriye. Ev xwedanasê mezin li Elbakê ji dayik bûye û di temenê ciwanîyê de çûye Mûsilê û gelê wê herêmê bawerî bi wî aniye û bûne alîgirên wî.”

Şêx Mihemedê Henbelî di pirtûka *Qelaidu'l-Cewahirî de* dibêje: “Şêx Adî kurê Misafirê Emewî li Elbakê ji dayik bûye û di temenê ciwanîyê de çûye Bexdayê û li wira li ba zanayên wê demê elimîye xwendina zanistî. Piştî zor û zehmetiyeke mezin tenêti û kuncnişînî ji xwe re hîlbijartîye û paşî çûye Culemêrgê. Li wira jî di şikeftê de bi cih bûye. Gel bi hatina Şêx hesiyaye û deste bi deste çûne ziyareta wî. Ew jî naçar ji şikeftê derketîye derve û bûye pêşengê gel. Wî bi vî awayî jiyana xwe derbas kiriye heta ku li wira miriye.”²⁵⁷ Menqebeyên li ser Şêx Adî:

“Şêx Adî ji dê û bavên kal û pîr hatiye dinyayê. Lewra panzdeh salî terkeserî dinyayê bûye. Piştî pênc salan dema ku ew li ber ronahiya heyvê li deştê derbas dibe bûreyeke derasayî tê serê wî. Dema ku di ber tirbeke kevn re derbas dibe siyên du dêwan li ber wî bilind dibin. Lingên wan dirêj, pirça wan stûr, çavên wan mezin û gilover bi rengê kesk, çermê wan reş, lê mîna mirovan in. Wê gavê tirb jî mezin bû heya ku gihîşt ezmanan û bû mîna minareyan. Adî ji tirsan cêrê avê danî ber xwe. Paşê ew li ber çavên wî bû kurekî ji perîdankan weke mêrikekî tawis. Kurik ji Adî re got metirse, minare dikare bê xwarê û dinyayê wêran bike, lê tu tişt bi te nayê. Tu yê serweriya dinyayê bikî. Ez Melekê Tawis im, min tu bijart da ku tu vê rastiyê li dinyayê belav bikî.”

Îmam Yafî: *“Murîdekî Şêx Adî bi çol û çiyarê ketê. Çû ji Şêx Adî re got Ya Şêx! Ez dixwazim ji nava gel veqetîm û jinayeke asayî bijîm. Şêx Adî rabû ser xwe li wira du gome hebûn, li binê yekî xist, aveke şêrîn derket. Li binê gomeyê din xist dareke hinarê çê bû. Ji dara hinarê re got êy darê! Bi xêra Xwedê kanî hinareke xweş bide. Darê mîwe da, ew hinar hinara herî xweş a dinyayê bû.”*²⁵⁸

²⁵⁷ Feqî Huseyn Sagnîç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2014. rr. 15-18.

²⁵⁸ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 352.

2.20.7. Şêx Caker²⁵⁹

Şêx Ebu'l-Wefa li ser wî sena gotiye û kolozê xwe bi destê Şêx Eliyê Hîtî ji wî re şandiye, û ew tekîlîfî hizûrê nekiriye û gotiye: "Min ji Xwedayê teala daxwaz kir ku Caker bike murîdê min. Xwedê jî ew pêşkêşî min kir. "

Û şêx Caker ji koka xwe ji kurdan bû, li çolistaneke Iraqê nîştêcîh bû û li wira jiyana kiriye, di 95 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe û gora wî jî li wira e.

Menqebeyên li ser Şêx Caker:

Şêx Caker dibêje: "*Her kesê ku Xwedê di alemê de ji nedîtî ve bê, ji dilê min derdikeve. "*

Hogirekî wî dibêje: "*Ez carekê li cem wî bûm, garana dewaran di ber wî re derbas dibû. Îşaret bi çêlekekê kir û got ew bi golikeke nêr re avis e û filan û bêvan, û ew ê di filan rojê de bibe û dê bibe nezra me û filankes û bêvankes wê goştê wî bixwin. Piştî îşaret bi çêlekeke din jî kir û got ew ê jî bi golikeke mê re avis bibe û filan demê bizê û filankes wê goştê wê bixwin û kûçîkekî sor jî wê jê bixwe. Gotinên Şêx tam hatin cihê xwe, hinek goştê wê bû para kûçîkekî sor. "*

Di 95 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Dîrok û cihê wefata wî li gorî hin çavkaniyan sala 591ê ya hicrî li Samirayê hatiye nîşandin.²⁶⁰

2.20.8. Şêx Cemaleddînê Lor

Li gorî pirtûka Şedu'l-Ezarê xelkê Îzecê²⁶¹ bûye. Şêxekî xwedî keramet bûye û di sedsala heftem a hicrî de jiyaye. Destpêkê bi rêncberî û xwedîkirina pez û hespan re mijûl bûye û piştî ji ber zuhd û teqwa û riyazetê digihîje meqamên manewî. Menqebeyên li ser Lur²⁶²:

Şêx Necîbudîn: "*Rojekê yek hate bal min got min, xortekî bi navê Lur hatiye bajarê me. Xortekî bimirês bû û hema li mizgeftê bûye. Ez jî çûm balê, heqîqeten yekî*

²⁵⁹ Di hin çavkaniyan de weke "Cagir", "Cagîr el-Kurdî" û "Cagîrê Kurdî" hatiye binavkirin.

²⁶⁰ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 354

²⁶¹ Ev bajar ser bi parêzgeha Xûzistanê, li başûrê Kirmaşan û Îlamê ye û niha navê wê bûye Îze.

²⁶² Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe bi navê Şerefnameyê de luran wek kurd dide nasîn.

bimirês bû û min ew bi şêwr dît. Heta bi vî halê xwe ve çavsor xuya dikir. Ez çûm balê û min silav dayê. Piştî ku min silav dayê, wilo ji min re got ez bi katib, mela û feqîyan re eleqedar nabim. Dema wilo got, yek rabû ser xwe wilo lê vegerand ev soft ye. Ji ber vê, pê re şer kir. Ez li ber wî rûniştim. Min hal û wextê wî pirsî. Wî got ez Lorî me, ez tu tiştî nizanîm. Ez jî gavantiyê hez dikim. Lewra min pir gavantî kiriye. Carekê ez li ber dîwarekî tenîştibûm. Ji nişkê ve halekî rûhanî hate min. Ez bi cezbeyê ketim. Perdeya sergeveziyê ji ser min rabû. Ez jî xwe ve çûm û xûz bûm erdê. Dema ez bi ser hişê xwe ve hatim tewhîd xuya bû.”

Dîsa li gorî galegalên Şêx Necîbuddîn behsa Lorî wilo tê kirin: “Şêx Lorî her tim Şeteheyat²⁶³ dikir. Ji ber vê alimên derdorê têdîgihîştin ku Şêx tewş û mewş dipeyive. Ji ver vê rewşê jê re fetwa derdixistin da ku bibêjin bêhiş e. Lewma fetwa dane mîrê Şîrazê Etabekê Ebû Bekir ku wî bikuje. Etabek jî gotiye ji bo ku ew bê kuştin, divê du kes fetwayê bidin, yek Şêx Necîbuddîn e û yê din jî Muînuddîn e. Dema ku fetwa anîn ber destên min, min wilo li ser nivîsî, kuştina wî ne rast e. Şêx Muînuddîn jî wilo nivîsî. Ji ber vê Etabek destûra kuştina wî neda. Li ser vê Şêx Necîbuddîn wilo got rojekê min destnimêj digirt. Cemaleddîn li min dinihêrî. Dema min av li ser çavên xwe xist, min jê re got bi ya Xwedê bike. Wî got ma tişteki wilo maye ku ez bikim.”

Tê gotin wî û Şêx Necîbeddîn bi hev re munazere heye, şêx Cemaleddîn jî Şêx Necîbeddîn re gotiye: Tu halê min û xwe çawa dibînî? Şêx dibêje ez dibînim ku em her du jî di mizgeftê de ne û me piştî xwe daye dîwarên wê. Şêx Cemaleddîn dibêje min di batinê de wiha dîtîye û te di zahirê de, de ka bibêje bê ka cîgera kîjanî me berztir e? Şêx dibêje tu di mizgeftekê de rûniştîyî ku banê wê heye, lê ez di mizgefteke servekirî de me. Xuya ye ku terîqeta min heye û terîqet jî wê bidome, lê terîqeta te tune ye. Û munazere bi dawî dibe²⁶⁴

²⁶³ Vegotina henekî ya mijareke girîng an jî cidî.

²⁶⁴ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, rr. 319-320.

2.20.9. Ebû Eliyê Sindî

‘Ettar dibêje Ebû Eliyê Sindî ku Rûzbihan wî wek Behra Heqîqet û Lisana Deqayiqan bi nav dike, ji şêxên Şetah²⁶⁵ bûye. Menqebe wilo ye:

Şêx Ruzbehan Beqlî di şerha berhema xwe ya bi navê *Şetiheyatê* de wilo neqil dike: “*Sindî mamosteyê Bayezîdê Bistamî bûye. Bayezîd derheqê Sindî de wilo gotiye ez ji Ebû Eliyê Sindî fêrî tewhîd û ilmê fenayê bûme. Ew jî ji min fêrî sûreyên Fatîheyê bûye.*”²⁶⁶

2.20.10. Ebû Abdulahê Cavpare Sofiyê Hemedanî

Çavpare navê herêmekê li welatê Rûmê ye ku Ebû Ebdullahê Sofiyê Hemedanî li wira ji dayîk bûye. Şêxekî mezin bûye. “Çavpare” navê herêmekê di nava sînorê Rûmê de ye. Hemedanî tiştên ku ne bi dilê wî bin red kirine.²⁶⁷ Li ser Hemedanî agahiyên zêde tune ne. Piştî hevoka yekem Camî tenê cih daye menqebeyan. Camî tiştên li ser Hemedanî bi vî awayî gotiye. Ji vir û pê ve Camî cih daye menqebeyan:

Carekê Hemedanî di mizgefta Şunuziyeyê de bûye. Xwarin jê re anîne, lê dilê wî neçûyê. Hevalên wî jê re gotine tu hertim gazinan dikî, de bixwe. Xwarinê dixwe. Hemedanî wê şevê li mizgeftê dimîne û xewnekê dibîne. Di xewê de jê re tê gotin te tişteki ne bi dilê xwe xwar. Ma te nizanîbû wê bela bê sere te? Piştî vê xewnê Hemedanî ji Ebû Bekir Zeqaqê Misrî re pirsîye ez bi kê re sohbetê bikim? Misrî jê re dibêje ne her kesê ku her tiştên Xwedê teala derheqê te de dizane jê re bêjî da ku ew kesayet ji te nefretê neke bibe dost û heval.”

Şêxu’l-Îslam jî neqil kiriye: “*Dema şerma yekî derkeve holê lazim e mirov sohbetê wî weke rastiye bipejirîne. Ji ber ku însan kana qisûran e. Dema tu hunerekê, qenciyeke bibînî tu pê re sohbetê bikî xweş e, lê heger qisûrek derkeve tu dev ji sohbetê berdî ne tişteki qenc e. Heger tu li sohbetê qisûrê bibînî jî pêwîst e tu dostaniya xwe bidomînî. Lê divê ev ne qisûreke dînî be. Ev meseleyeke dîn e, heger mirov vê meseleyê bi piştguhê xwe re bavêje şelaqî û necamêrî li ser mirovan zêde*

²⁶⁵ Bêtirs, kifrî, bê şerm.

²⁶⁶ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 191.

²⁶⁷ *h.b.*, r. 95.

dibe. Heger ev qisûr zerûrî derkeve, zerer tune ye. Qisûrên ku ne dînî bin jî wilo ne. Jixwe însan ne mehsûm e. Ji ber vê guneh û qisûr derdikevin meydanê. Çunkî ew îsyankar, pir nezan û zalim in. Dema te çewtiyek dît lêborînê nexwazî, dema te qenciye dît spasîyê neke, yê ku pêdiviya te pê heye ew ne dostê te ye.”

Yekî ji Yehya b. Muaz pirsîye: “*Divê mirov bi kê re dostaniyê bike? Yehya b. Muaz gotiye dostekî wilo peyda bike ku dema nexweşîyan bê bal te, dema qisûrek çê bibe lêborînê bixwaze. Sebir bike û heqê dostaniyê bide, bi şertê ku tu dev ji heqê xwe berdî, lewra tu minetan bi tu awayî li ser dostê xwe nekî. Divê dost qisûrên xwe bibînin û ji bo şerma kesên din lêborîna xwe bixwaze. Divê tu însanan di bin qeder û zordariyê de bi mecbûrî û têkçûyî bibînin ku dijminahî ji meydanê rabe da ku ew kes sûc û qebhetê li ser xwe bibîne û lêborînê bixwaze.*”²⁶⁸

“*Zemanekî Emîr Kafûr ji Şêx Ebû Ebdullah re gelek zêr dişîne. Ji ber ku Kafûr leşker bûye, Şêx ketiye şik û gumanan û qebûl nekiriye. Hemedanî ji Kafûr re wilo gotiye hemû tiştên li erd û asîmanan hene û hemû tiştên di navbera wan de û yê di binê erdê de jî tev ên Xwedê ne.*”²⁶⁹ Li ser vê meseleyê Şêxu’l-Îslam wilo rave kiriye: *Gotina Kafûr ji goeina Hemedanî mezintir e, lê gotina Kafûr bereketa encama sohbeta Hemedanî ye.*”²⁷⁰

2.20.11. Ebû Yaqûbê Meydanî

Ebû Yaqûbê Meydanî şêxekî ji Nisêbîna Mêrdînê ye. Zêde ahahî li ser Meydanî nîne. Menqebeyên li ser Meydanî:

“*Şîblî carekê ji bo karekî ji Bexdayê çûbûye Misrê, di nava rê de hespa xwe di erdê yekî de girêdide, ji bo xwediyê erd lêborînê bixwaze yan jî ji bo ku xwediyê erd lê helal bike dikeve rê. Şîblî li ser riya xwe rasî Ebû Yaqûb Meydanî tê. Meydanî xêrhatina wî dike. Wê çaxê Meydanî hîn murîd bûye û haya wî xweşikayî ji tesewwufê tunebûye. Şîblî destê xwe li ser serê wî digêrîne û dibêje Xwedê li te baştir bike. Meydanî jî gotiye amîn. Yên ku li wira bûne li ber vê şaş mane. Gotine ev çi hal*

²⁶⁸ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 96.

²⁶⁹ Sûreyê Tahayê, Ayeta 6.

²⁷⁰ Camî, *Nefahatu’l-Uns*, r. 96.

e, mîna ku Meydanê weke zarokan tevgeriyaye. Şîblî dibêje dema min wilo got, li ser laşê wî çî tayê mûyê hebûn hemûyan bi hev re got amîn."²⁷¹

2.20.12. Kurdiye

Weke ku ji navê wê diyar e kurd e. Ji bilî vê di vê xebatê de yekem ewliyaya jin a kurd e. Lewra heya niha em di çavkaniyên kurdî de pêrgî ewliyayeke wilo kurd nehatine. Ji bilî Ebdurehmanê Camî, Ibnê Cowzî jî di berhema xwe ya bi navê *Sefetu's-Sefwet* de qala wê kiriye û li ser wê pir kêr dane. Her wiha Cewad Nûrbexş ev her du çavkanî da ser hev, di pirtûka xwe ya bi navê *Zenanê Sofî* (Jinên Sofî) ya bi zimanê farisî qala Kurdiyeyê kiriye. Keça Emrê Besrî bûye û xizmeta Şe'wanîyeyê kiriye. Ibnê Cewzî wê weke Kurdewîye bi nav kiriye. Camî jî dibêje ku ji Besre yan jî Ehwezê bûye. Menqebeyên li ser Kurdiye:

Kurdiye bi xwe wilo neqil dike: *"Ez xizmetkara Şe'waneyê bûm. Şevê ez di xewê de mabûm. Bi lingên xwe ez niqûçandim, gote min rabe! Ev der ne cihê razanê ye. Ev der qebr e."*

*"Yekî jê pirsî. Tu di sohbetên Şe'waneyê de gihîştî kîjan bereketê? Dibêje ji dema ku ez beşdarî sohbetê wê bûme, min tu carî ji dinyayê hez nekiriye û pîrsgirêkên min ên derbareyê wê de çênebûne. Tu kesek ji ehlê dinyayê li ber çavê min mezin nebûye. Min tu carî kesekî bi xerabî tewanbar nekiriye."*²⁷²

²⁷¹ Camî, *Nefahatu'l-Uns*, r. 280.

²⁷² *h.b.*, r. 862.

ENCAM

Weliyên kurd di warê tesewwufê de xwedî roleke bûne. Herêma Kurdistanê ji ber stratejîkbûna xwe navendeke pir girîng a tesewwufê bûye. Ji hêla erdnîgariyê ve ji ber Kurdistan ketibûye navbera ereb û îraniyan û ereb û îranî jî di warê tesewwufê de zêde çalak bûne, lewma tesewwuf di Kurdistanê de pir bihêz bûye û gelek mutesewwuf û ewliyayên navdar ji nava kurdan derketine û bandoreke zêde mezin li ser tesewwufê kirine. Hêza tesewwufê ewqasî zêde bûye ku ewliya û mutesewwifên jin jî ji nava kurdan serî rakirine. Her wiha dîsa girîngiya kurdan û Kurdistanê û hêza wan a tesewwufî bûye sedem ku gelek mutesewwuf û ewliyayên mezin ji herêmên dûr û nêzîk rabin, terka welatê xwe bikin û berê xwe bidin nava Kurdistanê. Gelek weliyên kurd ên mîna Qazîu'l-Qudatê Hemedanî, Cuneydê Bexdadî, Suhrewerdî, Şêx Adî û hwd. asta kurdan û Kurdistanê tê perandine û li herêmên din û welatên dûr û nêzîk deng vedane û bandorên mezin çêkirine.

Xaleke balkêş ev e ku tevî gelek mutesewwufên mezin ji nava kurdan rabûne û bandorên mezin danîne, lê tu berhemeke kurdî ya klasîk ku rasterast li ser tesewwufê hatibe nivîsandin, nayê dîtin. Ji ber ku erebî (zimanê îslamê) û farisî serdest bûne û berhemên destpêkê li ser wan hatine nivîsandin, lewma mitesewwufên kurd jî di vî warî de li ser şopa wan çûbin û berhemên xwe bi farisî û erebî nivîsandine. Her wiha çawa ku tê zanîn û Mele Mehmûdê Bazîdî dibêje û Xanî jî li ser vê yekê rexne û gazine xwe dike, kurdînivîsandin di nava kurdan de nerît nebûye.

Di kevneşopiya îrfana Îslamê de ewliya û menqebeyên wan ji zû ve ye cihê xwe di nava nerîta tesewwufî de wergirtine. Bi gotineke din, serboriya tesewwufê bi çêbûna têgehên ewliya û menqebeyên wan re nerîteke dûrdirêj û têkel çêkiriye. Me di vê xebatê de hewl da em para weliyên kurd ku di *Nefahatu'l-Unsê* de hatine tomarkirin, derbixin holê û li ser wan bixebitin da ku em armanca xebata xwe tespît bikin. Di tespîtkirina vê de heya ji destê me hat, me sînorên xebatên xwe li parzûnka li gorî rê û rêbazên zanistê xist da ku em bigihîjin agahiyên rast ên di çarçoveya mijara xwe de. Me sînorê vê xebata xwe bi pêncî weliyên kurd û menqineyên wan re sînordar kir. Ji bilî vê, derbareyê weliyên kurd ên ku li vê berhemê cih girtine, me

serî li berhemên din jî da. Ango me ji berhemên ber destan agahî derbareyê weliyên kurd de berhev kir û me li xebata xwe zêde kir û me da ber hevdu. Helbet teqez berhemên din jî hene ku derbareyê van weliyan de agahî hene.

Bi qasî ku me li jorê li ser weliyên kurd û menqebeyên wan vekoland, me ji berhema Ebdirahman Camî ya bi bavê *Nefahatu'l-Uns* ango ji vê xebatê encamên wilo derxistin meydanê:

- Di vê xebatê de weliyên kurd û menqebeyên wan li gorî rê û rêbazên tesewwufî, keramet, meqamê rûhanî û bandora weliyan a li ser tesewwufê hatiye rawestandin.
- Di nava vana de gelek mutesewwufên kurd jî hene ku me bi vê xebata xwe tespît kir ku ew jî tevî pêvajoya nerîta tesewwufê bûne.
- Ev arif û mutesewwufên kurd bi menqebe û saîqên xwe yên dînî bandor hem li serboriya tesewwufê kiriye hem jî ji bo ehlên mutesewwufî yên pişt xwe re bûne pêşeng.
- Bi xêra van kesayetên kurd û menqebeyên wan, ew kêşe û aloziyên ku li ser erdnîgariya Îslamê der dibûn, li deryaya tesewwufê niquteke ava zelal lê hatiye zêdekirin.
- Dema behsa weliyên din tê kirin kê-m-zêde jî behsa weliyên kurd tê kirin ango rola wan bo tesewwufê weke weliyên din bi heman awayî tê kirin. Weke mînak, Camî dema ku behsa weliyên kurd dike, nabêje filan ewliya bi eslê xwe kurd e. Wekî din, weke nimûne, dema behsa ewliyayê tirk Hacı Bayram Ankaravî dike, ku di wergera wê ya tirkî de lê hatiye zêdekirin, dibêje Ankaravî li Enqereyê ji dayik bûye û li wira jiyaye. Mirov dizane ku ew ewlî tirk e, her çiqas ne bi sedî sed be jî, ji ber ku li bajarê yan herêmekê ku zêdetir tirk lê dijîn hatiye dinyayê û jiyana xwe li wî bajarî buhurandiyê mirov dikare tespîteke wilo bike. Lewra mirov ji cihê ku ewliya lê ji dayik bûye fêhm dike ku kurd an ereb an her wekî din e. Ji bilî vê, tevgera wî ya tesewwufî jî pê derdixe ku ew kesayet kî ye. Ango ev pîvan ji bo diyarkirina kesayetên me girîng e ku piraniya weliyên kurd li dergahê hevdu mane û bi menqebeyan pesnê hevdu kirine. Lewra her çiqas di nava

nerîta tesewwufê de nijad an milletbûn têgeheke ne girîng be jî balkêş e ku weliyên kurd li heman bajar an herêmê mane û xwe li hev girtine. Di pîvana duyem de tu şik û guman tune ye dema ku behsa kesên weke Kurdiye yan Şêx Elî Kurdî dike tu şik û gumana mirov namîne ku ew ne kurd bin.

- Girîngiya *Nefahatu'l-Unsê* ev e ku ev berhema hanê tezkîreya weliyan e ku ji hemû berhemên li ser weliyan ji yê beriya xwe sûd wergirtiye û li gorî demên cuda gelek lê hatiye zêdekirin. Me jî bi vê xebata xwe aliyê weliyên kurd û menqebeyên wan li nerîta tesewwufê biriqand û me ev berhem ji bo tesewwufwariya kurdî girîngtir kir.

Me hewl da ku vê mijarê piçêkî be jî zelal bikin. Ji bilî vê, bi qasî ku me di berhemên din de jî vekolîn kiriye, heya niha bo van weliyên kurd xebateke wilo nehateye tomarkirin û amadekirin ango di vî warî de ji bo mijara me ya herî bi kêrhatî, kamil û ji ber vê ya herî sistematîk e. Çunkî di vê berhemê de bi dehan weliyên kurd li gorî kevneşopiya menqebe û tezkîreyan di nav berhemên tesewwufî de weke janrekê di serdemên cuda cuda yê Îslamê de dom kiriye. Vana nîşan didin ku kevneşopiya nivîsandina menqebeyan di dîroka tesewwufa Îslamê de para kurdî jî her û her berdewam bûye.

Ev bi me dide fêmkirin ku di vî warî de xebatên kurdî kê hatine kirin û mirov dikare di vî warî de valahiyeke mezin tije bike. Ji ber van têkeliyan pêdiviya xebateke wilo hate dîtin. Ji ber vî çendî ev xebata me ya kurt dikare di paşerojê de weke çavkanî yan bîbloyafiyekê ji bo vekoler û xebatkaran bê bikaranîn û bibe sedema vekolînên nû. Lewra, di vî warî de li ser weliyên kurd û menqebeyên wan xebatên wilo zanistî û birêkûpêk hema hema zêde nehatine kirin. Ev yek jî kêmasiyeke mezin di xwe de dihewîne.

ÇAVKANÎ Û JÊDERK

- Açıkyıldız**, Birgül, *Ezidiler, Bir Toplumun, Kültürün ve Dinin Tarihi*, çeviri: Zülal Kılıç, Alfa Yayınları, İstanbul, 2015.
- Adak**, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik, Weşanxaneyê Nûbiharê*, Stenbol, 2013.
- Affî**, Ebû'l-Ala, *Muhyiddîn İbnu'l-Arabî'de Tasavvuf Felsefesi*, Çeviri: Mehmet Dağ, Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, Ankara, 1975.
- Affî**, Ebu'l-Alâ, *Tasavvuf İslâm'da Manevî Devrim*, Çevirenler: H. İbrahim Kaçar, Murat Sülün, Risale Yayınları, İstanbul, 1996.
- Akbaş**, Mehmet, "Evliya Çelebinin Gözüyle Kürtler ve Kürdistan", *Artuklu Akademi*, 2/1, 2015 .
- Aliyeh**, Javanmardi, Nasrollah Poormohammadi Amlashi, "Naghsh Va Jaygahe Mashayekhe Tarighat Dar Tehevolate Ejtemaiye Tarikhe Moasere Kordestan. Pajooheshnameye Ejtemai Va Eghtesadi", *Pajooheshgahe Olume Ensani Va Motaleate Farhangi*, hej. 2. 2015.
- Alkış**, Abdurrahim, "Mesnevî'nin İnşâsında ve Mevleviliğin Müesseseseleşmesi Sürecinde Çelebi Hüsâmeddin'in Yeri", *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, c. 13, hej. 2. 2011.
- Ansari**, Khaje Abdollah Ben Mohammad, *Tabaghat ol-Sofiye*, Kabil, 2013.
- Ashraf**, Vajihadin, *Bahre Zokhar*, Tashih û Tedvîn: Azar Meydokhte Safavi, c.3, Dehli, 2010.
- Ateş**, Süleyman, "Cüneyd-i Bağdâdî", *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 8, İstanbul, 1993.
- Attar**, Feridüddin, *Tezkiretü'l-Evliya*, Hazırlayan: Süleyman Uludağ, İlim ve Kültür Yayınları, Bursa, 1984.
- Baz**, Welat, "Şîrîna Rojhilat Qesrî Şîrîn", *Rojnameya Basnûçe*, hej. 20, 2015.
- Bazın**, Barcel, "Kirmanşah", *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 26, İstanbul, 2002.
- Belenitski**, Alexnder, *Xorasan Ve Maverau'n-Nehr*, Wergêr: Pervîz Vercavend, Tehran, 2013.
- Camî**, Nûreddîn Ebdurehman, *Nefahatu'l-Uns* (Evliya Menkıbeleri), Tercüme Şerh ve İlaveler: Mahmud L'amiî Çelebi, Medine Yayınları, İstanbul, 2007.
- Çift**, Salih, "İlk Dönem Tasavvuf Klasikleri Tarafından İhmal Edilen Bir Zühd Hareketi: Kerrâmiyye", *Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, c. 17, hejmar: 2., 2008.

- Daneshvar**, Hakimeh, Mohammad Taghavi, Maryam Saehiniha, *Barrasiye Tetbighiye Shaxsiyate Zon-Noon Dar Se Tezkaree (Tabaghat ol-Sofiyeh, Tezkiret ol-Oliya Ve Nafahat ol-Ons)*, Adabiyate Erfani, 1395/2016.
- Derakhshan**, Mehdi, *Bozorgan Va Soxansorayane Hamadan. C. 1: Baad Az Eslam Ta Zohore Selseleye Ghajar*, Ettelaat, Tehran, 2014.
- Hamadani**, Eynolghozat, *Namehaye Eynolghozate Hamadani*, Be Ehtemame Alinaghi Monzavi Ve Afif Esiran, c. 1, Tehran, 1395/2016.
- Hashemiyan**, Leyla, Mohsen Qasimi, “Shive Novin Dar Barrasiye Ahvale Shah Shojae Kermani”, *Majalleye Tarikhe Adabiyat*, Doreye 11, hej., 1, 2010.
- Hemedânî**, Hâce Yûsuf-i, *Hayat Nedir? (Rutbetü'l-Hayât)*, Çeviri: Necdet Tosun, İnsan Yayınları, 2000.
- Imanpoor**, Mohammadtaghi, Fatemeh Farokhi, “Barkhorde Aarab Ba Zanane Irani”, kov. *Nameye Bastan*, hej. 1-2, 2013
- Jafarzadeh**, Mehdî, *Dîroka Kurdan li Xoresanê*, Semînera Lîsansa Bilind a Bitez a çapnebûyî, Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, 2016.
- Jami**, Mawlana Abdu'r-Rahman, *Salaman we Absal*, Sharafaddin & Sons, Bombay, 1936.
- Kara**, Mustafa, “Darani”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 8, İstanbul, 1993.
- Kara**, Mustafa, “Ebû Süleyman ed-Darani”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 8, İstanbul, 1993.
- Karamustafa**, Ahmet T., *Sufism The Formative Period*, Typeset in Goudy by Koinonia, Manchester, and printed and bound in Great Britain by The Cromwell Press, Trowbridge, Wilts, Manchester, 2007.
- Khatami**, Ahmad, *Vijegihaye Zabaniye Jami Dar Nafahat-ol Ons*, Majalleye Daneshkadeye Adabiyat Va Olume Ensaniye Daneshgahe Tehran. Doreye 58, hej. 4. 2014.
- Kreyenbroek**, Philip G., *Ezidilik Arka Planı, Dinî Âdetleri ve Metinsel Geleneği*, Çevirenler: Amed Gökçen-Damla Tanla, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2014.
- Kurmanc**, Yaqûb, “Danasîna Bajarê Êrmiye û Kela Dimdimê”, *RiaTaza*, Malpera Kurdî a Çandî, Hunerî û Wêjeyî, 2017.
- Lescot**, Roger, “Quelques Publications Récentes sur les Yézidis”, *Bulletin d'Etudes Orientales*, France, 1936.
- Lings**, Martin, *Tasavvuf Nedir?*, Akabe Yayınları, İstanbul, 1986.

- Mihani**, Mohmmad Ben Monavar Ben Abi Said Ben Taher Ben Abi Said, *Esrar-ol Tohid Fi Maghamate al-Sheikh Abi Said*, Moghadame ve teshih: Mohammad Reza Shafi Kadkani, c.1. Agah, Tehran, 2014.
- Nikitin**, Vasili, *Kord o Kordestan*. Wergêr: Mohammad Ghazi. Niloofar, Tehran, 1988.
- Noorbakhsh**, Javad, *Pirane Tarighat*, Khanghahe Nematollahi, Tehran, 1979.
- Ocak**, Ahmet Yaşar, *Kültür Tarihi Olarak Menâkıbnâmeler (Metodolojik Bir Yaklaşım)*, Atatürk Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Tarih Kurumu Yayınları, İstanbul, 2016.
- Okumuş**, Ömer, “Câmî, Abdurrahman”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 7, İstanbul, 1993.
- Öngören**, Reşat, “Tasawuf”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 40, İstanbul, 2011.
- Özgülüdenli**, Osman Gazi, “Urmiye”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 42, İstanbul, 2012.
- Poorjavadi**, Nasrollah, *Barakeye Hamadani Ostade Omiye Eynolghozat*, Maaref, Tehran, 365/986.
- Rohani**, Kamal, *Tarikhe Jamee Tasavofe Kordestan*. Samrand, Tehran, 2006.
- Rojbayani**, Jamil, *Farmanravayane Mokriyan*, Wergêr: Ahmad Sharifi, Beghdad, 1992.
- Safa**, Zabihollah, *Tarikhe Adabiyat Dar Iran*, c. 2, Neda, Tehran, 1990.
- Sagniç**, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2014.
- es-Sakkâr**, Sâmi, “Musul”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 31, İstanbul, 2006.
- Sarıçam**, İbrahim, “Nihâvend”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 33, İstanbul, 2007.
- Sevgi**, H. Ahmet, “Hüsâmeddin Çelebi”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 18, İstanbul, 1998.
- Shamshirgarha**, Mahboobe, Bozorg Bigdeli Said, Mohsen Abolghasemi, “Barrasiye Taasire Zabane Arabi dar Tabaghate Sofiyeye Ansari”, *Faslnameyeh Jostarhaye Zabani*, Doreye 5, hej. 1. 2014.
- Shamshirgarha**, Mahboobe, Bozorg Bigdeli Said, Mohsen Abolghasemi, “Karbonde Zemayere Shaxsi Dar Tabaghate Sofiyeye Khaje Abdollahe Ansari Ve Gooyeshe Kohane Harat”, *Domahnameyeh Jostarhaye Zabani*, Doreye 5, hej. 3. 2014.

- Sub,** Man John A., B.D. B.A., *Sufizm It's Saints And Shrines (An Introduction to the Study of Suftsm with Special Reference to India)*, Universal Library, London, 2011.
- Sunar,** Cavit, *Ana Hatlariyle İslâm Tasavvufu Tarihi*, Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, Ankara, 1978.
- Şahin,** Haşim, “Menâkıbnâme” *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 29, İstanbul, 2004.
- Şeşen,** Ramazan, “Harran”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 16, İstanbul, 1997.
- Tavahodi,** Kalimollah, *Harakate Tarikhiye Kord Be Khorasan*, c.1, Vase, Mashhad, 2006.
- Tavakoli,** Mohammad Raof, *Tarikhe Tasavof Dar Kordestan*, Tavakoli, Tehran, 2016.
- Topaloğlu,** Bekir, “Velî”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 43, İstanbul, 2013.
- Tosun,** Necdet, “Yûsuf el-Hemedânî”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 44, İstanbul, 2013.
- Tamadon,** Mohammad, *Bozorgan Va Sokhansorayane Azarbayjane Gharbi*, 2012.
- Uludağ,** Süleyman, “Abdülkâdir-i Geyânî”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 1, İstanbul,
- Uludağ,** Süleyman, “Fütüvet”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 13, İstanbul, 1993.
- Uludağ,** Süleyman, “Harranî, Hayât b. Kays”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 16, İstanbul, 1997.
- Uludağ,** Süleyman, Nurettin Bayburtlugil, “Aynülkudât el-Hemedânî”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 4, İstanbul, 1991.
- Üngören,** Reşat, “Sühreverdi, Ebü'n-Necîb”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 38, İstanbul, 2010.
- Vali,** Shahab, “Negahi Be Motoone Mazhabiye Alaviyan – Baktashiyane Anatoli,” *Neshriyeye Javidan Khrad*, Doreye Jadid, hej. 4. 2009.
- Vassâf,** Osmânzâde Hüseyin, *Sefîne-i Evliyâ*, Hazırlayanlar: Mehmet Akkuş-Ali Yılmaz, Kitabevi Yayınları, İstanbul, 2015.
- Yazıcı,** Tahsin, “Dînever”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 9. İstanbul, 1996.
- Yazıcı,** Tahsin, “Hemedan”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 17, İstanbul, 1998.
- Yazıcı,** Tahsin, “Hemedani, Emîr-i Kebîr”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 17, İstanbul, 1998.

Yetik, Erhan, “Dîneverî, Ebü’l-Abbas”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 9, İstanbul, 1994.

Yetik, Erhan, “Ebü’l-Hasan es-Sâîğ”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 10. İstanbul, 1994.

Yetik, Erhan, “İbrâhim b. Şeyban”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 21, İstanbul, 2000.

Yılmaz, Hasan Kamil, “Sühreverdî, Şehâbeddin”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c. 38, İstanbul, 2010.

Yılmaz, Hasan Kâmil, *Anahatlarıyla Tasvvuf ve Tarikatlar*, Ensar Neşriyat, İstanbul, 2004.

Zarinkoob, Abdolhosein, *Jostejo Dar Tasavof*, Amirkabir, Tehran, 2004.

Zarinkoob, Abdolhosein, *Tasavofe Irani Az Manzare Tarikhiye An*, Wergêr: Majdaddin Keyvani, 2014.

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: WELİYÊN KURD DI NEFAHATU'L-UNSÊ DE

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 137 sayfalık kısmına ilişkin 11/11/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından Turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 4

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar: Benzerlik oranının %4 internet kaynakları ve %3 de öğrenci kaynaklarından oluşmaktadır.

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Mehmet Emin Cırık

Öğrenci No: 16711001

Tarih ve İmza

Programı: Kürt dili ve Kültürü- tezli yüksek lisans

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı

Onayı

Dr.

Shakir Udi

A.B.D. Başkanı

Prof. Dr. Abdurrahman ADAR